


Dierbêkir (Turquie) -- Panorama



Sal I
Hejmar 4
Kanûna pêşîn 1995

XWEDÎ Û BERPIRSIYARÊ GIŞTÎ Mehemed Malmîsanij

REDAKSIYON

Osman Aytar
Nedim Dağdeviren
Nacî Kutlay
Mahmûd Lewendî
Hesenê Metê
Zinar Soran

ŞERTÊN ABONETIYÊ

Salek: 200 SEK
Nîvsal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din
mesrefa postê lê zêde dibe.*

ÎLAN

Rûpelek 1000 SEK
Nîv rûpel 500 SEK
Çarîk rûpel 200 SEK

PERGALA BERGÊ Û RÛPELAN

Nedim Dağdeviren

RÎSMÊ BERGÊ PÊŞÎN

Diyarbekir, 1920

POSTGIRO

46 32 31-1

ISSN

1400-528X

Berpîrsiyariya her nivîsê,
ya nivîskarê/nivîskara wê ye.



A D R E S S • A D R E S • N A V N Î Ş A N

c/o Toyfun, Hyppingeplan 21, 2 tr., 163 62 Spånga • SWEDEN

TELEFON +46 (08) 760 69 38 **TELEFAX** +46 (08) 711 08 36

TÊDE

Sal 1 • Hejmar 4 • Kanûna pêşîn 1995

DÎ NETEWEPERWERIYA KURDÎ DE 3

Martin van Bruinessen

BÛSERHATÎYÊN ÇEND MÎROVÊN SEYÎDXANÊ KERR 17

Celadet Alî Bedirxan

TELGRAFEKE JÎNÊN KURD 24. 7. 1930 38

M. Malmîsanîj

NOTÊN ROJANE (1922-1925) 39

Celadet Alî Bedirxan

BAJARÊ TE DÎL E 41

Kekê XÊLÎT

LWÎ Û KERG 45

Tadayox: Şêx Evdirehîm Efendî

KURD DÎ KÎTÊBA COGRAFYA YA ÎSTEXRÎ DE 47

Wergerandin: Emîn Narozi

AZADIYA GOTÎNÊ Û WEŞANÊN GIŞTÎ 59

Şahînê Bekirê Soreklî

DAYÊ, BAVO ÇIMA NAYÊ? 62

Dilbijan

STÊRKEK XURICÎ JI ASIMANAN 64

Bedirxan Epözdemir

HÊNDÊ LAYENÎ KULTURÎ KOMARÎ KURDÎSTAN 1946 - III 71

Kerîmî Husamî

DÎKRAN, NAZAR, XAÇO Û YÊ BÎNÎ 73

Migirdîç MARGOSYAN

BÊBEXTIYA SEYÎD Û FENEKÊN XEMGÎN 79

Botan Amedî

GOZÊRE 92

Serdar Roşan

KONGRES 97

Zinar MÎSTEFA

KRONIKA 1995 100

Yê ku hazir kiriye: Nedim Dağdeviren

WERGERA MEM Û ZÎNÊ BÎ ZIMANÊ EREBÎ 107

Emîn Narozi

JÎ KOMELÊ 108

ÇEND KARTPOSTALÊN KEVN 109

M. Pîran

MEM Û ZÎNA EHMEDE XANÎ Û ROLA WÎ YA DÎ NETEWEPERWERIYA KURDÎ DE

Martin van Bruinessen

Ev gotar di 27. 5. 1995'an de, di Konferansa Ehmedê Xanî de, li Stockholmê hatibû pêşkêşkirin. Konferansa Ehmedê Xanî, ji alî Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê û ABF'ê ve hatibû amadekirin.



Komela Nivîskarên Kurd li Swêdê semînerê amade dîke û bangê min kir ku ez jî beşdar bibim, bipeyivim. Jibo 300 saliya berhema Ehmedê Xanî, Mem û Zînê ev civîna bîranînê hat amadekirin. Ez gelekî kêfxweş bûm, lê pê re jî tirsiyam. Rast e, min derheqê dîrok û sosyolojiya Kurdan de pirtûk û meqale nivîsîn. Min çend caran behsa Ehmedê xanî kir, lê ev nîşan nadin ku ez derheqê Ehmedê xanî de pispor im. Semîner li Swêdê pêşkêş dibe. Gelek Kurdên entellektuel ku di xebatên derheqê Ehmedê Xanî de pêş de çûne, alîkarî kirine li vir dijîn. Pêşî ez ê navê Mehmet Emîn Bozarşan,¹ Mihemed Enwer² û Ferhad Shakely³ û di van demên dawiyê de jî Mehmet Uzun⁴ û Mûrad Ciwan⁵ bidim. Divê ez îtîraf bikim ku ez ditirsim, li vir li pêş van kesên zana biaxifim. Min Ehmedê Xanî bi saya melûmatên ku ji van kesan girt, nas kir. Dibe ku nivê guhdarên vê civînê, Mem û Zînê û Ehmedê Xanî ji min bêtir û pirtir dizanin.

Loma ez dê bi tehrêkî din behsa hin rastiyên ku baş tînin bikim. Ev çend dîtînen ku ez ê pêşkêşî we bikim, dibe ku ne li gor dîlê we bin. Ez nabêjim ku di wî warî de pirr zana me. Lê belê ez dixwazim bi dîtînen din, bi cûrêkî din li vê meselê binihêrim, dîtînen xwe yên bê îddîa ji we re bibêjim.

Gelo Ehmedê Xanî neteweperwerekî Kurd e û çêbûna dewleteke Kurd dixwest?

Jibo ku Ehmedê Xanî pêşdariya neteweperweriya (nasyonalîzma) Kurdî bike gelek sebebên di cî de hene. Ez ê paşê behs bikim ku wî bi çi teherî ev kar kiriye. Mem û Zîn di tevgera neteweyî ya Kurdî de faktoreke taybetî ye. Lêbelê gelo ev faktora heq dide me ku em jibo wî bibêjin ew neteweperwerê Kurd e? Ez bawer

nakim ku ew neteweperwer e. Ew dîtînên ku em di Mem û Zînê de dixwînin, nîşanî me nadin ku ew dewleteke Kurd difikirî.

Ya ku tê zanîné, Xanî îdentîteya (huwiyeta) Kurdî hîs dikir û di vê îdentîteyê de şerefeke giranbuha didît. Wî dîsa zanibû ku ev karê wî yê kulturî jibo Kurdan xizmeteke mezin e. Di destpêka wê sedsalê de, şaîr û ronakbîrên Kurd fikrên xwe bi zimanê Farişî an Erebiî dinivîsîn.

Şerefname, bi texmînî sed sal berî Mem û Zînê, bi Farişî û bi tehrekî nepêş de hat nivîsandin. Îdrîsê Bitlîsî jî dîroka Osmanî bi Farişî nivîsî. Dibe ku sebebê bi Farişî nivîsandinê ew be ku nivîskaran zimanê Farişî jibo edebiyatê yê herî baş e, dizanîbûn. Xwendevanên Împeratoriya Osmanî wisa difikirîn ku xwendevan û guhdarên di nav Îranî û Hîndûyan de, dê herî zêde û bi rûmet bin. Lewra dixwestin ku bi Farişî binivîsin. Ehmedê Xanî ne bi Farişî lê bi Kurdî nivîsî û zanibû ku xwendevan û guhdarên wî dê ne zêde bin. Xwendevanên wî tenê divê Kurd bin. Ew tu carî wek Nîzamî Gencewî bi nav û deng nebû. Wî bi zanebûn xwest bi Kurdî binivîse. Xwest ku kultura Kurdan di nav milletên cîran de bilind û bi qedr bike. Bi gotinên wî:

**Da xelq-i nebêjtin ku Ekrad
Bê merîfet in, bê esl û binyad
Enwaê mîlel xwedan kitêb in
Kurmanç-i tenê di bê hesêb in.**

Xanî ne ew kesê pêşîn e ku şîrên klasîk bi Kurdî nivîsiye. Ew bixwe navê şaîrên ku berî wî bi Kurdî nivîsandine, yanî navê Feqiyê Teyran, 'Elî Herîrî û Melayê Cizîrî dibêje. Di heqîqetê de gelek şaîrên Kurd hebûn lê nuha ew hatine jîbîrkirin. Ji ber ku berhemên wan nehatine parastin. Gerrokê navdar ê Tirk, Ewliya Çelebî di 1660'î de hatiye Amediyê, di koşka Mîr de rastî gelek şaîrên giranbuha hatiye. Wan şaîran helbestên xwe bi Kurdî nivîsibûn. Ewliya Çelebî ji helbestên Remezan Efendî qesîdeke xweşik pêşkêş dîke. Ev jî nîşan dide ku ew dem, demeke jîndar û bi hereket bûye.⁶

Gelo sebeb çî ye ku di sedsala 17'an de edebiyata Kurdî bi pêş ketibû? Bersiva vê pirsê wisa ne hêsan e. Bi dîtina min, gazinca herî girîng a Ehmedê Xanî, ji bandora Osmanîyan bû. Farişî di sedsala 16'an de li Îstebolê di nav Tirkên Osmanî de bi serketin û pêş de çûn. Di xutbeyên mizgeftan de û di seraya Împeratoriye de zimanê wan dihat fêrkirin. Ev nimûneya Xanî şaîrên Kurd teşwîq kirin ku ew helbestên xwe bi Kurdî binivîsin û pêş de bibin. Wek Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî. Tiştê girîngtir, di hukumdariya Osmanî de wan sedsalên pêşîn, bi nîsbî jîyan bêhereket û bêdeng bû. Ew malbatên Kurdên ku hukumdar bûn, di bin îdara Osmanîyan de xwe otonom, serfiraz û di temînatê de didîtin. Di warê ilm û hunerê de bê temînat, pêşdeçûyî û ne bi serê xwe bûn. Mîr û karbîdestên Osmanî (wek *beylerbeyî* û *sancakbeyî*) alîkariya ciwanên Kurd kirin ku ew di medreseyan de karên ilmê dînin û edebiyatê bikin. Dîwan û medrese cîyên ku huner û bi taybetî jî

edebiyat, dihat teqdirkirinê bûn. Şairên Kurd, wê demê bi serê xwe an jî bi hev re dixebitîn.

Ev îddîaya netewî ya Ehmedê Xanî pirsekê tîne pêş me. Bi *dibaçeya* xwe, Mem û Zîn xwedî çarçeweyeke modern e. Xanî sêsed sal berê, gotinên neteweperwerên sedsala bîstana aniyê ser zimên. Di vê pêşgotinê de Xanî dewleteke Kurdî ya netewî dixwaze. Ez dikevim şikê ku ev gotin ne yê Ehmedê Xanî bin. Dibe ku kesên din, gava ku kopyayên destnivîsên di pey Ehmedê Xanî re nivîsîbin, ev tişt lê zêde kiribin. Ji ber ku ez van gotinan pîrr modern dibînim. Lê di xebata ilmî ya M. A. Rudenko de, di nav deh destnivîsên cûrbicûr de meriv van gotinan dixwîne. Ya herî kevn di sala 1731-1732'an de hatiye nivîsîn; ku netewetîya modern hê li Rojhilata Navîn nehatibû holê.⁷ Bê şik Ehmedê Xanî bi xwe nivîsiye:

Ger dê hebûwa me padîşahêk [.....]

xalib nedibû li ser me ev Rom

Eger padîşahêkî me (text, rac û îşareteke hukumdariyê) hebûya, Osmanîyan nikarîbûn li ser me hukum û me îdare bikin. Û dîsa nivîsiye:

Ger dê hebûwa me îtîfaqek

Vêk ra bikira me înqiyadek

Rom û Ereba û Ecem temamî

Hemyan ji me re dikir xulamî

Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet

Tehsîl-i dikir me ilm û hîkmet

"Eger di nav me de yekîti hebûya û me bi hev re îtaet bikira, Osmanî, Ereba û Ecem dê ji me re xulamî bikirana.⁸ Di warê dîn, siyaset, ilm û îrfanê de emê pêşde biçûna."

Balkêşe ku meriv di viya de qîrîna Kurdekî dixwîne ku dibêje "Dewleta Tirkan, Ereban, Farisan heye, çima dewleta me tucar nebû?" Di vê şirovekirinê de du pirs hene. Em ji çavkaniyên wê demê û yên din tê derdixin, Kurd wek ku îro dikin, li ser etnîkgrûbtîya xwe an netewbûna xwe nesekinîne. Di gotinên Ehmedê Xanî de Rom, Ereba û Ecem ne grûbên etnîk in, dewlet in. Eslê "Rom"ê ji Împeratoriya Romayê, di pey wê re ji Bîzantiuma Rojhilatê, paşê ev nav ji bo Selçûqî, Dewleta Osmanî û nuha jî carna ji bo Cumhuriyeta Tirkîyê tê bikaranîn. Lêbelê tu carî ne ji bo yekî Tirk.⁹ Yên ku bi Ereba nedipeyivîn, ji bo wan hemûyan "Ecem" dihat gotin. Di nav Tirkên Osmanî de ev nav, yanî "Ecem", -Îraniyên ku bi Tirkî dipeyivîn jî di nav de- ji bo hemû Îraniyan dihat gotin. Ereba û Kurd an jî Kurmanc (Xanî van herdu navan jî bi kar tîne) ne dewlet in, grûbên gelêrî ne. Lêbelê ez dikevim şikê ku, ya rastî bi vê gotinê û wan merivan ve, qesta wî "Netewê Kurd"ê îro ye? Mîna di ciyên din de jî nivîsîbû, di wê demê de, bi terîma "Kurd", eşîret û hin arîstokratên bijarte yên bajarî dihatin binavkirin. Lê gundiyeşîr (reyet, kurmanc) di nav de nebûn.¹⁰

Problema duyemîn wesfên wan dewletan e. Hîn fikra "dewletên millî" ne li



Martin van Bruinessen (Foto: Arif Zêrevan)

Awrûpayê û ne jî li Asyayê hatibû holê. Dewletên Tirk, Ereba an Faris tunebûn û wan jibo damezrandina dewletên wisa tucar teşebbus nekiribûn. Ew dewletên ku hebûn, bingeha wan li ser îdentîteya dînî an jî li ser bingeha hin malbatên mezin û navdar hatibû avakirin. Wek nimûne, Xanedaniya Osmanî û Safewîyan herduyan jî bi Tirkî qise dikirin, lêbelê herdu jî wek îdentîteya Tirk nefikirîn ku alîkariya hev bikin. Di nav van dewletan de zêde gelên etnîkî hebûn. Ehmedê Xanî padîşahiyeke Kurdî dixwest, ev nedibû dewleteke millî, dê bibûya zêdeetnîkî. Bi vî teherî, *"Rom û Ereba û Ecem temamî, hemûyan jî me ra dikir xulamî..."*

Eger em netewetiyê wek Ernest Gellner¹¹ bifikirin, "prensîbê siyasî ew e ku, siyaseta û neteweyî divê ku bi hev re hemaheng û yek bin", wê çaxê Xanî ne nasyonalist e. Ew jî perçebûna Kurdan xemgîn bû. Wî dîsa dît ku di nav xwe de perçebûn, di nav dewletên cîran de jibo wan dibe problem. Heke ew yek bûna, dê ew bi xwe bibûna fatih.

Ehmedê Xanî ji bo kê nivîsî û kê xwend?

Mem û Zîna Xanî, li ser bingeha efsaneyê ku xelk gelekî jê hezdike û baş tê zanîn, Memê Alan (hem jî wek Mem û Zîn tê zanîn) çêbûye. Lêbelê hem bi naverok û hem jî bi forma xwe di navbera wan de gelek ferq hene.¹² Xanî esasê çîrokê gelek guhertiye. Zêde zêde dîtinên sembolîk, fikrên mîstîk û metafîzîk û bi lêzedekirina

dîtînên xwe yên siyasî ew dewlemend kiriye. Bi formeke menzûmên mesnewî yên Farisan nivîsiye. Ew pêşniyar û guhartinên ku wî dixwest berê pêşîn bigihîne xwendevanan, ne wek gotinên çîrokbêjên tradîsyonel bûn. Memê Alan ji neslan gihîşte neslan, bi sembolan xelk zêdetir sofistî kir, bi dîtînên metafîzîkî her hat rêgihîştinê û xurt bû. Ehmedê Xanî ev kar bi tehrê edebiyata Farisî nivîsî û serkevtina wî her bilind bû. Xwendevanên wî bellî bûn; pirraniya wan zana û pisporên ku di medreseyan de xwendina xwe kûr kiribûn û di koşkên mîran de digihîya bûn.

Destnivîsên Mem û Zînê ne zêde ne. Li gor Rudenko neh destnivîsên wê hatine dîtîn (Sê nusxe ji wan di kolleksiyona Alexandre Jaba de ne). Li Rojava hindik destnivîs hene. Anuha mirov nikare texmîn bike ku di nav Kurdan de çend nusxe destnivîsên çapnebûyî yên Mem û Zînê hene. Ez texmîn nakim ku ji 500î zêdetir bin. Em bifikirin ku her nusxeyek ji alî 20 kesî ve hatibe xwendin, jimara hemî xwendevanên Mem û Zînê çend hezar kesî nabihure. Belkî ev jimar jî ya herî zêde ye.¹³ Piştî çapemeniya metbeyê Xanî gihîşte pirr kesan û guhdaran.

Xwendevanên Xanî qedrekî bilind dan karê wî yê edebî. Lêbelê em bawer dikin ku neslên nû mesaja wî ya siyasî xwendin û dîtîn. Mela Mehmûdê Bayezîdî di 1850î de li ser ricakirina konsolosê Rûsyayê yê Erzeromê derheqê edebiyata Kurdî de bi kurtî hin agahdarî nivîsî. Alexandre Jaba ji bo Mem û Zînê dibêje ku "ew çîrokeke eşqî û sade ye". Ew hunerê edebiyata Xanî teqdîr dike û dibêje "ew gelek navdar e û şairên Kurd wî gelekî dipesinîn". Lêbelê ji derveyî serketina wî ya edebiyatê tişteki nabêje.¹⁴

Dîtînên Xanî li Başûr belav bûn: Hacî Qadirî Koyî

Şairê Kurd Hacî Qadirî Koyî (1817-1897), ez wisa texmîn dikim ku kesê herî pêşîn e ku ew mesajên neteweyî ji Mem û Zînê girtine. Hacî Qadirî Koyî li Kurdistanê Bakur û Başûr, di warê destpêk û pêşdeçûna neteweyiya Kurdî de ciyekî wî yê taybetî heye. Ew yekî feqî bû. Li gelek ciyên Kurdistanê, di medreseyan de xwend.¹⁵ Dema ku ew dijiya li Kurdistanê guhartinên mezin çêbûn. Dema ku Osmanîyan emîrên Kurdan ên dawiyê jî ji holê radikirin, ew hîn xort bû. Bi tecrubeyên xwe yên şexsî, divê ew hukumdariya Soran a mezin û dawî bizanibe. Mîrê Rewandîzê yê navdar Mîr Mehemed e (bi navê Mîrê Kor jî tê naskirinê, 1814-1835). Bedirxan Begê Cizîrê ku derheqê edalet û qudreta wî de em xwedî melûmat in, di salên 1840'î de li hemberî Osmanîyan serxwebûna xwe îlan kir. Li Kurdistanê gelek cî xist bin kontrola xwe. Vê bûyerê li ser Hacî Qadirî Koyî tesîreke mezin kir. Ev mexlûbiyet bû dawîya emaretên mezin ên Kurdan. Di pey vê demê re bêhemmiyetî û tevliheviyê dest pê kir û di nav eşîran de dijîtiyê dom kir. Di fikrên Hacî Qadir de netewetîya romantîk dest pê kir. Li ba wî, feodaliya rabirdû bû îdealeke nostalgîk¹⁶.

Ber bi dawîya jiyana xwe çû Îstebolê. Li wir bi malbatên Kurdan ên mezin re têkilî danî. Ew mela û alim bû. Mala Bedirxan, ji bo zaroyên xwe ew kirin muellîmê

xusûsî. Hacî Qadir bi xwe nefstenik bû, xwe şerefdar qebûl kir ku ders bide zaroyên vê malbata bi nav û deng. Di şîrên wî de, ewqas zêdebûna netewetiyê dibe ku ji tesîra malbata Bedirxan dihat. Li aliyê din netewetiya ciwanên malbata Bedirxan jî bi tesîra netewetiya Hacî Qadir xurt bû. Bi dîtina Qanadê Kurdo, Bedirxaniyan cara pêşîn bi saya Hacî Qadirî Koyî, Ehmedê Xanî nas kirin.¹⁷ Ji şîrên wî pîr vekirî tê xuyakirin ku ew di bin tesîra Ehmedê Xanî de ye. Ciyê Ehmedê Xanî di edebiyata Kurmancî de çilo ye, Hacî Qadirî Koyî jî di edebiyata Soranî de cihekî wisa digire. Peyhatiyek ku bi şîrên xwe fikrên millî û îlhamê bide neslên neteweyî yên nû. Wek Xanî, bi Kurdî nivîsandin jibo Koyî terciheke siyasî bû. Bê şert qedrek mezin dida zimanê Kurdî. Ew dixwaze bibêje ku civata Kurd xweyî dîroka xwe nebûye, lewra di terbîqatê de ev nayê qebûlîkirin:

**Kitêb û defter û tarîx û kaxez
Be Kurdî ger binûsraye zubanî
Mela w şêx û mîr û padşaman
Heta mehşer dema naw û nîşanî.¹⁸**

Yanî eger kitêb, defter, dîrok bi zimanê Kurdî nivîsandî bûna, mela, şêx, mîr û padîşahên me dê heta mehşerê bi nav û deng û nîşan bûna.

Koyî dema emîran di dîrokê de wek salên zêrîn dibîne û îdealîze dike:

**Hakim û mîrekanî Kurdistan
her le Botanewe heta Baban
yek be yek hafizî şerîet bûn
seyid û şêxî qewm û millet bûn.
Seyid û şêxekan le tirsî ewan
munzewî bûn û zakirî Rehman.
Ew ke fewtan riyay ewan derkewt
seyrî çon bûne pû û agir û newt.
Yekî lem lawe rû dekate Ecem,
dûş lew lawe debine dujminî hem.
(.....)**

**Kwa walîy Senenduc, begzadey Rewandiz?
Kwa hakimî Baban, mîrî Cezîr û Botan?
Kwa ew demî ke Kurdan azad û serbexo bûn,
Sultanî mulk û millet, xawendî ceşş û îrfanî?¹⁹**

Eşkere tê xuyanê ku Hacî Qadirî Koyî ev şîr piştî ku Mem û Zîn xwendiyê, di bin tesîra Ehmedê Xanî de nivîsiye: Eynî gazind ji dijîtiya bêdawiya eşîrên Kurdan, eynî hesret jibo hukumdarekî. Ferqek heye: Ehmedê Xanî bawer nake ku padîşahê îdeal ê wî yê ku hemî eşîrên Kurd bigihîne hev û wan îdare bike di tarîxê de hebûbe. Lê Hacî Qadir, Mîrê Kor û Bedirxan Begî padîşahên wisa dibîne (her çiqasî navê wan nabêje jî). Meriv dikare Mem û Zînê wek rexneyên li ser civata feodalî bixwîne. -Mîrê Cizîrê li vir roleke zalimane dilîze.- Koyî bi ser de pê emîrên Kurdan medh

dike. Di axaftina li ser neteweyetiya Ehmedê Xanî de ez dikevim şikê. Lê ev rastiyeke bêşik e ku Hacî Qadirî Koyî nasyonalîstekî romantîk û îdealîst e. Koyî, Mem û Zînê wek "kitêba milletê me" qebûl dike. Di pêşdeçûna tevgera Kurdî de Mem û Zîn wek semboleke netewî roleke girîng lîztiye û tê de em momentên girîng dibînin.

Mem û Zîn di çapê de

Derketina rojnama pêşîn a Kurdî, "Kurdistan"ê di demeke pîrr girîng de ye. "Kurdistan" cara pêşîn li Qahîreyê, di 1898'an de ji alî Mîqdat Mîdhet Bedirxan ve hat derxistin. Mîqdat Mîdhet yek ji şagirdên Koyî ye. Di hejmara duwemîn û yê pey wê de, perçeyên Mem û Zînê çap bûn. Bi vî tehrî, bi vê çapkirinê nîşan da ku hunerên edebiyatê yê giranbuha û bi kalîte dikarin bi Kurdî bîn nivîsîn.²⁰ Û nivîsî ku "Min ev beşên ha ji bo ulemayên Tirk û Ereban tercume kirin û xwendin, hemûyan digot ku ji vê kitêbê çêtir me tu kitêb nediyê." Ev jî tiştêkî balkêş e ku ev kitêba Mem û Zînê ya destnivîskî ku Mîqdat Mîdhet bi kar dianî, ya Hacî Qadirî Koyî bû. Bo hurmeta mamosteyê xwe, sê şîrên Koyî, wî bi destê xwe nivîsibûn, di rûpelê dawîn de çap kiribûn. Koyî di vir de dibêje ku, ew bi xwe di hîmdariya şîrên Kurdî de li ba Xanî ye û wek wî emegdar e.²¹ Lêbelê ev îddîa ne rast e, tê de pîrr mubalexê heye. Di belavbûna huner û xebatên Xanî de çiyekî wî yê taybetî heye. Gelo eger Mîqdat Mîdhet ne şagirdê Koyî bûya, Mem û Zîn dê li Kurdistanê çap bibûya?

Wexta ku Mîqdat Mîdhet, dest bi perçe bi berçe weşandina Mem û Zînê kir, di destpêka beşa ewil de îlan kir ku wî niyet kiriye Mem û Zînê wek kitêb çap bike. Lê fersenda wî nebû. Çapa wê ya bi tevayî cara pêşîn dema ku tevgera Kurdî xurt û geş bû, derket. Salên pey dema dawîya Şerê Cihanê yê Yekemîn û serûbinbûna Împeratoriya Osmanî bû. Demeke kurt, ihtîmalek hebû ku dewleteke Kurdî saz bibe. Di pey şerawestîne re, di 1918'an de, piştî ku Îngilîz û Fransîzan Îstebol îşxal kirin, aristokrat û rewşenbîrên Kurdan "Kürdistan Tealî Cemiyeti" damezrandin. Di nav vê komeleyê de rêxistinên cûr bi cûr hebûn. Yek ji wan jî "Kürt Tamim-i Maarîf ve Neşriyat Cemiyeti" bû, ku li ser karê çapemenî û fêrbûnê dixebitî. Pirtûka ku di 1919'an de cara pêşîn çap kirin Mem û Zîna Ehmedê Xanî bû. Çapkirina vê kitêbê karê herî girîng ê "Kürt Tamim-i Maarîf ve Neşriyat Cemiyeti"yê bû.²² Baweriya pîrr kesan wisan e ku gelek nusxeyên vê kitêbê hatin şewitandin, gelek kêman hejmar di dest de man.²³ Ji ber kitêbê gelek destnivîs hatin nivîsîn. Dibe ku di pey vê çapê re li Kurdistana Bakur Mem û Zîn baş hatibe naskirin û zanîn.

Endamekî Kürt Tamim-i Maarîf ve Neşriyat Cemiyetiyê heq kiriye ku bi vê wesîleyê bi taybetî bê bibîranîn. Ji ber ku ew di sedsala 20an de li Tirkiyê bû ronakbîrekî Îslamî yê taybetî û bi tesîr. Ew Se'îdê Nûrsî ye ku di nav Kurdên Îstebolê de, rêça medreseyan temsîl dikir. Ew hînê dîtînen ronak û toleransê bû,

gelekî li ser gihîştina nesla Kurdên pey xwe sekinî. Li gor bîyografiya Se'îdê Nûrsî, ew yek ji wan kesan e ku Ehmedê Xanî berê pêşîn nas kiriye. Wî li Wan û Bedlîsê di çend medreseyan de xwend û paşê sê mehan jî li medresa Bayezîdê ma. Bayezîd bajarekî nêzî tirba Ehmedê Xanî ye. Di van sê mehan de wî şev û roj wexta xwe di tirba Ehmedê Xanî de derbas kir. Xelkê wan deran bawer kir ku Se'îd ji Ehmedê Xanî feyz girtiye.²⁴ Ew, piştî zemanekî dûr û dirêj jî difikire ku ev dem di hînbûna wî de zemanekî pir girîng e. Dibe ku ew bi saya Ehmedê Xanî bû şexsiyeteke girîng. Wî têkiliyên xwe ji tevgera Kurdî qut kirin.²⁵

Piştî serketina Kemalîstan, di 1922'an de xebatên Kürdistan Teali Cemiyeti hatin sekinandin. Pey re derheqê wê de me tu tiştê nebihîst.²⁶ Bedirxaniyan pirr vekirî li hember Kemalîstan cî girt û welat terk kirin. Yên ku welat terk nekirin, di navbera wan û Kemalîstan de gelek problem derketin. Seyyîd Ebdulqadir piştî serîhildana Şêx Se'îd hat bidardekirin. Piraniya jiyana Se'îdê Nûrsî di surgûniya hundur de derbas bû. Piştî 1927'an Celadet û Kamûran Bedirxan û hinek ronakbîrên Kurd li Sûriyeyê jiyana xwe domandin. Yekîtiya nû ya Kurdan, Xoybûn damezrandin. Di 1932'an de birayên Bedirxanî kovara girîng, Hawar derxistin. Ev berhemê ciddî yê yekemîn ê ku bi Kurmanciya standard, herfên Latîni û zaravê Cizîrê hat nivîsandin, kovara edebî ya Kurdî, Hawar bû.

Gelekî balkêş e ku kovara Hawarê pirr qedr û qîmet dida Ehmedê Xanî. Di hejmara 33'yan de (1'ê Çiriya Pêşîn 1941) Celadet Beg bi nasnavê Herekol Azîzan meqaleyek weşand, navê wê "Klasîkên Me" bû. Di vê nivîsê de ew balê pirr dikişîne ser Xanî û Mem û Zînê. Rûmî û Xanî dide ber hev. Molla Camî ji bo Mewlana dibêje "ew ne pêxember e, lê kitêba wî heye". Celadet Beg jî ji bo Xanî îddîa dike: "Bi min be, mirov dikare jê bêtir jî bibêje. Belê Xanî ji xudankitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a millî, pêxemberê ola me a nijadîn." Di Hawarê de hin beşên Mem û Zînê çap bûn. Piştî çend salan, di 1947'an de li Helebê, çapa Îstenbolê ji nû ve hat çapkirin.

Komara Mehabadê di dîroka tevgera Kurdî ya netewî de yek ji wan çend bûyerên girîng e ku Mem û Zîna Xanî tê de tu rol nelîztiye. Lêbelê şair Hejar di nav Komara Mehabadê de pirr aktîf bû, piştî hilweşandina Komarê çû li Îraqê bi cih bû, li Kurdistana Başûr Xanî da naskirin.²⁷ Di 1960'î de Mem û Zîn tercumeyî Soranî kir û li Bexdadê çap kir. Ev tarîx girîng e, ji ber ku wê demê tevgera Kurdî wek tevgera gelêrî dest pê kir. Wê demê li Îraqê tevgera gelêrî hebû. Di pey re monarşiya Abdulkerîm Qasim hat. Gelek kesên ku ev tercuma Hejar xwendin, gotin ku Xanî çi karekî mezin bi cî aniyê.

Di salên 1960'î de ji nû ve pêkhatina tevgera Kurdî ya li Tirkiyê, bi çapbûna tercumeya Mem û Zînê ve diqetê kişand. Mehmet Emîn Bozarşan di 1968'an de bi herfên Latîni-Kurdî, bi tercumeya Tirkî ew çap kir. Ev kitêb ne kitêba Kurdî ya pêşîn bû lê beşik ya herî girîng bû ku di wan salan de li Tirkiyê bi mucadeleyên mezin çap bû. Pirr kêman kesan dikaribûn ji Kurdiya Xanî ya giran fêm bikin. Çapa

wê ya ku Bozarslan tercumeyî Tirkî kiribû, di demeke kurt de ji xwendevanên wê yên berê pirtir bû xwediyê xwendevanan, ji ber ku hêsan dihat fêmkirin.

Herçiqas Bozarslan ew pasajên siyasî û hessas jê derxistibûn jî, dîsa otorîteyên resmî dest dan ser nusxeyên çapbûyî û qedexe kirin. Gelek kesên ku di destê wan de kitêb hebûn, ew veşartin. Di dema îdara eskerî ya Adara 1971'ê de, ji ber tirsê ew îmhakirin.²⁸

Kitêbeke min a ji wê çapa ewilîn a xweşik heye. Di 1976'an de hevalekî min da min. Nusxeyeke têra xwe kevn bû ev kitêba min. Merivan bi hev re ev beşên xweş bi dengêkî bilind xwendine. Ew ciyên ku Bozarslan jê derxistine, him Tirkî û him jî bi Kurdî bi nivîsa destan lê zêde kirine. Meriv dikare bibêje ku ev rûpelana jî rûpelên din pirtir hatine xwendin. Tirsra ji hukumatê ku kêmbû, xwedîkitêb ên ku qilîfên kitêban guhertibûn û di bin erdê de veşartibûn, demeke şûn de ew derxistin, rûpelên rîzyayî û kufîkî bi zemqê bi hev ve zeliqandin û bûn xwedî kitêbên xwe yên berê. Ez vê kitêba xwe wek xezîneyeke biqîmet dibînim. Ji bo min ew wek belgeyeke dîrokî û sembola pêşeroja kultura Kurdî ye. Berî du salan, min ji hevalekî yeka nû bi dest xist. Ji bo min pirr girîng e; Huseyin Deniz dabû min. Min xeberek xwend ku Huseyin Deniz li Ceylanpinarê bi destê "qatîlên nenas" hatiye kuştin. Huseyin yekî bêdeng bû û ji siyaseta pirtir bi karê kulturî ve mijûl dibû. Divê qatîlê wî bê dîtî; wek Kurdên din ên ku li wan deran bi qedr û qîmet bûn û jibo îmhakirina fikr û îdealên wan hatin kuştin. Huseyin dîtî û îdealên xwe di Xanî de didîtî.²⁹

Xanî û Neteweya Kurd

Gelo di dema Xanî de milletê Kurd hebû? Ez nafikirim ku hebû? Dîtînen min wekî cihê ne. Di nav dîrokzanên Awrûpayê de em rastî pirr kesan tên ku derheqê milletên Awrûpayê bi çi teherî hatine holê de, cûr bi cûr difikirin. Hinek dîrokzanên pîr, mesela Marc Bloch, milletbûna Frensîz û Almanan digihînin salên 1100'î. Johan Huizinga bawer nake ku berî sedsala 14'an milliyetbûn pêk hatiye. Dîrokzanê vê dema nêzîk Eugene Weber dibêje ku hê di salên 1900'î de Frensîz nebûbûn millet. Gelek ji gundiyên Frensîzan xwe wek Frensîz nedidîtî, lêbelê tenê şexsiyeta xwe bi herêm û gundê xwe ve nas dikirin. Di dibistanan de xwendî, bi zora eskerî û civatî û bi saya neşriyata radyoya neteweyî û hwd. bi zehmet û xîretên dewletê ve gundî bûn millet.³⁰

Hin nivîskarên modern û yên ku derheqê neteweperweriyê de dinivîsin, bi taybetî jî Anderson û Gellner, di vê dawiyê de dibêjin ku neteweperwerî û pêkhatina neteweyên modern wek bûyerên nû ne. Bi dîtina Gellner, dema ku endustrî dest pê dîke û gundî ji gundan koçî bajaran dikin, pê re milletbûn jî tê holê. Anderson çapemeniya kitêban -kapîtalîzma çapemeniyê- îfade dîke.³¹ Bi vî tehrî astengên di nav civatên gundî û herêman de hilweşiyên û milletbûn mumkun bû.

Anderson dibêje ku berî îcada çapemeniya pirtûkan, zimanê navnetewî yê xwendeyan Latînî bû, li Awrûpayê kêmbû kesên elît dikarîbûn Latînî bixwînin û

binivîsin. Tenê çend nusxeyên wan kitêbên destnivîs hebûn. Pêşdeçûna di warê teknîkî de, fersend da ku gelek nusxeyên kitêban çap bibin û bêtir firotin. Ji ber ku gelek kesan Frensî û Almanî ji Latînî bêtir dizanîbûn, çapxaneyan bi wan zimanan pirtûk çapkirin û gihandin gelek xwendevanan. Latînî gelekî ji qîmetê ket. Jibo têkiliya nava kesên xwedî xwendina bilind û kesên navnetewî, qîmeta Latînî kêmtir bû. Dewsa ku feyde jê bê, tebeqeyên civatê êdî ji hevdu fêr nedikirin. Lê gelekî nekişand, rewş hat guhertin, civatê bi yek zimanî xeber da, nivîsî û têgihîşt. Merivên ku rojname, kovar û kitêb bi zimanên xwe xwendin, ferq ket nav wan û yên ku bi zimanên din dixwendin. Bi vî tehrî civateke nû û millet hate holê. Bi dîtina Anderson "Ziman îmaja civatan e, ji ber ku ziman tenê di mêjiyê merivan de dijî. Di civatên tradîsyonel ku ne wek hev in de, pîrriya merivan hevûdin nas dikin. Di nav milletan de, meriv ji derî xwe tenê kêmtir kesên din nas dikin û wisa bawer in ku hemû kes wek wan in, ev îmaj heye." Lê li Rojhilata Navîn, netewetî wek Awrûpayê bi vî tehrî nehat holê. Lêbelê xebata Anderson nîşanî me dide ku li Rojhilata Navîn di pêşdeçûna netewetî ya Kurdî de girîngiya çapemeniyê çiqas zêde ye.

Hin dîrokzan dibêjin û balkêş dibînin ku di nav tebeqeyên cûr bi cûr de, li ser netewe û netewetî kêmtir an zêde xebardan alîkariya entegrasyonê dike.

Netewetî berê pêşîn di nav merivên ku di nav civatê de ciyekî wan î bilind heye dest pê dike. Paşê jî tebeqeyên mabeynî û yên ku xwedî ciyekî nizm in bi neteweyîtiyê dihesin. Pîrsa "millet" û li ser millet xebardan ji bo merivan ne balkêş bû. Di destpêka vî sedsalê de tenê grûbeke biçûk ji neteweperwerên Kurdan ku pîrriya wan jî ji malbatên aristokrat bûn, li Îstebolê û li derî welat xwendibûn û wek Awrûpayîyan difikirin, yek ji wan jî Qedrî Cemîl Paşa bû. Di bîranînên xwe de dibêje, di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de, teşebbus kirin ku serokeşîrên Kurdan alîkariya fikrên wan ên neteweyî bikin, lê mixabin xeyala wan vik û vala derket. Ji ber ku neteweyîtiya Kurdî ji bo axayan bêmena dihat dîtin. Van bûyeran axa eleqedar nedikirin. Gundî û xelkên eşîran bi serê xwe tenê man.³² Dema ku Qedrî Beg û hevalên xwe hewl didan ku fikrên milletperwerî di nav eşîran de (heke meriv rasttir bêje, di nav serekeşîran de) belav bikin, hîç gundiyan ku mensûbê eşîran ninin, nefikirin; ez baş ne emîn im ku wan wê demê ew gundî Kurd dihesibandin jî. Wê demê bi "ji milletê Kurd" binavkirin meriv kêfxweş nedikir. Wek kesekî ku ji milletê Kurd hatin binavkirin, hîsseke dilgeşî nedida wan. Di hin ciyên din de, min xwest Kurdan wek millet û bi taybetî jî bi hevkarîya gundiyan, tederîcî çawa pêş de çûn nîşan bidim.³³

Eger em çend sed salan bi şûn de vegehin, em dikarin hin pirsên weha bipirsin. Gelo Ehmedê Xanî ku digot "Kurd" û "Kurmanç", qesta wî çi bû? Dema ku digot "millet", dixwest çi bibêje? Ez bawer im ku wî ev nav bi me'na ku îro em bi kar tînin, bi kar neanîne. Ez bawer im ku wî gundiyan ku ne eşîr bûn, Kurd nehesibandine. Wek min berê jî gotibû, terîmên siyasî yên ku wî bi kar anîne, -wek nimûne "mîl"

(pirhejmara” millet”ê)- bi tehrekî din, wek gundiyan tê manekirin. Gava ku em nav û termên ku di Mem û Zînê de derbas dibin tercume dikin, em wan wek ew terîmên ku em îro bi kar tînin îfade dikin. Lê dibe ku îro jî em rind tê nagihêjin ku Ehmedê Xanî dixwaze çî bibêje. Ji aliyê din de, di vê berhema hunerbilind de xwendevanên ji hemû neslan dikarin wan me’neyên kûr û fireh bibînin, me’neyên wisa ku, dibe ku şair bi xwe jî li ser nefikiriye.

Encam

Gelek caran hatiye dîtin neku millet milletperweriyê, lê milletperweriyê millet aniye holê. Eger ku tevgera neteweyiya Kurdan bi serketa, nuha milletê Kurd dê bihata holê, dê hebûya. Wekî ku min li jorê jî îzeh kir, Ehmedê Xanî bi me’neya neteweperweriya modern a vê dawiyê, ne neteweperwerekî heqîqî ye. Ji alî din, min xwest nîşan bidim ku xebata wî û bi taybetî jî Mem û Zîn ji bo pêşdeçûna tevgera Kurdî, bi her alî ve xwedî roleke mezin e. Em dikarin ji bo wî bêjin ”bavê neteweperweriya Kurdan”. Neslên neteweyî yên pêş, dê bikaribin dîtînen xwe di xebatên Ehmedê Xanî de bibînin. Ne tesadufî ye ku di her çapa Kurdî ya nû de, yên ku çap dikin, edîtor û Mem û Zîn tev tînen girtin. Bi vî teherî Xanî îndîrekt alîkarî kir ku Kurdî wek zîmanekî ji nû ve her zêde bê jiyandin û bê nivîsandin.

Dewleta Tirk bi van metodan, bi vî tehrî alîkarî kir ku edebiyata Kurdî ji nû ve hat holê. Bi qedexebûna çapa Mem û Zîn a Bozarlan, ew her zêde bû sembola edebiyata Kurdî. Piştî Cûnta 12’ê Îlona 1980’yi, gelek xwendeyên Kurd ji welatê xwe koç kirin, çûn welatên der wek Almanya û bi taybetî jî Swêd. Gelekên wan wek penaberên siyasî bi cî bûn. Li vir wan îmkanên bi Kurdî nivîsandinê û çapkirinê bi dest xistin. Kesên ku li Tirkiyê tenê bi Tirkî dinivîsandin, li derveyê welêt tedricen Kurdî nivîsandin. Di van panzde salên dawîn de Kurmancî di nav zîmanên nivîskî û modern de gelekî pêşde çû. Di vê demê de kalîteya nivîsandinê bi awakî balkêş pêşde çû. Nuha edebiyata Kurmancî bédeng pêşde diçe û xurt dibe, jimareya xwendevanên Kurdî zûtir zêde dibin. Mehmed Emîn Bozarlan îsal bi tercuma wê ya Tirkî ya ewilîn û bi tercuma Kurmanciya hevdem Mem û Zîn ji nû ve çap kir, ev tiştêkî pir girîng e. Eger ev nivîskarên Kurd li Tirkiyeyê bimana, qet yek ji wan karan nedihate cî. Wek gelek caran vê carê jî hukumatê ji bo çapa nû û pêşilêgirtina texrîbata kultura Kurdî, alîkarî kir.

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê ku ji bo bîranîna Ehmedê Xanî û Mem û Zînê ev civîna îro amade kiriye, pîrozkirin (tebrîkkirin) heq kiriye. Jiber ku, karê ku Ehmedê Xanî dest pêkiribû îro ew didomînin. Afirandina kulturî, di demeke dirêj de, ji çalakiyên siyasî yên din efektîftir e. Eger Ehmedê Xanî wek bavê neteweperweriya Kurdî bê bi bîranîn, ev mîrasê meşrû yê Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê ye.

Ya ku ji Îngilîzî wergerandiye:
Azîme Kutlay

¹ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Tirkîya wê: M. E. Bozarslan, (Îstanbul, Gün Yayınları, 1968, çapa nû, 1975). Bozarslan kesê yekemîn e ku cehd û pêşniyar kir ku UNICEF resmî Mem û Zînê bi bîrbîne. Yên din ên ku derheqê Ehmedê Xanî de xebitîne me li jêr navê wan nivîsandîye.

² Muhammad Anwar Ali; Ahmad al-Khani Falsafatu al-Tasawwuf fi Diwanihi "Mam û Zîn", Camîatu al-Qeddis Yûsif-Mahad al-Adab al-Sharqîyye, 1972, 201 rûpel.

Ez sipasiyên xwe pêşkêşî Malmîsanîj dikim ku bala min kişand ser vê tezê.

³ Ferhad Shakely, Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de Neteweperweriya Kurdî (Swêd 1983, Çapa nû Brussel: Enstituya Kurdî, 1993).

⁴ Mehmed Uzun, Destpêka Edebiyata Kurdî (Ankara, Weşanên Beybûn, 1992)

⁵ Mûrad Ciwan, "Dewra Ahmedê Xanî û Kurdewerîya wî", Çira, hejmar 2 (Hezîran 1995), rr. 13-29

⁶ Di çapa Seyahatname ya Evliya Çelebî de, di behsên li ser Kurdistana Başûr û Amediyê de ez rastî vê nehatim. Lê dibe ku di nusxeyên berê yê destnivîs de hebin, ew li kutubxana Topkapiyê ne. Ez dixwazim li ser vê bixebitîm.

⁷ Axmed Xanî, Mam i Zin, Kriticeskiy tekst, perevod, predislovie i ukazateli, M.B. Rudenko (Moskva, NAUK, 1962), rr. 13-16

⁸ Di bikaranîna modern de, kelîma "dewlet" di dewsa "state" de tê bikaranîn. Lê me'neya wê ya orijînal cihê ye. Di "dîn û dewlet" de qest ne dînek û dewleteke taybetî ye.

⁹ Roma Reş, ev îfade rind tê naskirin. Dewleta Osmanî (Tirk) û bi taybetî jî esker wilo tèn bi navkirin. Ji ber ku cilên eskerên Osmanî di sedsala 19'an de reş bûn. (Ji bo vê malûmatê ez sipasî Nacî Kutlay dikim.)

¹⁰ Martin van Bruinessen, "Kurdish society, ethnicity, nationalism and refugee problems", Philip G. Kreyenbroek & Stefan Sperl eds., *The Kurds: a contemporary overview* (London, Routledge, 1992), rr. 33-67

¹¹ Ernest Gellner, *Nations and nationalism* (Oxford: Basil Blackwell, 1983), r. 1

¹² Ji bo analizên li ser ferqa çîroka *Memê Alan* û kitêba Xanî, binêre: Michael L. Chyet, "And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn", a Kurdish romance* (Ph. D. Dissertation, University of California, Berkeley, 1991), pp 52-62. Teza Chyet, îro ya herî baş e ku li ser edebiyata Kurdî ya devkî û tradîsyonel hatiye nivîsîn. Analîzên li ser hîjde versiyonên Memê Alan ên cûr bi cûr hatine kirin.

¹³ Piştî semînerê yek li min gerîya û got ku ez wek te nafikirim. Hember gotinên min fîrîzeke wî ya girîng hebû: Li Diyarbekirê tenê di mala wî de çend nusxeyên Mem û Zînê hebûn, di mala cîranan de jî hebûne. Hember vê dîtinê ez wisa difikirim: piraniya nusxeyên ku dema dawî di nav xelkê de hene, kopyayên çapa 1919'an in. Herwekî ku ezê li jêrê bibêjim, çapbûna kitêban di tarîxê de bûyereke girîng e, çunkî cemawerê xwendevanan peyda dike. Bi a min Mem û Zîn tenê piştî çapbûnê bû populer.

¹⁴ "...zehfî xezeliyat û eşaran û beyt bi zîmanê Kurmancî gotîye û di zîmanê Erebi û Farisî û Tirkî jî dîsan xezeliyat û eşaran û ebyatê zehf gotîye û di ulûmê funûnan jî qewî mahir û sahibê îrfan e û ji şûerayêd Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û fayiq e. Belkî ji hemû şûeran meqbûl û memdûh e...". Alexandre Jaba, *Recueil de notices et de recits Kourdes* (St. Petersburg, 1860), r. 15, ji tekstê Kurdî.

¹⁵ Qanadê Kurdo navên medreseyên Koy, Xoşnaw, Serdeşt, Erbil, Kirkuk, Silêmanî,

Sablax (Mehabad) û Şino (Uşnuviye) dide. Binêre: *Tarîxa Edebyata Kurdî-2*, (Stockholm, Weşanên Roja Nû 1985), r. 18.

¹⁶ Van herdu emîran bi xîret û xebata xwe piraniya Kurdistanê kirin yek û hildan bin bandoraxwe. Dr. Celîlê Celîl, *XIX Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğunda Kürtler*, (Ankara, Öz-Ge Yayınları, 1992).

Kitêba min, *Agha, Shaikh and State* (London, Zed Books, 1992), rr. 175-82 û 224-34 (*Ağa, Şeyh ve Devlet*, Ankara, Öz-Ge Yayınları, 1991), rr. 216-24 û 269-78). Min xwest ku di neteweperweriya modern a Kurdî ku hat holê û di pêşdeçûna wê de rolên emîran ku ji pêş çavan tên dûrxistinê nîşan bidim.

¹⁷ *Tarîxa Edebyata Kurdî-2*, r. 18. Min tu şop nedît ku Koyî di dema medreseyê de dixebitî ku Mem û Zînê bixwîne. Îhtimaleke mezin e ku Mem û Zîn li herêmên Kurdistanê yên ku Kurmancî xeber didan tenê dihate zanîn.

¹⁸ Amir Hassanpour, *Nationalism and language in Kurdistan, 1918-1985* (San Francisco, Mellen Research University Press, 1992), r. 93.

¹⁹ *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, Gîw Mukriyanî çap kir (Hewlêr, Çapxaney Kurdistan, 1953), r. 48, 51.

²⁰ "Min ev kitêb carna hin ulemayên Tirk û Ereba re xwendîye û tercume kiriye, hemiya jê gotiye ku 'vêrê de ji vê kitêbê çêtir me nedîye.'" M. E. Bozarşan, *Kurdistan*, cild: 1, r. 127 (çapa nû).

²¹

Zemane resmî caranî nemawe / Çiraxî nazim û munşî kujawe
Le dewrî ême roman û cerîde / egerçî meqsede zanîni bawe
eman qedrî bizanin em kitêbe / le dunya êstekê hemtay nemawe
Le eyyamî heyatî Şêxî Xanî / le ser nusxey xetî ew nûsrawe
Le lay erbabî xoy bo qedr û qîmet / xezîney gewhere w kîsey diraw e
Le mecmûî duwel Soran û Botan / le sayey em kitêbe nasirawe
Le Kurdan xeyrî Hacî w Şêxî Xanî / esasî nezmî Kurdî danenawe
(Binêre çapa Bozarşan, rr. 135-6.)

²² Ji bo Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti, endam û xebatên wê, binêre: İsmail Göldaş, *Kürdistan Teali Cemiyeti*, (İstanbul, Doz Yayınları, 1991), rr. 77-81

²³ Shakely, *Kurdish nationalism...*, r. 2

²⁴ Ji biyografiya Se'îd a resmî, *Bediüzzaman Said Nursi Hayatı- Mesleki, Tercüme-i Hali* (İstanbul, Sözleryayınevi, 1976), r. 35 û Necmeddin Şahiner, *Bilinmeyen Taraflarıyla Bediüzzaman Said Nursi* (İstanbul, Yeni Asya Yayınları, 1974), rr. 34-35

²⁵ Di biyografiya resmî ya Se'îdê Nûrsî de, behsa rola wî ya di tevgera netewî ya Kurdî de nedihat kirin. Rohat balkişand ser vî aliyê wî. Rohat, *Unuruluşuğun Bir Öyküsü: Said-i Kurdî* (İstanbul, Fırat Yayınları, 1991). Herweha Malmîsanîj, *Said-i Nursi ve Kürt Sorunu* (İstanbul, Doz Yayınları, 1991). Û kovara mehane *Dava* ku ji alî grûbeke prokurd a ku ji Nûrciyan qetyaye tê derxistin.

²⁶ Göldaş dinivîse ku Kürdistan Teali Cemiyeti, bi resmî ji alî hukumata İstenbolê (Osmanî) di Tîrmeha 1920'an de hat girtin. Lêbelê eşkere ye ku heta 1922'an hin faaliyetên wê dom kirine.

²⁷ Berî tercuma Hejar, Gîw Mukriyanî Mem û Zîn ji nû ve çap kir (li Erbilê, 1954 û paşê

1968) lê belê ji ber ku ew bi Kurmancî bû, li Kurdistanê Îraqê pîrr nehat xwendin.

²⁸ Piştî çend salan mehkema Bozarslan qediya, wî beraat kir, qedexebûna kitêbê rabû û di 1975'an de ji nû ve hat çapkirin.

²⁹ Huseyin Deniz li ser gotinên pêşyan ên Kurdî kitêbeke biçûk çap kir: *Gotinê Pêşyê Kurda/Kürt Atasözleri* (İstanbul, Kaynak Yayınları, 1991). Wî di rojnama pro-kurd *Yeni Ülkeyê* de ji car bi car nivîsand.

³⁰ Eugene Weber, *Peasants into French men: the modernization of rural France, 1870-1914* (London, Chatto & Windus, 1979)

³¹ Benedict Anderson, *Imagined communities: reflections on the origin and spread of nationalism* (London, Verso Editions, 1983); Ernest Gellner, *Nations and nationalism* (Oxford: Blackwell, 1983).

³² Zinar Sîlopî [Qedrî Beg Cemil Paşa], *Doza Kurdistan: Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı* (Beyrut, Stewr Basımevi, 1969), rr. 38-39

³³ Martin van Bruinessen, "Kurdish society, ethnicity, nationalism and refugee problems", Philip G. Kreyenbroek and Stefan Sperl (ed.). *The Kurds: a contemporary overview* (London, Routledge, 1992), rr. 33-67. "Nationalisme Kurde et ethnicités intra-kurds", *Peuples Méditerranéens*, No: 68-69 (1994), rr. 11-37

BİSERHATİYÊN ÇEND MİROVÊN SEYİDXANÊ KERR

Celadet Alî Bedirxan



Eslê vê nivîsê destnivîseke Celadet Bedirxanê rehmetî ye. Çend sal berê, Ş. Se'îd ji jina wî Rewşen Bedirxan girtiye û teslîmî Şiyar kiriye, min jî jibo weşandinê ji Şiyar girt. Ez gelek sipasî Ş. Se'îd û Şiyar dikim.

*Celadet Alî Bedirxan di destnivîsa vê nivîsê de di ciyê herfên K, Q, Û, U de herfên Q, K, U, Û bikar anîne (bo nimûne di ciyê Kurd de nivîsiye Qurd), min ew li gor elfaba nû ya Kurdî nivîsîn. Herweha wî di vê nivîsa xwe de carna du nuqte danîbûn ser herfa H (wek **Hesen**) û X (wek **xerîbî**), lê ji ber ku ew her du herfîro di elfaba Kurdî de cihê nayên nivîsîn min jî ew wek H û X nivîsîn. Hin fi'lên ku wek du kelîmeyên cihê hatibûn nivîsîn jî min wek kelîmeyekê nivîsîn (bo nimûne di ciyê "qeti bun", "ne birin" de min weha nivîsî: "ketibûn", "nebirin").*

Celadet, me'naya hin kelîme û terîman bi Tirkî -bi herfên 'Erebî- an jî bi Frensî li alîkî rûpelan nivîsî bû, min numre da wan û wek not di dawîya nivîsê de nivîsîn.

Digel ku di hin cumleyên vê nivîsê de şaşî an kêmasî hene jî min ew ji destnivîsa Celadet Alî Bedirxan bêguhartin neqtkirin. Kelîmeyên ku ez ji rastxwendina wan ne emîn bûm, min li kêleka wan di nava parantêzan de îşareta pirsê danî.

*Navê nivîsê, di destnivîsa wî de "Zarê Serhedan û Biserhatiyên Çend Mirovên Seyidxan" bû. **Seyidxan** [Seyidxanê Kerr], **Ferzende û Elîcan** ku di vê nivîsê de navê wan derbas dibe, sê mîrxasên navdar in û di dema Serhildana Agrîyê de bi eskerên dewleta Tirkiyê re şer kirine. Di hin stranên Kurdî de jî behsa wan tê kirin.*

M. Malmîsanij

[Ji devê] Tewfîq Axax kurê Ûsîf Axax ji mala Seydo, 30 salî [hatiye nivîsîn].

HESENAN [Û] SEYDAN

Hesenan çar bavik in. Bi xwe mil e.

Çar bra hebûn: Hesên, Seyid, Cibraîl, Bilo. Ev çar bir ji van dahatî ne:

1-**Hesenan**

2-**Seyidan**

3-**Bilikan**

4-**Cibran¹**

Kela Melazgîrd: tixûba Melazgîrd erda wan e. Qederê 500 gund hene. Ev gund hemî jî îrû şên in.

Ne koçer in lê li havînê derdikevin zozanan. Zozanê wan Dara Hovo,² tê de dareke karçînekî heye, gelek mezin û kevn e.

1- **Warê Nîzamê:** Ev nav jê re hatiye dayin, lewra ko di wextê Seydo de eşîr bi eskerê Romî di vê cihê de bi hev çûn. Romî pir hatibûn kuştin.

2- **Warê Kendalan:** Cihê wî kendal e.

3- **Warê Quleteynê:** Çal hene.

4- **Mîr Hesên:** Di wî zozanî de ziyaretekê bi vî navî heye.

5- **Mêrg-harûnê:** Giyahê wî har e.

6- **Dar-bî:** Darên bî zehf in.

7- **Reşîk:** Di wî zozanî de kaniyek heye. Di wê de rîsên konan boyax dixin, ava wê reş dibe, lewra Reşîk gotine.

8- **Kurdo**

Hesenan

1- **Mêrgê Kulav:** Giyahê wî pir nerm e.

2- **Altûn Text:** Erdê wê pir rind e.

3- **Çiyayê Lelê [Lele]:** Di wî welatî de hin hene, diya xwe re dibêjin "lele".

4- **Qazgol:**³ Golek heye qaz⁴ lê tên.

5- **[Çiyayê] Xara**

6- **Deqda**

Cibran

1- **Gawir Hamo**

2- **Şerefdîn**



Seyidxanê Kerr
(Fotograf ji M. Lewendî hatiye girtin.)

- 3- Bihngul
- 4- Xamirpêt

Bilikan

- 1- Sêgir
- 2- Mil-dewê Sipî
- 3- Mil-dewê Reş

XELASIYA GULANÊ [1929]

Li gulanê, 1929, Ferzende Beg rabû hat cem Seyidxan. Li gundê Qicix bi ro suwaran şewirek kirin. Ferzende jê re got ko tu îrû rabî di nav eşîran de bigerî, propaganda çêkî.

Gotina wan ser vê gotinê ma.⁵

Romî hatina Ferzende bihîst, êdîn sûzenî⁶ ket navbeyna me û Romî. Romî dest pê kirin ji me re nexweşî dikirin. Em weka berî nediçûn wîlayetê, em biçûna jî bi tevdir diçûn.

Salek gava Medenî Beg li Gelîyê Zilan xist, Tirk şandin peyê me, [gotin] werin em we çete binivîsin”. Me got ”Em çetetî naqedînin”.

Seyidxan bin ve şand dora xwe, maqûl anîn nik xwe, sund xwarin ko saetê hûn rabin em[ê] jî rabin. Xeber giha me ko Tirk bi ser me [de] esker bişînin. Em jî nediçûn Mûşê.

Mirovekî me ji Mûşê xeber şand, [got] bila Seyidxan neyê lê Tewfîq bila bê Mûşê. Ji malê jî ji me re kaxez hat, [got] werin em hevûdû bibînin. Ez çûm Mûşê, ji min re got:

– Çima hûn nezanî dikin, hukûmet bi we re qenc e. Here brayê xwe bîne, gotinekê me heye, wê gotinê bi cih bînin.

Min zanibû planek tê de heye, min got:

– Ezê vegerim, Seyidxan ji te re bînim.

Min xatir xwest hatim malê.

Ez hatim, min her tiştî brayê xwe re got. Roja din bi 15-20 suwaran em derketin Warê Kendalan. Ji tirsê, ko bêbextî me re nekin.

Serê tebaxê bû gava [em] derketin.⁷

Kurxalekî me hebû, taştê ji me re anîbû, got:

– Esker dora gund girtiye.

Em jê rabûn, em çûn Belisîyan, Çiyayê Qazanan.

Me hevalbendên xwe re xeber şandin ko rabin. Hinekî wî hatin hinekî wî nehatin.

Walî jî ji hêla din xeber şandin ji gundên me [re] ko arîkariya Seyidxan mekin.

Di wî wextî de Elîcan jî li Gelîyê Berazan [bû]. Tirk di heqê Elîcan de jî wek Seyidxan kiribûn. Gelîyê Berazan nîzingê Kela Melazgîrdê ye.

Elîcan avêt ser Kordona Rîzê [Lîzê?], lêxist du zebtiye kuştin.

Elîcan qesda me dikir dihat. Elîcan hat gehîşt me. Em li Bilanûxê bûn. Mewcûda me -Xwedê agahî⁸ - şêst suwar bûn. Tevî peyayên Elîcanî.

Em ji Resûlan rabûn hatin Mela Hidiran [Xidiran]. Em li ser taştê bûn, me dît dengê hat ji derve, esker hatin. Ew esker eskerê taqîba Elîcanî bû.

Li serdestê gund jî girek hebû, lê dora gund rast bû. Li tanişta wî girî du girên din hebûn. Yek li rastî, yek li çepî. Seyidxan got:

– Gelfî biran! Fêde nake, nîvê suwaran herin milê rastê, nîvê [din herin] milê çepê.

Esker hatin li pişta gir kemîn bûn, hilkişiyên li serê girî û destpêkirin lêdixistan.

Esker 140 suwar bûn.

Em bûn sê selef:

1-Milê rastê

2-Milê çepê

3-Berê xwe da esker, çû.



Esker ji me re xwiya nedibû. Selefê sisiyan pêya bû li binê gir, dizgînevan (?) avêtin hev. Şeş peya drêjê Tirko kirin. Selefên din ji kêlakan agir dikirin, Tirko nedikaribûn serên xwe hilînin. Em jî serbest diçûn.

Em çûn bi devê wan re ...⁹. Yek ket, me yek dîl girt, Tirko bazdan. Suwarên me jî bi du kêlakan suwar bûn, rikêb kirin, dan pey wan. Di wî şerî de ji Tirko 24 çûn, ji me birîndarek bû.

Paş şerî em çûn gudenkî [gundekî] din, Bolan-kend (gund). Li wêderê em man heta saet neh bişev, em ketin rê hatin Gurgalî. Em esrê ji Gurgalîyê rabûn em ketin cadê, em ketin newalekê; Yûsif Çawiş bi deh suwaran ji Mûşê dihat diçû Bilanixê.¹⁰ Em nava newalê de rastî hev hatin. Me ji par re serî [da] ser (gava em dîtî vegehrî revîn) me nîzikî da suwaran. Yûsif Çawiş ber kevîrekî peya bû. Ser lîngan li tîfînga xwe xebitî. Li me diavêt. Me jî lêxist, Yûsif Çawiş ket. Suwarên din direvîn. Yûsif Çawiş birîndar bû. Me da dûw zebtiyan, lê xelas bûn heta Zoravayê Sîrongê. Bû mexreb, em li Zorava de sekinîn, şêwir kirin. Wê şevê me avêt ser Tîlê (mudîriyet), dilê me hebû em Medenî biqefîlînin. Me telefon qetand. Jê, berbanga sibê me xwe gihand gundê Medenî (Norkoxak). Me dora gund girt, sibe zelal bû. Deh peyayê me ketin nava gund. Medenî revîbû. Heta nîvro em li wê man, du teyare hatin ji Bidlîsê li ser me.

Wê şevê em çûn Vartxaxê, li wê me şandin nik eşîran. Ji me re gotin sibê werin waran, em sund bixwin ser lêxistinê.¹¹

Medenî xwe gihande esker. Gundê ko em tê de bûn, di kûna Çiyayê Xaça Reş de ye. Esker bi gotina Medenî hatin bi ser me de. Esker di nav qemyona de bûn.

Sed mêt qemyona xwe cih de hiştin, gund nav me û esker e. Esker ji me re nedixwiya. Qereqolê me elam dan, esker ket newalê, Medenî pê re; ji qereqolê me derbas bûn, qereqol ew nedîtin. Esker xwe dabûn dehl.

Kalek bi zorê rêber¹² bû, xwe gihand qereqolê me, got esker esker tifingek agir kir. Esker xwe da ser dîdevanê me. Nobetçî neqefilandin, nobetçî xwe avêt gund. Çend suwarê me ketin çiyê kêleka esker. Em heşt-neh suwar ketin milê rastê esker. Xelkê me li gund bûn, nikaribûn serê xwe rakin. Seyid got:

– Bidine hicûmê. Em wî eskerî ranekin, suwarê me nikarin derkevin ji gund.

Me du heb cih de kuştin, yek birîndar, yek dîl. Çar esker xwe di nav dehl de veşartibûn. Elîcan dikeve bin destê wan, ji nişka ve ber didin ser, Elîcan dikujin.

Me esker ji ser gund rakirin. Xelkê me gava ev ji gundî dîtin, suwar bûn û ajotin ser esker. Esker jî bûn du biran: Mîralay bi 40 eskerî ve berê xwe da Ava Reş, çûn. Yuzbaşî bi 60 eskerî ve berê xwe dan Zirkêrî. Suwarê me bûn du bir, esker vegerandin. Me ji çiyê temaşa dikir. Esker teslim bûn. Birê 60 peyan. Zabitê wî kuştin, me çekên wan birin.

Çend suwarên me dan peyê Mîralay, ji wan pênc kuştin. Mîralay veşartibûn di nav qeraxa rêxê, me paşê bihîst, Medenî jî revîbû.

Em dîsa vegeerîn hatin cihê xwe. Me mirîyên xwe hilanîn. Elîcan me ji xwe re bir, bêr û qazma anî, me jê re gorrek kola, me defn kir; ser tirba wî agir kir, me cihê wî winda kir ko nayin derînin û serê wî jêkin bibin.

Em hatin Qizankê. Midirê Xwêtê revî çû Bidlîsê. Me şand pey Çîro kurê Malor, Mihemedê Sado; ew jî bi 30 suwaran hatin. Soz dane [ku] em herin nav Motkan, 20 rabin 1000 mirî derdikevin.

Egrî [Agrî] li şer e. Em ji par re vegeeriyên çûn Gelîyê Berazan. Romî jî teligraf dan, teyare hat bi ser me re.


Em gehîştin Gelîyê Berazan, nivro ye. Tevdîra nan dîtin. Cihê gund jî di nav du çiyayan de ye. Me çekê xwe derêxistibû. Qîrîn bû, esker hat.

Hela dijmin nedihat ber me, dihat dîtin. Nobetçî giha negîha gund, esker agir kirin. Em suwar bûn, me da li çiyayê hemberî. Em ...¹³ muqabilî hev bûn. Esker bûn pênc-şeş bir û dihatin bi ser me de. Heta nîzingî mexrebê me hevdû xist. Ji esker çar-pênc hatine kuştin. Esker tenwîr ...¹⁴ diavêt. Em êdîn ji par re vegeeriyên. Ji Ava Miradê em derbas bûn hatin Aladaxê. Me pirsê kerê [kîrê] Egrî kir, gotin ker ji her alî girtîye, Tendûrek tijî bi esker e. Em jî derbasê Çiyayê Xaçê Reş bûn.

Firqek hat, gazek heye li çiyê, li wê danî. Çadir vegirtin. Walî jî ji Mûşê hat. Xelkê Qicixê dişînin ditînin (?), Mela Qimra, Hemê Helo, Tapî, Kanîcotek berhevî ser hev dîkin, xelkê wan ditînin (?). Tasek ava wan bêpere naxwin. Şest mêt ji nav vediqetînin. Mela Emîn dibêje ”[ewê] me bikujin, em birevin”, lê qaîl nabin. Mela Emîn bi sola xwe li eniya nobetçî dide û direve. Singû tê werdikin.

Sibê zela[l] dibe, xanî hemî bi xaz dirêşin, disojin.

Ew 60 mêt, di Newala Çêlekan de du mtralyoz lê girêdan û hemî kuştin. Jinên



Salih kurrê Tewfîq Beg
(Fotograf ji M. Lewendî hatîye girtin.)

wan jî dan pêşiya esker, anîn dora Mûşê, li gundan belav kirin.

Em jî hatin Çiyayê Narikî, gundê Ferhenlî [Ferhend]¹⁵. Kulfet bi me re ne. Em tîn derbasê xetê bibin. Hisên Axa (maqûlê Silvan, kurê Sadon Axa) şandibû, [gotibû] emê lêxin lê axayên me mîrekên Hezro¹⁶ bi (?) me nayin. Ger dixwaze jê re suwaran bidim, derbasê xetê bibin.

Qasidê wî hat çû nik (apê wî) Hesên Axa.¹⁷ Hesên Axa ji me re rastî negot. Got bila herin nik Şêx Fexrî, ew çetir rêya xetê zanit.

Şêx Fexrî peyayê hukûmetê ye.

Vê şevê em çûn nik Şêx Fexrî. Pî neda ber me.¹⁸ Got "ez naqedînim, îdara hespên we di gundê me de nabe", em xwedî nekirin. Em şandin çiyayê piştê Hezro, çiyayê bê av, bê çêre. Çêra wî nîne.

Em man heta êvarê. Ji binê şande hukûmetê, [got] cihê wan bêkês e, çawan dixwazin welê bikin. Me pê nizanibû.

Êvarê me sofikî da pêşiya xwe, soft em anîn piştê Hondrof [Hindrof].¹⁹ Em di piştê wê re derbas bûn, em hatin Derê Kur. Zinarekî ye di nav Çiyayê Narikî de ye. Li wêderê jî (Derê Kur) heta Hezro tijî esker kiribûn. Dinya hêj şev bû, esker fişingên ronahî diavêtin. Suwarê me dîtin, makînelî li me rast rikin [kirin]; me jî destek li wan berdan û şûn de veberihan.

Gelek deran mifrezeyên wan em di ser re derbas kiribûn ko em bikevin nava wan. Li her alî li me xistin. Sibe zelal bû, em gehîştin dewra gundê Şêx Fexrî. Du mirovên me çûbûn nik Şêx, ew girtin û tifingên wan standin. Em, wê rûjê pê de me ajot, em hatin nav Hevêdan. Nan ji me re anîn. Hema ser piştê hespê me nan xwar. Mexrebê em hatin gundê Şêx Mihemedê Dûdêrî. Şeş jin û heft heb zarowên hûr bi me re hebûn, me teslîmê wî kir[in]. Em bertirê sibê ji mala wî derketin. Esker jî têt dikeve gund. Em hê dûr neketibûn. Şêx nanê wan qesdî dereng dide çêkirin. Em jî hatin li Qeysêrê mala Emerê Mihê, maqûlê Xiyân.

Emer ji me re got "xwe bidin Talorî, asê ye". Em di Gaza Sîra de çûn. Em çûn Geliyê Gûza, êdîn hespên me nedîşuxilîn. Firqe ji Mûşê hatibû. Me hespê xwe da Sasûniyan, em jî bi dehl û gundên Hewlê [Hewrê?] ketin. Esker heşt-neh rûj man, em bi ser de neçûn. Îdara wan nedibû, veberihan çûn Mûşê.

Li me bû zifistan. Me bi Hisên Axa Ferqînî mixabere kir. Hisên Axa ji me re 150 kod genim hêra şand, birinc, ji me re şekir, çay, tûtin şandin. Destek çek da Seyidxan re durin [dirûn], go:

– Ez şermîyê we [me] di nav eşîrê de, ew gotina ku apê min ji we re got, ez ne xwedanê wê gotinê bûm.

Got: – Panzde suwar ji we re bidim, ez we derbasê xetê bikim. Ez sekinîme ji we re.

Em man di çiyayan de, di gundan de em teqşîm (?) bûn. Tîrk nedihatîn bi ser me de. Cih asê ye, nikarin bîn.

Talor[î], Gorkan, Teveling, Hertixo, Gidornî, Purx, Hêk, Holoxing, Hartik, Hergok, Hêling.

Me rûjê bîst tifingên xwe li pezkûviyan dixistin.

Ciwab ji me re hat. Hatîn ji Seyidxan re gotin her pênc gundên te şewitandin. 60 mirovên te kuştin.

Seyidxan got em li ser kurşan²⁰ herin, lê neçûn.

[NÎSAN 1931]

Em buharê rabûn çûn.

Em hatin derketin gîharê²¹ deştê. Me li wêderê bi rûj deşt keşf kir bi dûrbînê. Heçî rê hebûn, av bûbûn. Şilî pir bû. Çem fre bûbûn. Mexrebê me ji çiyê de berd[a] xar. Em hatin ber Velarincê derbas bûn, em Pozê Çizwagî jê jî derbas bûn, Em tamam ji avê derbas bûn. Em hatin ber Ava Reş, li vî serî bûye mîna behr. Li wî serî jî welê...²² Silêman em derbas kirin bi kelekê. Me sibê xwe gihandin Zoravayê. Em hatin li maleke dost. Dewarên me hilanîn. Em qenc hewandin. Mixtarê gund pê hesiyabû û çûbû li (?) gundekî din. Wê rûjê bi rûj em man li gund, saet bû sisêyê şevê, em ji wêderê rabûn. Em derketin çiyayê me. Ev mixtar jî bûbû muxbîrê hukûmatê. Ji sê saet dûr tifingan avêt. Ev[î] li wêderê tifing agir kir. Gundên deştê bi wan hesiyan, jê pirsiyar kirin, got Seyidxan hatibû gundê me. Midûr û xelkê deştê bira bên ser rêça me.

Me mirov şand, Simtorosê (?) de, di malekê de çend kod genimê me hebû, ji me re anîn.

Em bi diyarê gundê xwe ketibûn. Me nan lédixist. Dîdevanê me elamet da me, got esker li dûw rêça me derket. Em jî çend heb çûn nik dîdevanê me, ewan jî em dîtîn. Esker sivik bûn, newêribûn, vegeyriyan çûn deştê. Em hatin Qicixê, yekcar şewitandibûn. Em ji wê çûn Mela Qimra, ew jî şewitandibûn, sê heb...²³ kuştibûn. Em hatin Heme Xelo,²⁴ ew jî şewitandibûn. Em hatin Tapiyê, bû mexreb. Wê şevê em man li Tapiyê, me ji xwe re agir dada.²⁵ Saetek ma ji sibê re em ji wê rabûn, em hatin Kanîcotkê, gund şewitandibûn, koxek xanî tê de mabû. Cihê gund jî rind bû, me dîdevanên xwe derêxistibû. Dîdevan got esker derket dîsan gazê, qederê go suwar ji gazê berjêr bûn, Yuzbaşî Memdûh Beg pê re bû. Newêribû bidin dûw rêçên me, hatin ketin gundên Bilanûxê.

Em wê şevê hatin Somanê, nanê şeş rûjan me ji Somanê hilanî, em hatin pişta Kopo. Di pişta wê de Çire heye, em li wêderê man. Em her du çûn nobetê. Dijmin jî keşfa [keşfa] çiyê dikirin. Me ew dîtibûn lê ewan jî em dîtibûn lê nediwêribûn bihatana. Wê rûjê heta mexrebê ew man, wê şevê me xwe avêt Çiyayê Bilêcanê. Em di şikeftê de man.

Di hindirû wê şikeftê de av jî hebû. Me pênc rûj nanê xwe xwar, şeş rûj jî me gûlik²⁶ xwar. Piştî wê em çûn ji aşekî me ard anî.

Em hejdeh rûj man wî çiyayî de, kesek me nehesiya. Em ji wê rabûn [çûn] piştî Têxûtê. Ji Têxûtê me barek nanê lêxistî anî. Me tenbîh kir êvarê wextê rabûnê ji me re barekî din kar bikin. Êvarê dîsan nan anîn.

Êvarê em rabûn ketin Kanî Spî, cedeyê. Em wê şevê pê de hatin. Em hatin devê Ava Miradê, em şargeh bûn. Em wê rûjê birûj man di wir de, bişev ji wê rabûn. Sibehê em hatin Zuxirê,²⁷ Şêx Mîrza. Ez hatim gund[ê] Koxak, gundê xwezûrê Tewfîq. Oda raxistin, Seyidxan û pêyayên din hatin. Ev xelk mihacirên Qersê bûn, em anîn rengê mirovan. Erd jî zuwa bûbû. Seyidxan digot: Em hatine heyfa xwe.

Mamidê Rûqer mixbîrê hikûmetê bû. Me avêt mala wî, sehera sibê. Sibê zelal bû, me dora gund girt. Me Mamid ji hindûrê xanê derêxist, bi çar lawên wî re. Xelk şadetî dikirin, me kuşt. Lawê wî ê mezin jî kuştin, Beşîr. Me deh hesp jî standin. Xelk da me.

Em jê hatin Pirqaşênê, deh hesp li wê jî dan me. Me hespên xwe li Talorê hiştibûn. Em wê şevê ji Pîrqaşênê²⁸ suwar bûn, me bi şev li ser Lîzê de girt. Midirlik bû. Midir revîbû, em têkilê xelkê nebûn. Bi rûj em jê suwar bûn hatin Piyangê, me nanê nîvro xwar. Em wê şevê dîsan hatin Bilêcanê.

180 suwar ji Mûşê derket hat taqîbata me (Derwîş Beg). Ji Kopê jî 60 suwar bûn (Memduh). Me bi dûrbînê didît. Me li wêderê bi hev re mixabere danî. Derwîş Beg kaxez nivîsî got bira bên teslîm bibin. Seyidxan got teslîm bi vê qeydê nabe.

Şerîf Çawîş bi 40 suwarî ve hat. Me didît esker zêde dianîn. Me got: Bila emrê Mifetîşê Îmûmî bînin. Midirek şandin nik me, titin û kebab ji me re şandin. Hebîb Midir go²⁹ were teslîm bibin. Seyidxan [got] teslîmbûn nîne. Me heta mexreb nehişt midir vegere.

Seyidxan got ...³⁰: Ez îşev xwe winda bikim, sibê derkevim ser gazekê, ger we eskerê xwe şûn de vegerandin, ez bi we re mixabere bikim.

Wê şevê me pê de ajot. Qonaxa 15 saetan em hatin. Ewan jî eskerê xwe biribûn Kopê. Li ber Kopê qayikek heye, şikenandî bûn. Di ber Tozava (?) re qayikeke din hebû, sibê taştê em gihan qayikê. Em hatin nava gund, me qayikcî girt, go: Qayik heya duhî dişuxilî, qereqola Seqavîyê (?) hat da avê.

Me du-sê qemçî lêxist em çûn. Lêvek ji qayikê xwiya dikir. Sê cot ga me anî, bi zincîran me qayik derêxist, ...³¹ avê dan, ava wê rijîya.

Qayik saz kirin, em derbas bûn. Em suwar hatin Axpîwar, me nanê xwe standin. Em hatin Çarbuhrê, em hatin Anêrê [li] wê man. Li wê, ji Anêrê suwar bûn em hatin Şamîranê, jê Xêrgîsê, sê rûjên me tamam bûn.

Qayika şikênandî çêkirin ko bikevin pêşîya me. Nîvekî suwarên wî hatin Qeraxil, pêşîya me girtin, nîvekî suwaran derbasê Tîrçongê bûn. Em bi şev li nav her du gundan derbas bûn. Em bi sibê re hatin Elî Qerxanan. Em jê rabûn ketin Çiyayê Qazgolê, em pê de hatin.

Em wê rûjê man li Qazgolê, êvarê ji wir suwar bûn, sibêhê em çûn Çiyayê Xara. Mixbîrek heye, Kulî. Tevdîra xwe kiriye diçe Hezaromê. Xeber giha me. Me sibê bi ser mala wî de girt. Min got were teslîm be, nehat. Me agir berda xaniyê wî, me Kulî kuşt. Em jê derketin. Derwîş Beg bi 200 suwarî hat ket gund. Pir ber Kulî diket.

Em ji wê hatin Gelîyê Berazan. Em sê rûj man li Gelîyê Berazan, em ji wêderê çûn Qereyazîyê. Em li gundê Bêro bûn. Em ji gundê Bêro suwar bûn hatin Axilê Rez. Derwîş Beg eskerê Hezaromê jî gihand xwe, bûn 300 suwarî. Ew ji gundê Bêro suwar bûn, em ji Axilê Rez suwar bûn. Ew hat di axilê Rez de peya bû, dîsan Derwîş Beg kaxez nivîsîbû Seyidxan re ko teslîm bibin, bi tifingên we hûn herin gundên xwe.

Em jê suwar bûn hatin Gelîyê Berazan. Wê şevê em hatin çiyayê gundê Ferzende, bi şev hatin Hesên Paşê.

Ji Hesên Paşê me mirov dan pêşiya xwe, digotin Ava Miradê nivê wê buhûr dide nivê wê nade; du çiq³² bû. Em hatin ber avê. Mêrik ket nav avê, ji çiqekî derbas bû, em hatin çiqê din, mehîna wî di avê de ji qam ket û mêrik ji par re vejeriya. [Em] bi melevanî derbas bûn. Em çûn li gundek (Reşî) peya bûn. Hemî me ceh da hespên xwe. Jê em hatin Mela Hesên, Întava [Entaw] Dûtax qeza ye. Lawê Evdilmecîd Begî Zekî Beg³³ ji me re got Mûsayê Ehmed Begî Sipkî çete ye, bi 25 suwaran çûne kela Kulê.

Ji me re xeber hat, Mûsa Beg em [bi me] hesiyane. Tewfîq derket bi çend suwaran ber bi Cemalwerdî ve. Ez derketim perê gund, ew jî tîn gund. Em çûn ber riya wan, di hundirê xirbê de peya bûn. Ji me re nîzik bûn, ber xirbê diborîn, tifingên wan deverû bûn.

– Ez bexê mala Seydoyê Pozreş im.

Hema destên xwe avêtin tifingên xwe. Ez û hevalên min me pev re berda. Yek ket, temamî xwe avêtin nava gund, suwarên me teze xwe gihandine.

Seyidxan go êrîş. Em ketin nav gund, peya bûn ketin himbêza hev. Mûsa Beg jî ket. Sidiq Beg jî (pismam) ket, Mehmûd Beg jî ket, çar xwîlam jî ketin.

Ê din gotin Seyidxan bextê Derwîş³⁴ bide me, em teslîm in. Çar heb reviyân, ketin hu[n]dirê xanî. Min jî da pey. Ew jî teslîm bûn. Min çekên wan standin. Hesp jî. Me hemî kiras û derpê kirin. Şahî ket nav millet. (Hin beşên strana "Seyîdxan" ên ku behsa vî şerî dikin, em di vê hejmara Çirayê de diweşînin.-M. Malmîsani)

Em jê suwar bûn hatin Çiyayê Qertewînê. Du rûjan em man, rûja sisiya em hatin Aliyarê; gundê şêxan e. Şêx got Derwîş Beg digel 150 suwaran hema ji pêşiya we çû derbasê Kêsa û Banê bû. Got: Xeber ji Kela Melazgîrdê heye. 200 suwar jî di kelê de ne. 250 suwarî jî hat ket Marmûsê, 200 peya jî hatine Cemalwerdîyê.

...³⁵ wan ev e: 250 suwarên Derwîş Begî hilkişîn Qertewînê, 200 peya jî hilkişîn. Temam hilkişîn Qertewînê. Dibêjin ko em li Qertewînê.

Me mirovek stand ji Şêx, me da ber, em hatin ber Kela Melazgîrdê re³⁶ em derbas [bûn].

Pismamekî me hebû, Seyidxan dabû pêşiya suwaran. Yek ji suwaran rikêba (zengû) wî dikeve, peya dibe, mehîn direve, dide peyê wê. Em pê nehesian. Nîv saet em jê dûr ketin.

Seyidxan suwaran da hejmartin, met dît Memed Sidiq nîne. Dengê tifingekî hat, Seyidxan jî du tifing xêlkî berdan. Memed Sidiq peya hat. Esker di nav gelî de dengên tifingan dibihîzin, heta sibê ranakevin.

Em hatin li Tendûrekê derbas bûn, sibe zelal bû. Em hatin li Kerkelûwê peya bûn. Me nan bir, titin anîn, pir arîkariya me kirin. Em jê rabûn suwar bûn, xelkê bi me re rawestiyan. Em hatin nav ket,³⁷ peya bûn, me destmêj girt, nivêja xwe kir. Seyidxan bi dûrbînê dinêrt, go rabin suwar bin, esker hat ket nav gund.

Em suwar bûn. Seyidxan gehîşt ji gir nik me, esker ketin dewsa Seyidxan. Çend yaylim li me dan. Esker li me bûn çar biran, dan dûwê me. Birek ajot ko bikeve pêşî. Seyidxan go hêdî herin ka hîsaba wan çi ye? Gelek nîzingî me bûn, Seyidxan got vegerin çend dest berdîn. Me lêxist, esker di cihê xwe de sekinî. Em dîsan kişiyân. Em ketin Çiyayê Bilêcanê. Me li hev xist heta bû eşa. Em jî bûbûn bir bi bir. Me zabitek û heşt mêr kuştin. Mehîneke me birîndar bû.

Bû tarî em rabûn ji Bilêcanê, wê şevê em hatin gaza Demirçî. Em pê de bi rûj hatin ji Qazanan derbas bûn, ji Qicixê derbas bûn, em li Kurê Resûlan şargeh bûn. Wê rûjê esker nehat, rûja din li Bilanûxê 600 suwar û 20 peya gihane hev, da dûwê rêça me û hat. Hat heya ser rêya cadeyê, rast berê xwe dan deştê çûn Hêkan. Wê şevê li wêderê man.

Êvarê ji wir suwar bûn, li Pira Şevlixê (?) em derbas buwana, karwanek li ser pirê bû, gotin: 100 esker li wî aliyê pirê ne, derbas mebin. Me çar mirov şandin, mirovên me çûn heta nivê pirê, Tirk bang kirin "geçiniz". Yên me gotin karwan e, gotin vegerin memnû e.

Em jê suwar bûn. Du saet mabû sibê, Mûş jî ji me du saet dûr bû. Me da rê. Tarîbariya (şewgura) sibê bû, em di ber gund[ê] Mixako derbas bûn. Em derbasî wî aliyê avê bûn, sibê zelal bû. Em hatin Qizil Axaçê peya bûn. Li ber me gundî şa bûn; me nan bir û suwar bûn.

Em derketin nava serê gazê (Qazme), me dît esker ji Mûşê derdikeve. Hat Qizil Axacê de peya bû. Ji xelkê pirsîn "Kanî Seyidxan?" Gotin "Aha li ber çavên we ye, çiman ji me dipirsîn?" Li mixtarî xistin, dîsan ketin Hekan,³⁸ heta êvarê li wêderê man. Sê suwarên eşîra Elmanan hatin ketin pêşiya me rêberî.

Em sibê re hatin Gencê, me nan xawar. Çekê me tev eskerî ne. Pirsîn "Hun kî ne?". Me got "Em çetê Medenî ne". Sûzenî li wan çêbû lê tiştek negotin. Em ji pirê derbas bûn hatin mala Egî Begî. Em sê rûjan man mala wî, pir qedrê me girt. Midûr telefon kir [got] çetê Medenî ye, Walî got Seyidxan e.

Genc tabî'ê Mûşê ye. Ji wê em hatin mala Zînê, keça Mehmed Elî Hecî Çeto, mezinê Soraxê. Em sê rûj man mala wê. Îkram kir. 12 rûj em man nava Dumilîyan de. Çar-pênc beled derdixistin, me nobet nedigirt, wan digirt.

Em ji wêderê hatin Gonigê, şeş rûj li wê man. Qedrê me girtin. Em jê hatin ketin Çiyayê Şerefdînê. Em hatin Şuşarê, teniştê Hezaromê. Jê hatin Tekmanê, jê Goksûyê, jê Qereyazîyê, jê Pasînê. Ji me re her tişt dianîn, me xwedî dikirin. Nîvro bû, em hatin gundekî (Qazî Celalê). Me nanê nîvro xwar, nobetçiyê me tifing avêt, mifrizê ji Diharê dihat.

Esker hat ket gundekî. Di navbera me [de] girek heye. Me her du[yan] qesda gir kiribû. Me di navsera gir de gîhande hev, me berda hevdû, Tirk bazdan. Êdî man ser hespê sivik (me serî dida ser). Me heft ji wan kuştin. Yekî me şehîd ket (şehîd Şamîl e), yek birîndar bû (Mistefa).

Me 15 tifing û hesp anîn. Bû tarî, em vegeyriyan me kuştîyê xwe û birîndarê xwe anîn Qazî Celalê, wê şevê [em] li wê man. Sibe bû, jê suwar bûn em hatin pê de birûj Gelîyê Berazan. Eskerê wî kişîyan. Sê şevan man di Gelîyê Berazan [de], em hatin Çiyayê Lelê. Em jê berjêr bûn, em hatin ketin deştê Melazgîrdê. Em bi serî ve hatin ser mifrezekî, heye heştê suwar. Hema suwar bûn pehnîk dan. Em hatin Sirtanlû [Siltalî], xelkê gund gotin qederê 60 esker ketine devê bihur, bihur girtî ye. Em jê vegeyriyan hatin Şêrwan-Şêxê, di ber re em derbas bûn, ji Bihurê Mitirban (?) ava Hevrenge (Heftreng).

Eskerê piyade danîbûn ser rêya me. Di ber Mêxikê esker sekinîbû. Em ketin cot cot rê, zabit ji çadirê derket li me dinihêrt.

Em hatin Şaberatê, ji Ava Miradê derbas bûn. Em hatin Qoxagê, me nan xwar, serên xwe dan kurkirin, jê suwar bûn hatine Bostakendê. Em mexrebê ji wir suwar bûn em hatin Çiyayê Mela Qimra, ji wir derbas bûn, newalek piştê Kela Reşê heye, Tengik. Em ketin dehlê, sê saet roj³⁹ çû, dîdevanê me got esker berjêr bû, ji gazê têt. Newal newal em çûn. Seyidxan [got] deh heb peya werin, deh peya çûn. Seyidxan jî pêya bûye. Zabit cihê mîtralîyozan çêdikir. Ez hingî hatim, me hevdû dîtî, got Seyidxan. Seyidxan got hespan bibin wî rûbarî,⁴⁰ pêya hemî bên. Hatin, me cihê xwe girtin. Me bi Tirkî gazî kir û pê ve danî, me li hev xist. Saetek paşê, me go em êrîş bikin, lê me dît eskerê nû derket, serî daye ser hev,⁴¹ hatin li kêleka me sekinîn, cihê xwe girtin, dora me girtin. (Sînga min bi mewzî ve şidand.) Şer bû, heşt tomatîk. Me du car hicûm daye. (Ji par da serî ser.) Heta ko bû tarî şer bû, qederê deh saetan. Ji me du birîndar, ji dijmin deh kuştî, du zabit, kuştîyek li Mûşê mir. Em bi sibê re hatin Xaçê Reş. Em hatin Germavê, pênc rûj man li wêderê.

Brayê Çîroyê Malor mezinê Motkan hat nik Seyidxan, esker hatin ketin Mûşê. Seyidxan tifingek da wî [birayê Çîro] re, soza xwe dan ko bi me re lêxin.

Xelkê Sûşûnê (?) hatin gotin esker berhev dikin. Tewfîq birînd[a]r [bû]. Seyidxan bi 20 suwaran çû deştê ko esker neyên çiyê.

100 suwarê Tirkî li Qozmê sekinîbûn. Du tehsîldar hatin berî me li konan, hêj pere necivandibûn, me girtin, tifing standin. Wê şevê em hatin Qotanan, esker jî li dûwê me hatibû. Em jê qelibîn, li Dara Sevê em şarge bûn. Nobet xwedî dikir. Nobetçî sibê got esker derket diyarê Mîr Hesên. Esker rêça me rast kir, lê nehat me.

Em jê çû[n] Bostakendê. Me nan xwar, qasidek ji Melek Kendê hat, go hene 300 piyade, 110'ên wî çûn Lîzê (mudîrîyet), 110[ên] wî jî [çûn] Xweşgeldî, mayînin hatine Xoxagê.

Wê şevê em suwar bûn çûn Newala Canimê, heya esrê li wir sekin[în], jê hatin Qizil Meyîştê; me hespên xwe sol dikirin, esker ji rêya Mela Xidiran dihat. Seyidxan got çend suwar herin pêşî, heta em hesp sol bikin.

Suwarên me çav dan, esker cih de sekinî, nehat. Me şuxlê xwe qedand, bû tarî, esker nehat. Esker paşê hat gund, gotin "We çima xwedî kir?" Gotin "Hon⁴² pê nikaribûn, me çi bikira?" Mixtar û çend zilam girtin. Çend heb revîbûn. Ji Caxsorê jî girtin û kuştin, 15 [kes]. Hin revîn.

Em jê vegeeriyên hatin paş heft rûjan nik Tewfîq. Heftîkî jî [em] li çiyê man, birîna Tewfîq jî hebek çêbûbû.

Seyidxan êdî qerara xwe dabû ko em derbasê xetê bibin. Cihê me di Çiyayê Sasûnê de Andok bû. Em ji Andokê rabûn hatin Gelîyê Zendûs (?), jê hatin Permisê (?), jê hatin Kuba Zilan. Em bişev hatin nava Silîvan û Bişêrî, ji wêderê me dît ji aliyê Pira Batmanê qederê jêst mêr dihatin. Seyidxan got cih bêkê e. Em suwar bûn me da rê, em hatin gundêkî, me li gund memûrê rejî û zebtiye girtin, tîfing standin.

Li wan gundan li me bû gazî, midir bi beqçî re 30 suwarî li me xistin. Du saet dûw me hatin. Seyidxan got em vegeerin. 10-15 suwarên me lê vegeeriyên sê heb kuştin, pênc hesp anîn. Em ji Ava Diyarbekrê derbas bûn, em hatin Şikirlî, me nan hilanî. Bû tarî, em hatin mifrizekî rastî me hat, li me nexistin, me di ser xwe re derbas kirin. Nîv saet em dûr ketin derbek xêlki berdan. Seyidxan got bajon em îşev bigehine Qewsan. Şewgura sibê bû, me xwe gihand ber Qewsan. Du suwarên me pê de çûn, bi serî ve çûn ser nobetçî esker. Nobetçî gotin "Hûn kî ne?" Gotin "Em gundî ne" û vegeeriyên hatin. 100 suwarî di gund de ye. Di ber gund re bi zengû em derbas bûn. Sibê zelal bû, me xwe da çiyê.

Gundîkî şixre dikêşand bi kera xwe. Seyidxan go rûjê deh mecîdî bi te [dim] were avê raberê me ke. Mêrik em anîn çiyê, cihekî qenc. Nobetçî me derketin, teyare hat ser me. Teyare pîr car hat lê em neditin. Saet bû sisêyê rûjê, em jor de ber jêr rûbarê aliyê Cilînê (gund) bûn. Em hatin, paleyên wan zevî diçînin.

Li wê derê Seyidxan çûn -bi suwaran- cem palan, Tewfîq bi çendan çû cem palekî. Me go qewer be. Go ser seran, hon esker in, xelkê kuderê ne. Go navê min Hecî Mihemed e. Par çûme hecê. Me got em filankes in. Tu nikarî beledekî bidî, me bişînî xetê? Çi bixwazê emê bidinê.

Şand dûw brazîyê xwe, brazîyê wî hat. Got tîfingekê bidin min. Me got belê. Go rabin herin şikeftêkê hespê xwe bihewînin.

Seyidxan jî hat, em çûn ser şikeftê, me hespên xwe kêşandin ser bîrê. Me nivê hespan avdan, nivî ma, me dît deh suwar esker jê derket û hatin. Seyidxan got xwe sil mekin⁴³ bila bêjin em esker in.

Hatin li biniya me peya bûn, suwarekî şandin nava me. Me got ka werin, hûn kujan [kîjan] alayî ne. Suwar ajot hat, me tifingên xwe rast kirin, me berda, ew suwar ket. Me her nehê din jî girtin. Yek dibê[je] ez Kurd im, yek [dibêje] ez xwarzîyê Kurdan im.

Me deh hesp, deh tifing û tomatîkek stand. Seyidxan got em [bi me] hesiyan. Em suwar bûn, me hêsîr berda. Em saetek çûn, me dît 200 suwarî tên. Me drêj kir esker bazda. Seyidxan xeyidî, go dora me Qolordû ye.

Me ajot li rêya xwe. Tirk hatina me hesiyabûn, ji her alî esker anîbûn ko em derbasê xetê mebin.

Em rastî esker hatin. Me hicûm da, li hev xist. Em jî esker, ew jî esker, êdî em bûbûn tevî hev. Me li her alî holê dixist, heta bû tarî. Me pênc hespên din jî standin.

Em ji esker veqetiyen. Em diçûn, em bi serî ve hatin ser esker, di pêşiya me de bû. Me lê vegerand.

Seyidxan ket. Piştî Mêrdînê. Sileyman birûj ketibû.

Di wan pevçûnan de Sileyman gava em di nav newalekê de bûn, her du alî esker, me rikêb dikir, Sileyman birîndar bû ket. Me anî da ber sihekê, nexwest ko kes pê re bimîne, got di vegeerê de ko rê li vê[derê] ket li ser min de werin. Şer bû, em dûr ketin, ji esker veqetiyen.

Di pêşiya me de esker hebû. Ji nişka ve li me xistin, hespek ket, suwarê wî pêya ma; heval lê venedigeriyan. Seyidxan got vegeerin, kes[î] guh neda. Seyidxan bi ser wî de vegeeriya. Paş mîdek [muddetek] Tewfîq dît hespê Seyidxan vala têt, vegeeriyan, dîtin Seyidxan li erdê ye.

Anîn cihê wî çêkirin, di nav dehlekî de. Lewra ko nedikaribî li piştî Şêxo jî bisekine. Du zilam pê re hiştin.

Beledê me revî. Em di ber girekî peya bûn, heta bû sibe. Me yek dît, tifingek da jê re, em anîn taniştî Reşmilê [Rişmilê].

Bi mexrebê em ketin beriyê, em hatin gundekî. Li gund esker hatin pêşiya me, me li hev xist, sê hespên me kuştin. Em lê vegeeriyan me yek kuşt, yek birîndar bû, reviyen. Em hatin rêya hesinê. Me digot ew rêhesinê Mêrdînê ye. Em du saet, ji xetê du saet berjêr hatin, şivanek rastî me hat. Me pirsî, got hon ji xetê derbas bûne. Go ...⁴⁴ Xidir Axa me. Em çûn mala Îsa. Brayê Îsa çû Qamişlî elam bide misteşar.

[Ji devê] Mistefa kurê Derwîş ji mala Seydo [hatiye nivîsîn], emrê wî 19 salî.

Em hatin şatê Diyarbekr, me qemyonek girt, neyar hat ser me. Me bi tîfengan lêxist. Em hatin, xelkê Kurdmanç çete bûn, hatin pêşiya me. Seyidxan got em brayên hev in, talana kesî li pêşiya me nîne. Dînê Mihemed e, hon çawan li me xin? Mêrikan got ji we re oxir be.

Wê şevê em pê de hatin dora Mêrdînê. Teyarê elam dabû Diyarbekrê. Bi qemyonan Tirko esker şandin.

Bû sibe, em hatin. Taştê bû, me li [çikî] hespên xwe av didan, me bala xwe da 10-12 esker di wê de hatin. Me çekên [kincên] xwe guhart, çekên eskerî li xwe kir û pê de sekinîn. Çawîş pêş de hat. Me go "gel gel".

Hat nik me, [me] go "teslîm", nebû, me kuşt. Eskerên dî me tev hêsîr girt. Me hêsîr berda, tomatîk jî me ji wan stand.

Êdî em hatin, tîfingên wan, hespên wan me anîn. Esker hatin ser me, me [li] hev xist heta bû mexreb. Saetek li roj mabû berik li devê min ket.

Ez, Sidiq û Miheme em bi hev re bûn. Em bi tinê mabûn. Hevalên min ez suwar kirim, me qesda çiyê kir, Çiyayê Dêrikê. Wê şevê [em] çûn Ewrîxan.

Li Ewrîxanê dest avêtin me, girtin. Miheme girtin, min û Sidiq me bazda. Tîfing li me xistin, Sidiq birîndar bû. Ez revîm, xelas bûm.

Wê şevê pê de hatim. Ez hatim gundekî. Rexta min li piştê min bû, tîfing û şeşderba min bi Sidiq re bûn. Min dî du xort hatin, ji min re gotin rext li piştê te ye, ka tîfinga te?

– Tîfinga min nîne.

Deyn [deng] nekirin. Rexta min, pere, şarê min standin. Min rêya xetê pirsî, nîşa min dan. Mehîna min nebirin.

Heta ko ez hatim wî gundî çar rûj ketibûn navê. Ez tihn û birçî bûm. Wê şevê ez pê de hatim. Sibê zelal bû ez giham gundê Çelebî.⁴⁵ Ez hatim derê malekê min av xwest. Du sê xort hatin dizgînên mehîna min kişandin. Ez dûwê mehîna xwe çûm. Ez jî xistim koxekê. Yekî din hebû, ew jî mezinê gund e. Min got ez braziyê Seyidxan im. Got heke Çelebî nayê [neyê], pênehese ez[ê] te derbasê xetê kim.

Çelebî pê hesiya, Çelebî hat ez birim qulikê [qulixê], ez teslîm kirim.

Telefon dan Mêrdînê, gotin bînin. Du zebûye dan min, ez suwar kirim, me da rê.

Em hatin gundekî, min av xwest; bîrek hebû, jinek û mêrek li ser bûn, min av ji jinekê xwest, esker nehişt ez av bixwim, li min xistin. Min jî mehîna xwe berda. Tîfing li min berdan, heta ez ji ber çavên wan winda bûm. Mehîna min birîndar

kirin. Min mehîna xwe hişt. Min xwe veşart.

Hatin mehîn dîtîn, geriyan negeriyân heta êvarê ez nedîtîm, çûn.

Wê şevê ez zivîrîm, min berê xwe da xetê.

Şivanekî ez girtim, go ez[ê] te teslîmê qereqolê bikim. Zêr bi min re hebû, min zêrê xwe da şivên, ez berdâm.

Ez hatim, min bala xwe da, pêşiya min qurmînê (?) tîfingan e. Esker[ê] ko ez ji ber revîm bi dar ve kirin.

Wê şevê di fatosa⁴⁶ genim de ez mam. Heft rûj ketine navê.

Sibê zelal bû. Ez ji germê qijqijîm.⁴⁷ Bû mexreb, heta sibê, taştîyê çûm, min xwe gihand xetê. Ez hatim Qermanê. Qermaniyân li min xweyitî kirin. Tewfîq hate li [ba] min û ez anîm Gundorê.⁴⁸

Beşek ji notên jêrîn di nivîsa Celadet Alî Bedirxan de hene, hin not jî M. Malmîsanîj (M. M.) lê zêde kirine.

¹ Celadet Alî Bedirxan li hemberî van navan bi qelemêke din ev nav jî nivîsandine: Seyidan, Bilikan, Şêxikan, Qerecan. (M. M.)

² **Dara Hovo** zozanê Seyidan e. Li ser çiyayê Kosorê ye (axa wê sor e, xwelîsor). Kosor di nav Bilanixê û Deşta Mûşê de ye.

³ Herçîqas Celadet Alî Bedirxan di ciyê "Qazgol" de "Kazgol" nivîsiye jî bi qasî ku tê fêmkirin bi şaşî wisa nivîsandîye. Min di ciyê "Kazgol" de "Qazgol" nivîsî. (M. M.)

⁴ Herçîqas Celadet Alî Bedirxan di ciyê "qaz" de "kaz" nivîsiye jî bi qasî ku tê fêmkirin bi şaşî wisa nivîsandîye. Min di ciyê "kaz" de "qaz" nivîsî. (M. M.)

⁵ karar verdiler

⁶ **sûzen bûn**: Di rengê mêrikî de ez sûzen bûm (şüphelendim).

Me'nyên her sê kelîmeyên jêrîn Celadet Alî Bedirxan tenê bi Frensî nivîsandibûn, yê Tirkî min lê zêde kirin. (M. M.)

sûzen: méfie [şüpheli, kuşkulu, güvensiz]

sûzenî: méfiance [kuşku, güvensizlik]

sûzen bûn: se méfier [-den kuşkulanmak, -e güvenmemek]

⁷ Celadet Bedirxan ev cumla "Serê teboxê bû gava derketin" li kêleka rûpelî nivîsandîye. Kelîma "em" -di nava parantezan de- min lê zêde kir. (M. M.)

⁸ **Xwedê agahî**: Allah bilir.

⁹ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

¹⁰ Li jorê ev nav wisa hatibû nivîsîn: "Bilanûx" (M. M.)

¹¹ Wextê warê serhedî bû./hasat zamanî

¹² Di destnivîsa Celadet Alî Bedirxan de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: reber. (M. M.)

¹³ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

¹⁴ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

¹⁵ Di destnivîsa Celadet Alî Bedirxan de ev nav wek "Ferhenlî" hatiye nivîsîn lê navê vî gundî "Ferhend" e, ne "Ferhenlî". (M. M.)

¹⁶ Celadet Alî Bedirxan di ciyê Hezro de bi şaşî Xezro nivîsiye. Her di wî rûpelî de cara duduyan Xezro nivîsiye, lê paşê ya duduyan îptal kiriye û Hezro nivîsiye. (M. M.)

¹⁷ Paşnavê malbata Hisên Axa û Hesen Axa îro Azîzoğlu ye. (M. M.)

¹⁸ Mil neda ber me.

¹⁹ Celadet Alî Bedirxan li hember kelîma Hondrof paşê nivîsiye Hundif. (M. M.)

²⁰ **kurşe** (m): üzerine yağmur yağmış donmuş kar

²¹ **gîhar** (n)/diyar

²² Li vir du kelîme nehatin xwendin. (M. M.)

²³ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

²⁴ Li jorê ev nav wisa hatibû nivîsîn: Hemê Helo. (M. M.)

²⁵ **agir dadan**: ateş yakmak

²⁶ **Gûlik**: Jê şîrêz çêdibe.

²⁷ **zuxir**: cihê newal û asê

²⁸ Li jorê ev nav wisa hatibû nivîsîn: Pîrqaşênê. (M. M.)

²⁹ Ev kelîme di vê nivîsê de gelek caran wisa jî hatiye nivîsîn: got. (M. M.)

³⁰ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

³¹ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

³² **çiq** (çiç): Av dibe du bir, her bir çiçekî ye. Ev erd ko tê dimîne kelebest dibêjin.

³³ Paşnavê malbata Zekî Beg, Öztürk e. (M. M.)

³⁴ Di wî rûpelê nivîsa Celadet de ev not heye: "brayê wan ê mezin Bavê Mistefa". (M. M.)

³⁵ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

³⁶ di ... re

ber ... re

³⁷ Celadet Alî Bedirxan piştî vê kelîmeyê wisa nivîsandiyê: (m).

Yanî Celadet xwestiyê nişan bide ku ev kelîme (ket) mê ye (fêminin e). (M. M.)

ket (m): yonca

³⁸ Li jorê ev nav wisa hatibû nivîsîn: Hêkan. (M. M.)

³⁹ Li jorê ev kelîme wisa hatibû nivîsîn: rûj. (M. M.)

⁴⁰ **rûbar** (rûbarê wî/wî alîyê): yamaç [bi Tirkî]; versant [bi Frensi]

⁴¹ **me serî da ser**/me berdaye

Eskerê Tirko serî daye ser hev dikişîne ber bi me tên.

⁴² Ev kelîme di vê nivîsê de gelek caran wisa hatiye nivîsîn: hûn. (M. M.)

⁴³ **Xwe sil mekin**: Kendinizi bozmayın.

⁴⁴ Li vir kelîmeyek nehat xwendin. (M. M.)

⁴⁵ Celadet Alî Bedirxan, li kêleka navê Çelebî wisa nivîsandiyê: "Evdilkerîm."

Dîsa di vê notê de wisa nivîsiye: "Ev Çelebî kurê Evdîrezaq Çelebî Şêxten [Şatana] ye." (M. M.)

⁴⁶ fatos/gidîş

⁴⁷ **qijirîn/qijqijîn**: güneşten yanmak

rewisîn

rewisandin: ateşte ütölemek

kizirandin

⁴⁸ Li kêleka hin rûpelan, Celadet Alî Bedirxan hin gotin nivîsandine ku têkiliya wan bi vê nivîsê re tune. Ez wan jî li gor rêza elfabeyê dinivîsim. (M. M.)

Birîna me di bin potê me de ye. (medhelûk)
Mirov parsûwa xwe raberê herkesê nakê.

Rêzika Kurdan: 1-ziman 2-çek 3-eşîrî 4-stran 5-govend
Rêzika wî li dûw dihere. Mîr mirovekî xwedan rêzik e.

[Ferhengok]

[**ji hev de xistin**]/ji hev de xistibûn: parça parça etmek

kox: süprüntülük

koxik: kütmes

lorx (m): kar ile karışık çamur

penc kirin: urmalamak

teqîn/teqn (m): bataklık

xeberdox: porte-parole [sözcü]

xwarinî: provision, des vivres [yiyecekler, azık]

zik çêrandin: otlaklık etmek. (Em zebtîyeyên Mûşê ne, zikên xwe biçêrinin.)

Celadet Alî Bedirxan me'nyên kelîmeyên "xeberdox" û "xwarinî" tenê bi Frensi nivîsandibûn, me'nyên wan ên Tirkî min lê zêde kirin. (M. M.)

Îsmê xas [Navê kesan]

Barano, Behrem, Behrûz, Bengî, Beybûd/Baybûd, Bêzar, Cangîr, Cengo, Cocê, Delo, Dilo, Dilşa, Dîlo, Edê, Efo, Êlo, Felemêz, Ferfûrê, Ferman, Ferê, Fêrik, Gefo, Gulîzer, Gulperî, Gurgîn, Hodo, Kewê, Kilê, Kono, Kotê, Lezgîn, Miskê, Nezîr, Nîgar, Otê, Perîzad, Qeşew, Rindê, Senem, Serdil, Sertîp, Seyrê, Seyro, Siyabend, Şayiste, Şeno, Şero, Şewêş, Şîno, Şîrvan, Têlî, Têlo, Tito, Toro, Xirtê, Xoxê, Zelêx, Zinar, Zizê.

SEYÎDXAN

(...) Seyîdxan bi sê denga gazî dîke li 'Elîcanê Gerdengazî, li Tofîq, li Silhedîn, divêje: "Bav û birayê min bûno, mêr bin, mêrî çê bin, îro roja mêra ye, ezê temînekê li we bikim, temîna apê xwe meşkênin, esker mekujin, êtîm in, xerîb in, zarûê xelqê ne, binemir in, gunê ne; bikujin zapir û qumandarê Cumhûriyetê 'edûê dîn in, ez Bavê Silhedîn im, di nava min û wan da Ava Mûradê, hidûdê 'Ecem e."

Axayê mino, şerr e, li ser min şerr e,
Bê, welle, milletê Kurda bêbext e, ji Seyîdxan nagerre.

Divê, Kopê bişewite li ser devê rê ye,
Kambax bibe, li ser devê rê ye,
Mala mi bi xulama Sedîq Beg û Mûsa Beg,
Ev herdu bûne reyîsê çeta hukûmetêye,
Çil pênc suarê Sîpîka û Cibra hiltînin, têne ba midûrê Kopêye,
Dibê: "Lo lo midûro, agir xênîyê bavê te keto, dinîya xirab bibe tu bi dinîyayê nahesî, ez îro reyîsê çeta hukûmetê me, cûaba Seyîdxanê Kerr, Bawê Seydo, ji mi ra hatîye, derketîye serê çiyêye. Bûye firar û eşqîya, mehkûmê dewletê ye. Sed û pêncî sûarê xezabê pê ra ye, di 'erdê Şêx û Weyîsqiran da digerre, li ce' da Birlîsê gazmax dibe, ê bê li dora Kopê da bibuhure, ê Ava Mûradê biqelibe, ê bi devê madoliya xwe bavêje nava Firansa, binîya xetêye."

Dibê, ew herdu begê Patnosê ji midûrê Kopê ra sê kevira hiltînin ji 'erdêye,
Jê ra datînin ser masêye,
Jê ra sond dixun bi telaqê jinberdanêye,
Destê xwe datînin ser Qura' nê, dibên: "Heta Seyîdxan, 'Elîcan, Tofîq, Silhedîn -her çar serekdarê mehkûma- em li dora Kopê da nekujin, qaçaxê dewletê di ser me ra derbaz nabe vêderêye."

(...) Axao, dibê, Sedîqê Mistefa Beg dengêkî gazî dîke Tofîqê birayê Seyîdxan,
Dibê: "Xebera te ji devê xwe gotîye, bixoyê, hêja bişêkirîne".
Destê xwe davêje şerşerpe, ji qewlixê dertîne,
Şerjorê şerşerpe li qûna şerşerpe dixîne,
Ew û Tofîqê birayê Seyîdxan, weke du beranê pezkûvîya ji ber hev vedikşin,

Di devê dergê da di hev dixerricin,
 Weke du gurê har li hev digerrin,
 Li pişta mala li hev fitilîn,
 Herdu li ba karka sergîna li hev rast hatin,
 Gulle bi gulle pêşîra hev da danîn.
 Demaçê Sedîqê Mistefa Beg qelp bû, şerjor sûar kir, tişteke derneanî,
 Tofiqê birayê Seyîdxan qalpaxê mejîyê wî rête ser cote gîzmê wî bi mêranî,
 Madolî ji milê wî anî xarê, demaçê ji destê wî deranî,
 Çar pihîn bi pe' nîya gîzma xwe li ser textika 'enîya wî danî.
 Go: "Ez fexê Üsivê Seydo me, ji deşta Mûşê, Çemê Binanixê, çiyayê Serhedê,
 zapit û qumandara ez ji Romê diqelînim. Ezê gelek kûçkê weke te, li pêşîya xwe
 binim rayê".

Seyîdxan divê divê: "Ev yek bûye, bila nebe didu. Pêşîya firar û qaçaxê min
 berdîn bila bi silametî herre."

Şerrekî dibe li hewşa midûrê Kopê, li qûna Çiyayê Girîdaxê, bi du cîya,
 Bi tarîbara sibê ra li ser serê van mehkûma teyara difirîya,
 Hurmînê topa, lig-ligê axirmakîna, agirê mecnenîqa ji 'erdê heta 'ezmana li ser
 serê wan hêsîra dirrijîya,
 Gele şede-şûdê 'Elîcanê Gerdengaz, babê babê 'egîte çiyayê Serhedê hene,
 Xwe ji heval û hogirê xwe didize, xwe bi kozika Mûsa-Beg û midûrê Kopê
 digihîne,
 Devê çapilîyê li ser pişta wan di'edlîne,
 Çar tîlîya kezeba reş bi devê çapilîya xwe va dertîne,
 Heyfa hêsîr û feqîrê Gelîyê Zîla ji hersîya hiltîne. (...)

* Çavkanî: Zargotina Kurda-I, Yên ku berhevkirine: Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl,
 Neşîrxana "Naûka", Moskova, 1978, r. 261-264

TELGRAFEKE JÎNÊN KURD

24. 7. 1930

M. Malmîsanij

Hukûmeta Îraqê, di destpêka sala 1930'yî de îlan kir ku zimanê Kurdî li herêmên Kurdan wek zimanê resmî qebûl bike. Lê di Temmûza 1930'yî de peymanê Îngilîz û Îraqê belav (neşr) bû û di vê peymanê de derheqê mafên Kurdan de tu madde tunebû. Li ser vê yekê Kurdan ev tişt protesto kirine û ji meqamên cihê-cihê re telgraf şandine. Hin jinên Kurd jî di 24'ê Temmûza 1930'yî de ji Serokê Konseya Wezîrên Îraqê re û ji redaksiyonên Baghdad Times, El-'Aleme'l-'Erebî, El-Bîlad û El-Îraqê re telgrefek şandine. Piştî şandina vê telgrafê û yê din, Wezîrê Karên Derve yê Îraqê bi telgrefekê bersiv dide* û di vê bersivê de dibêje ku mafên Kurdan li gor qanûna esasî tên parastin.

Ev telgrafa jinan, yek ji belgeyên xebata tarîxî ya jinên Kurd e. Em wê ji Frensî wedigerinin û li vir pêşkêş dikin:

24 Temmûz 1930

Serokê Konseya Wezîran

Redaksiyonên Baghdad Times, El-'Aleme'l-'Erebî, El-Bîlad, El-Îraq

Bexdad

Em jinên Kurd, bi hemî hêza xwe dixwazin ku ji maf û îmtiyazên ku Koma Netewan (La Société des Nations) jibo Kurdistanê qebûl kirine re hurmet bête kirin.

* Jibo metnên van her du telgrafan binêre: Docteur Bletch Chirguh, Appel des kurdes du Sud à la Société des Nations, Paris, 1931, s. 45.

NOTÊN ROJANE*

(1922-1925)

Celadet Alî Bedirxan

Munîx, 12'yê Adara 1923'yan

Min mala xwe bir Galerie Str[asse]. Te rewşa odê bidîta. Birastî sefaletxane [ye]. Pencera xaniyê tune, tiştêkî wisa kesî nedîtiye. Tu nabêjî ev ode li kêleka metbexê kilerek bûye, vê dawiyê kirine ode. Qaryolayeke wê ya piçûk heye. Di odê de meriv nikane xwe bilivîne. Hele tew îmkân û ihtimal tune ku meriv fêm bike şefeqê lê daye yan na. Çunkî di odê de şeveke dirêj a bêdawî hakim e.

Munîx, 13'yê Adara 1923'yan

Îro em çûn unîversîteyê û me îstîdayên (dîlekçeyên) xwe dan. Li Pasingê min fabrîkayeke aletên kiştûkalê (zîra'etê) ziyaret kir.

Munîx, 3'yê Tebaxa 1923'yan

Îşev bi berdewamî bi xewnên bêma'neyên ku wek ez xwedî serwetên gelek zêde bim, nerehet bûm, paşê se'et di sisiyan de şiyar bûm û min hew xew kir. Min ji vê fersendê îstifade kir û ez bi bisîkletê derketim gerriyam. Ez ber bi Grünwaldê çûm. Se'et di heştan de vegerriyam malê.

Dolarek gihişt 1 400 000 markî. Rewş bi giştî û bi taybetî zehf xirab e.

* Ev not ji vê kitêbê hatin wergerandin: Celadet Ali Bedirhan Günlük Notlar (1922-1925), Stockholm, 1995

Niha fiyatên tiştan, bi taybetî bi mudaxeleya hukûmatê yekcar tên guhertin, lê dîsa jî Munîx ji Îstebolê bihatir e. Bi taybetî bihayê kinc-mincan afetek e. Di mesela aborî de em gihîştin ciyê herî nazik.

Tenê tiştekan ma ku bê kirin, ew jî kêmkirina xwarinê ye. Ez ji berê ve bi xwediyan xênî re xwarinê dixwim. Di xwarinan de carna perçeyeke goşt û carna jî yek ...¹ kotler ...² heye. Çend roj e min qerar daye ku ez beşdarî beşê goştê xwarinê nebim. Lê jiber ku min nexwest ez ewqas bêperemayîna xwe ji xwediyan xênî re bibêjim, ez tedbîrekê fikirîm û piştî ku min çend roj ji êşa gurçikê şikayet kir, îro nîvro gava ku ez ji unîversîteyê vegerriyam min got ku min xwe bi doktor daye mu'ayenekirin, li gor doktorî gurçika min piçekî werimiyê, wî ji min re tewsiye kiriye ku ez ji xwarinan tenê sewziyan (sebzeyan) bixwim û ji min re xwarina goştî qedexe kiriye. Bi vî hawî me dev ji goştê jî berda. Digel viya jî qet ne xema min e. Tenê bila zikê pîs tije be, bes e. Ji cixareyan ku min berê erzan kirrîbûn jî nêzî çel hebî hene. Pakêteke piçûk titûna min a qelûnê jî heye. Lê bi vexwarinê (îçkiyê) re têkilîya min rune. Halbuki tam dema vexwarinê (vexwarinê îçkiyê) û serxweşbûnê ye.

Dewranê em bo mezarê firotin.

Munîx, 20'ê Gulana 1925'an

Vê êvarê bi trêna 7. 25'an a şevê, tevî Heqqî³ em ji Munîxê ber bi Triyesteyê [Triesteyê]⁴ bi rê ketin. Se'et di 10. 45'an de em gihîştin Zalçburgê [Salzburgê].⁵ Pasaport di trêne de hatin kontrolkirin. Tişt[ên din] tew kontrol jî nekirin. Em ji sînore Îtalyayê jî -ji ber ku em dê biçûna Qahîreyê- her bi wê hêsaniyê derbaz bûn.

Yê ku ji Tirkî wergerandiyê: M. Malmîsanij

¹ Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

² Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

³ **Heqqî (Hakki):** Kurrê Sureyya Bedirxan e.

⁴ **Triyeste [Trieste]:** Bajarekî Îtalyayê ye.

⁵ **Salzburg:** Bajarekî Awusturyayê ye.

BAJARÊ TE DÎL E

Kekê XÊLÎT

Tariya şevê bi xwe re xof anî
Di mîlada bindestiyê de bahoza dîrokê dest pêkir
hespê xwe bezand
Ax naliya
Stûyê nergîzan şkestin
ask birîndarên niha
Ala ketin yek bi yek
Tîrsê kolan radest girtin
Xîretê xwe sparte çîyan

Asûman xwe bi ewrên reş ve nuxumandiyê
Bajarê te dîl e êdî
Tîreke berdewam e di dilê zaran de
jana bindestiyê
Kontra nin mêvanên xewnên wan.

HÊVIYA TE TUNE

Kekê XÊLÎT

Demê pîva
Qulipîn rûpelên xwînê yek bi yek
Alava jiyane qîmitand xeyalên zaroktiya te.
Rûbarên te miçiqîne
Ew êdî ber bi deryayan nahekin
Te xeyal parve nekirin bi zaroyan re
Çilmisîn kulîlkên bihara te

Hêviya te tune
Rojê te tune
Bihara hemûyan hat
Bes berf cemidî
ma
Qeşa neheliya li ser dilê te.

STARA HÊVIYÊ

Kekê XÊLÎT

Li welatê xerîbiyê
Li peravên zerya xeyalan
Ez bihara xwe û te fikirîm
Tu girayî
Bû payîz
Belgên daran bi ser min de bariyan
Sor û gevez kir ava zeryayê.

Li welatê xerîbiyê
Ez bihara xwe û te fikirîm
Tu ji min bi dûr ketî
Dest pê kir zivistanekê
Kuliyên berfê bi ser min de bariyan
Û bi hawirdor ket agirê dojhê.
Ez qefilîm
Ez şewitîm
Rêyeke din tunebû
Li ser şopa awirên te
Min xwe sparte stara hêviyê.

ZAR

Kekê XÊLÎT

Dilê min hespekî seklawî bû
Hêza baweriya min vekir deriyên zîndanan
Di difnên hespên seklawî de bihna zaroktiya min
Ber bi mêrgên azadiyan beziyam
 beziyam
 beziyam.

Dest pêkirin
di destpêka serpayîzekê de
wêneyên ji çîrokên zaroktiya min
bi ser hespê seklawî de bariyan.
Mîna dît ku ez hîn zarok im
 dayê
Bi îskîn min dest pêkir ez giriyam

LWÎ Û KERG*

Rocekî rocan ra deweki di hewar kot. Şarê dew¹ pêrû remay. Dew miyan di, ca di mend yo (yew) kerg torî des mirçikanî xu ya. Yîn serû lwîyekî peyda bî zehf vêşan.

Kerg zehf tersa. Lwî ci rî va:

– Ez kenna tu bwêrî tor mirçikanî tu ya.

Kerg ci rî va:

– Vindir heta hot rojî bîn.

Lwî ci rî va:

– Qey çî?

Kerg va:

– Mirçikî min zehf şenik î.

Lwî zanay dew di çoyek çinyo, vengî xu neykerd, şî. Kerg kot teşwîş. Ters ci rî virazîya, dew ra tor mirçikanî xu veciya. Şî aryî, uca di arwançiyin dî. Kerg kerd hewar, ci rî va:

* Hewawo ki Celadet Alî Bedirxan nuseno, yê 1932 di na estaneki yew Kurdê Mukrî ra eşnawita û nuşta, dim a yê na estaneki Mela Nezîr û Muhyeddînî rê wenda, yînî zî tadaya (tercume kerda) Kirdkî (Zazakî). Mela Nezîrî tadaya Kirdkîya Sêwregî, Muhyeddînî zî tadaya Kirdkîya Paloy ser. Hewna hewawo Celadet nuseno yê nê tekstî nawitî (misnay) Şêx Evdirehîmî. Nuştîşê Celadetî ra fam beno ki yê serra 1932 yan zî 1933 di na estaneki nawita Şêx Evdirehîmî û beno ki Şêx Evdirehîmî zî Celadetî rê aw deme na tadaya Kirdkî ser. (Biewnî: Celadet Bedirxan, "Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî", Hêvî, Paris, hûmar: 2, Gulan 1984, r. 77-83).

Ciniya Celadet Bedirxanê rehmetî Rewşen Bedirxani tekstê na estaneki -tadayey Şêx Evdirehîmî- dawo Ş. Se'îdî, yê zî teslîmê Şiyarî kerdo. Mi semedê çapkerdişî no tekst Şiyarî ra girewt. Ez Şiyar û Ş. Se'îdî rê sipas kena. Orjînalê tekstî ebi destê Celadet Alî Bedirxanî ameyo nuştîni. Celadetî verniya tekstî di wina nuştî: "Dumiliya welatê Mirdêsî", "Şêx Evdirehim Efendî". Yanî namey na estaneki (Lwî û Kerg), orjînalê nuştî di çinêbi, mi pa na.

Celadetî aw deme herinda herfa Q di K, herinda K di Q nuştî. Ma vajî herinda "kerg"î di nuştî "qerg". Mi estaneki ebi elfaba Kurdkî ya ewroyini nuştî.

Key Şêx Se'îdînî ra welatperwer û şehîdê erjayey vejîyay, yînî Kurdan rê zaf xizmet kerd, labelê çî heyf ki girdanê nê keyî ra -eke ma yew di mektubanê Şêx Se'îdî nêhesibnî- heta ewro hema hema ki çiyêko nuşte nê mendo. Eke mendo zî mi bi xwi nêdiyo. No tadayey Şêx Evdirehîmî ze îstîsnayêk o, aw semed ra zî hîna erjaye yo.

M. Malmîsanij

– Êrû lwîyek mi r' peyda bî. Mi rî va "Ez ti bwêrî (wena)"². Mi ci rî va "Vindir heta hot rocî bîn". Lwî veng nêkerd û şî. Tu i[n]key bocî û tenzîyan hedre ke heta Apê Lwî yenû.

Arwançî va:

– Zehf hol beno³.

O wext postî lwî neway çetûrî keno⁴. Arwançî zehf pê weş (zerweş)⁵ bi. Xo hazir kerd (hedirna), kerg rî va:

– Ez ini meydan di yo çal bikena, tol bocî û tenzîyan xo tede binimna⁶. Eger Apê Lwî ame, ti yi rêd binê bireqis. Ew tu rî vaco "Hey kergê, kergê, kergê! Ezû tu tor mirçikanî tu biwêrî." Badê ti ci rî vac "Hey Apê Arwançî, bê teber, ti bixo û bocî qendî."

Lwî ame meydan, vendê kerg da. Kerg şî, ci rî va:

– Qabî yi ki ti mi wenî, mi rî weş o ez biney bireqisê.

Lwî va:

– Hol o.

Yi û kerg destî yowbînan gured, kerg ci rî va:

– Mi rî tikê diyêr bik (vac).

Lwî va:

– Hey kergê, kergê, ez i[n]kê tu tor mirçikanî tu ya bwêra.

Kerg va:

– Nobetî min o.

Destî yowbînan gured:

– Ho Apê Arwançî, bê teber, ti bixo û bocî qendî.

Lwî tersa, va:

– Ênû mevac, axir ez tersena.

Qıştayîşî yi tamam bi, Apê Arwançî veciya. Bocî û tenzîyan wexto ki lwî di derhal gured û xeniqna.

Arwançî bi lwî û kerg û mirçikan bî şa.

Tadayox: Şêx Evdîrehîm Efendî

Kurmanckiya kelîmanê Kirdkîyan ê cêrînan Celadet Alî Bedirxanî nuşta:

¹ **dew:** dih

² **wena:** dixum

³ **beno:** dibe

⁴ **erciyeno:** dihêja [hêja ye]

⁵ **zerweş:** dilxweş

⁶ **binimna:** veşêrim

KURD DÎ KITÊBA COGRAFYA YA ÎSTEXRÎ DE

Di nav Ereban de **Cografya**, serê pêşî zanistekê teknîkî bû lê paşî wek **adab** (tarîx, cografya, felsefe) jî derkete holê. Cografya teknîkî jî dibe dû beş:

Yek ya **îdarî** ye ku ji ber van hersê faktorên jêrî derketiye:

- a) Diyarkirina tixûbên împêratoriya Îslamê
- b) Civandina bac û xeraca hatin û berê çandiniyan
- c) Naskirina rê ji bo birin û anîna postê

Cografya adabî jî serê pêşî di salên 800'î de wek beşeke dîrokê bi pênuşa merivên zana, təcîr, hecî, şagirt û xwendevanên ku serpêhatiyên rêwingiya xwe nivîsandine, derketiye meydanê û piştê bûye wek zaniyariyêke nû. Herweha pêwendiyên bi edebiyata biyanî, nemaze bi zanist û filozofiya Yûnanî re û wergerandina wan bo zimanê Erebi hê bêhtir bû alîkar ji bo bi pêşveçûna vê zanista nû.

Çend nav ji wan kesên pêşî û navdar ku berî salên 1000'î bi nivîsandina cografyayê ve rabûne û kêr û zêde di berhemên xwe de qala hin Kurdan û navçeyên wan jî kirine ev in: **Îbn Xurdadbeh** (mirin 885) ku xwediyê berhema **Mesalîk el-Memalîk** e, **El-Yaqûbî** (m. 891) ku xwediyê **Kîtab ul-Buldan** e, **Îbn el-Feqîh** (m. 903), **El-Belxî** (850-934), **Îbn 'Hewqel** (m. 977), **El-Mes'ûdî** (m. 956), **El-Muqeddesî** (m. 988).

Yek ji wan cografyanasan jî **Ebû Îs'haq Îbrahîm ibn Muhemmed el-Farisî el-Îstexrî** yan jî **el-Kerxî** (mirin 957) ye ku li cem Erebi û alema Îslamê yek ji gerrok û cografyanasên pêşî ye û pirr bi nav û deng e. Pirr mixab in ku ne di kitêba wî ya cografyayê ya **Mesalîk el-Memalîk** (Riyên Welatan) de ku di nav rêza "pirtûkxaneyê cografya Ereban" de ji aliyê de Goej ve hatiye weşandin û ne jî di çavkaniyên din de, tu agahdarî li ser jiyana wî tine yan jî wek ku li jorê jî bihûrî bi tenê nav û cihê çêbûna wî hene. Çendî ku ew di çavkaniyên cuda de bi bal deverên cihê ve hatiye nisbetdan

ji, lê li gor pirraniya wan çavkaniyan ew Faris e û li cem Yaqût el-'Hemawî ew ji Îstexrê ye. Îstexr bi xwe bajarekî kevn e ku dikeve başûrê rojavayê Îranê û ji heyamê Sasaniyan heyani dema avakirina Şîrazê di wextê vegirtinên îslamê de, navendeke olî (dîni) bûye. Hinek, bi taybetî ji Ibn 'Hewqel ku têkiliyên wî yekser bi Îstexrî re hebûne, wî bi nasnavê el-Farisî dide nasîn, lê el-Muqeddesî wî bi el-Kerxî dide nasîn. Vêca ew binavkirin bi xwe bi mirov dide texmîn kirin ku ew yan ji Xûzîstanê ye yan jî ji Îraqê û ji der û dorên Bexdadê ye.

Berhema Îstexrî ya bi navê Mesalik el-Memalik, mîna çapeke nû ya kitêba Ebû Zeyd el-Belxî, Suwer el-Eqalîm e. Ibn 'Hewqel, li ser daxwaziya Îstexrî ya sala 951-952'yan jê (Ibn 'Hewqel), ji nû ve ew li hev rastkiriye, hinek guhertin tê de çêkirine û kiriyê bingeh ji bo berhema xwe ya Suwer el-Erd ku bi navê Mesalik el-Memalik jî tê nasîn. Ev teksta ku di sala 1839'an de ji aliyê J. H. Moeller ve mîna kopyayêke bi rêk û pêk hatiye weşandin, bi tenê kurtasiya wê kitêbê ye.¹

Di kitêba Îstexrî ya Mesalik el-Memalik de hinek cihên ku qala Kurdan dikirin hebûn, min ew cih jê bijartin û wergerandin Kurmancî. Di vê kitêbê de hin jêrenotên ku ji çapên (nuxxe) cuda hatine girtin û bi serê navên wan çapan mîna "A.", "B.", "C.", "D." û "E." hatine nivîsandin, hene. Hinek not jî ji berhemên "Yaqût el-'Hemawî", "Ibn 'Hewqel", "Muqeddesî" û yên din ku di wan de hin nav bi awayekî cihê derbas dibin, hatine girtin. Min li gor têgihîştina xwe ew cudahiyên ku di wan jêrenotan de hene wergerandin, lê ewên ku bi zimanê Latînî ne û min ew fam nekirin, min newergerandin.

Emîn Narozi

JÎ MESALÎK EL-MEMALÎK A EL-ÎSTEXRÎ

WELATÊ FARS

Fars ji rojhilat ve heya tixûbê Kermanê, ji rojava ve herêmên Xûzîstan û Îsfehanê, ji hêla bakur ve ew çola navbera Fars, Xorasan û hinek sînoren Îsfehanê û ji başûr ve ji heyani deryaya Fars tev di xwe de digire. Xerîteya [welatê] Fars, ji goşeyê Îsfehan û Kermanê ku digihîje berryê û ji hidûdê wê yê ber deryayê ku ji serî heya dawî bi tenê fetlanokeke hindik tê de heye, pê ve çarguşe. Sedemê tengiya wî goşeyê navbera Kerman û Îsfehanê² hindikbûna meda (mesafeya) navbera Şîrazê (ku di nivê welatê Fars de ye) û Îsfehan û Kermanê ye. Çiku ew bi qasî nivê meda navbera

Şîraz û Xûzîstanê û nivê ya navbera Şîraz û geliyên Kermanê ye.

Min xeriteya welatê Fars bi sînoren wê ve çêkiriye lê ji ber pirrbûn û belawelayiya qezayên wê min ew tê de nişan nedane. Herweha min çiya jî tê de diyar nekirine, çimkî li Fars tu bajarên bêçiya nînin,³ yan jî xeyn ji çend heban tu çiya di her bajarî de dibîni. Min bi tenê ew bajarên ku nav û dengên wan belabûne û xwedî mînber in di xeriteyê de nişan dane (mînber di camiyê de ew cihê ku roja îne xutbe li ser tê xwendin, e; mebest jê ew bajarên mezin ku camiyên wan bi mînber in, e – E. N.). Di kitêbê de min ew bi awayekî wusa nivîsandin ku bi destûra Yezdan, xwendevan dê cihê her wîlayet, qeza û bajarên tê de nas bikin.

Ev, behsa wan herêm, bajêr, **remm**,⁴ navçe, kele, **biyût en-nîran** (kûreyên agir), çem û deryayên nav Fars in. Herêmen Fars pênc heb in: Ji nav wan ya herî fireh, xwedî bajarên pîrr û xwedî navçeyên herî zahf herêma **Îstexrê** ye û bajarê **Îstexrê** mezintirîn bajarê vê herême ye. Di mezinayiyê de li pey wê, wîlayeta **Erdeşîr-Xurre**⁵ tê ku serbajarê wê **Cûr** e û **Qubaz-Xurre**⁶ jî dikeve ber vê herêmê. Li herêma **Erdeşîr-Xurre** hinek bajarên mîna **Şîraz** û **Sîrafê** ku ji **Cûr**ê mezintir in jî hene, lê ji ber ku **Erdeşîr-Xurre** bi xwe **Cûr** ava kiribû û kiribû cihê serokatiya xwe, ta niha jî ew navend û serbajarê wê herêmê maye. Bes **Şîraz** ku navenda temamê Fars e û defterên qeyd û îdarê tev li wir in jî, bajarekî nû yê dema Îslamê ye. Li gor mezinayiyê li pey **Erdeşîr-Xurre** herêma **Darabecird** tê. **Darabecird** serbajêrê wê ye, lê **Fesa** bajarê mezintirîn û herî ava ye; ji ber ku herêm li ser navê şah **Dara** ye û wî ev bajar ava kiriye navend **Darabecird** maye. Di mezinayiyê de li pey vê, herêma **Errecanê** tê ku bajarê wê yê mizintirîn **Errecan** e û di vê herêmê de jê mezintir bajar nînin. Li pey wê jî di mezinayiyê de, herêma **Sabûrê** [**Şapûrê**] tê ku piçûktirîn herêma Fars e. Serbajarê wê **Sabûr** e, lê li vê herêmyê bajarên ji **Sabûrê** mezintir jî hene, mîna **Nûbencan** (en-Nûbencan)⁷ û **Kazerûnê**, lê ji ber ku ew li ser navê şah **Sabûr** [**Şapûr**] e û wî ew der [herêm] ava kiriye hê jî navend ew e.

Remmên⁸ wê [Fars] jî pênc heb in: a mezintirîn ji wan remma **Cîleweyh**⁹ e ku bi navê remma **ez-Zemîcan**¹⁰ jî tê naskirin. Piştî ya ku di mezinayiyê de li pey wê tê remma **Ehmedê kurrê Leys** (Ehmed ibn el-Leys) e ku bi navê **el-Lewalîcan**¹¹ jî tê nasîn. Li pey wê jî li gor mezinayiyê remma **Huseyn**¹² **ibn Salih** (Huseynê kurrê Salih) e ku bi navê remma **Dîwanê** (ed-Dîwan)¹³ jî tê nasîn. Piştî remma **Şehriyar**¹⁴ a ku bi navê remma **Bazincanê** (el-Bazincan)¹⁵ jî tê nasîn tê û ew Bazincaniyên ku li ser tixûbê Îsfahanê ne jî ji vê remmê hatine. Û remma **Ehmedê kurrê Hesên**¹⁶ ku bi navê remma **Kariyan** (el-Kariyan)¹⁷ jî tê nasîn; ev remm ya **Erdeşîr** e. Heçî bavikên **Kurdan** in, bêguman ew zêdeyî ber hukmê jimartinê ne, lê tê gotin ku ew li tevahiya Fars ji pêncsed hezar konî zêdetir in. Wek edetê Ereban ew havîn û zivistan li zozeçêrê digerin. Ji her maleke wan tevî xwedî, serkar, şivan û xizmetkaran ji yekî heyanî bigihîje deh mêran derdikevin. Digel ku ji wan defterên xêratan pê ve eseyiya hejmar û bavikên wan ji cihekî din nayên derxistin jî dîsa ez ê li pêş, navê bavikên wan [Kurdan] ên ku gihîştine cem min binivîsim.¹⁸

(.....)

Di her remmeke wê de bajarek û hinek gundên ku li dora wî bajarî kombûne, hene û her serokek ji yên Kurdan dayoxê (kefilê) bac û xeraca herêmek ji wan herêman e. Wan ji bo parastina rê, qefleyên kerwanan û ji bo belayên ku ji Sultan (yanî ji koleyên wî) dihatin, pêwîstiya danîna zilaman li serê riyan dîtibûn. Remma Cîleweyhê ku bi navê Remîcanê jî tê naskirin û dikeve navçeya piştî Îsfehanê, hinek ji aliyekî herêma Îstexrê, hinek jî ji ya Sabûrê [Şapûrê] û hinek jî ji ya Errecanê digre. Tixûbek ji yê wê remmê bi **Beydaê**, yek bi sînorê Îsfehanê, yek jî bi yê Xûzistanê û yê din jî bi navçeya Sabûrê [Şapûrê] diqede. Çi gund û bajarên ku dikevin nav vê navçeyê, ew ji vê remmê ne û rîya wan di ser **Bazincana** qezaya Îsfehanê de ye.¹⁹ Ew, [kesên wê navçeyê] beşek ji wan Bazincaniyên remma Şehriyarê²⁰ ne û di nav wan Bazincaniyên herêma Fars de kesekî ku gund û malên wî yên pîrr tunebin, nîne. Remma Dîwanê (ed-Dîwan) ku bi ya Huseyn²¹ îbn (kurrê) Salîh tê nasîn û li ser herêma Sabûrê [Şapûrê] ye, tixûbekî wê digihîje Erdeşîr-Xurre, lê hersê sînorên din jî di nav herêma Sabûrê [Şapûrê] de dimînin; çî bajar û gundên ku di navbera sînorê wê [heremyê] de ne, giş li ser wê ne.

Remma Lewalîcanê (el-Lewalîcan)²² ku ya Ehmed îbn (kurrê) el-Leys (şêr) e û dikeve ber herêma Erdeşîr-Xurre, tixûbekî wê digihîje deryayê, lê hersiyên din di nav herêma Erdeşîr-Xurre bi xwe de dimînin û ew gund û bajarên ku dikevin navbera tixûbê wê [remmê] li ser wê ne. Tixûbek ji yên remma Kariyan (el-Kariyan) digihîje benda tixûbê **Seffaran** (Benî es-Seffar),²³ yek jî digihîje remma Bazincanê,²⁴ yek jî digihîje sînorên Kermanê û yê din jî digihîje Erdeşîr-Xurre, ji xwe remm bi tevahî jî di nav aqarê Erdeşîr-Xurre de ye.

Bavik û eşîrên Kurdan ku li nav Fars in evên han in:

1. **Kermanî** (el-Kermaniyye)
2. **Ramanî** (Er-Ramaniyye)²⁵
3. **Medser** [yan jî] Mudesser²⁶
4. **Qebileya Muhemmedê kurrê Buşr** (Muhemmed îbn Buşr)
5. **Buqeylî** (el-Buqeyliyye)²⁷
6. **Bendadmehrî** (el-Bendadmehriyye)²⁸
7. **Qebileya Muhemmedê kurrê Îs'haq** (Muhemmed îbn Îs'haq)
8. **Sebahî** (es-Sebahiyîye)
9. **Îs'haqî** (el-Îşaqiyîye)
10. **Ezrekanî** (el-Ezrekaniyye)²⁹
11. **Şehrekî** (eş-Şehrekiyye)³⁰
12. **Tehmadehnî** (et-Tehmadehniyye)³¹
13. **Zebadî** (ez-Zebadiyye)³²
14. **Şehrewî** (eş-Şehrewiyye)³³
15. **Bendadekî** (el-Bendadekiyye)³⁴

16. **Xusrewî** (el- Xusrewiyye)³⁵
17. **Zencî** (ez-Zenciyye)³⁶
18. **Sefrî** (es-Sefriyye)³⁷
19. **Şehyarî** (eş-Şehyariyye)³⁸
20. **Mehrekî** (el-Mehrekiyye)
21. **Mubarekî** (el-Mubarekiyye)
22. **Îştamehrî** (el-Îştamehriyye)³⁹
23. **Şahûnî** (eş-Şahûniyye)⁴⁰
24. **Feratî** (el-Feratiyye)⁴¹
25. **Selmûnî** (es-Selmûniyye)⁴²
26. **Seyrî** (es-Seyriyye)⁴³
27. **Ezadduxtî** (el-Ezadduxtiyye)⁴⁴
28. **Berazduxtî** (el-Berazduxtiyye)⁴⁵
29. **Muttelebî** (el-Muttelebiyye)⁴⁶
30. **Memalî** (el-Memaliyye)⁴⁷
31. **Şahakanî** (eş-Şahakaniyye)⁴⁸
32. **Kectî** (el-Kectiyye)
33. **Celilî** (el-Celiliyye)⁴⁹

Ev in navê wan qebîleyên ku gihane destên me, ji xwe ku ne ji defterên xêratan bin lêkolîna ji bo derxistina hejmara wan bêncam dimîne.

Tê gotin ku ew zêdetirî pênçsed hezar malan in û ji bavikekî wan kêr û zêde ji sedî heya hezar siwarî derdikevin. Ji bilî hindik ji wanên ku li ser hidûdên wan gelî û cihên pirr ser dimînin û bar nakin, ên din hemû havîn û zivistan tev li kozeçêran digerin. Ji ber pirrbûna mêr, dewar û olaqên wan ku hêz û kotekiya wan xurtir dikirin, Sultan bixwestana jî dîsa tirsandina wan jê re zor dihat. Wan îddia dikir ku ew ji cisnê Ereban in; ew xwedî pez û bergîr in jî lê di nav wan de devekêr in. Ji bilî Kurdên Bazincanî ku ber bi sînorê Îsfahanê ve bar kirine, yê din ne xwedî hesp in. Dewarên wan ên bar bi tenê bergîr in û ew [Kurd] bi xwe gelekî halxweş û dewlemend in. Awa û dirbên wan ên qezenc û xebatê û ên gerra li kozeçêran mîna yê qebîleyên Ereb û Turkan⁵⁰ in. Li gor ku tê gotin ew zêdetirî sed bavikî ne lê bi tenê sî û hinek ji wan gihane destên min.⁵¹

(.)

Mezinê heryek ji wan remmên ku ji hezarî heyanî bigihîje sê hezar mêr timî wek leşker li ber derên wan in, ev in:

Sermiyanê remma⁵² **Zemîcanê** (ez-Zemîcan)⁵³ ku bi Cîleweyhê jî tê nasîn, **Mehrecanê kurrê Rûzbeh** (el-Mehrecan îbn Rûzbeh)⁵⁴ bû, ew hê berî Cîleweyh hebû û hêz û merteba wî mezintir bû. Piştî wî birayê wî **Selemeyê kurrê Rûzbeh** bû mezin û hingê Cîleweyh jî ji **Xemîcana** xwarî ya herêma Îstexrê hate wir û kete xizmeta Seleme. Dema ku Seleme mir Cîleweyh dest danî ser remmê, wî rewşa wê

baştir kir ta ku remm heya iro jî li ser navê wî maye. Hêza wî [Cîleweyh] wer xurt bû ku êrîşî ser malbata **Ebû Dulef** kir û birayê wî **Me'qelê kurrê Îsa** kuşt. Piştî Ebû Dulef avête ser wî, ew kuşt û serê wî bi xwe re bir. Ew [serê wî] hayanî dema ku desthilatdariya wan qediya jî timî di cengan de li ser rimekê bi wan re bû. Gava **'Emrê kurrê Leys** li **Zerqanê** (ez-Zerqan)⁵⁵ zora **Ehmedê kurê 'Ebdulezîz** ('Ehmed ibn 'Ebd el-'Ezîz) bir, ew qoqê [Cîleweyh] ku hingê bi zîv hatibû dagirtin jî kete destê wî û wî ew şikand. Mezinayiya vê remmê heya roja iro jî di destê zarûyên Cîleweyh de ye.

Mezinê remma **Dîwanê** (ed-Dîwan), **Ezdamerd ibn** (kurrê) **Kûşhazê**⁵⁶ Kurd e. Ew der pêlekê di destê wî de ma, lê piştî ku wî li ber Sultan serî hilda û bêemriya wî kir hingê Sultan jî avête ser, ew ji wir reviya çû **'Ummanê** û li wir mir. Piştî wî mezinayî kete destê **Huseyn ibn Salih** ê Kurd û remm di destê wî û zarûyên wî de ma heyânî dema **'Emr ibn Leys**; ji wan jî ew derbasî **Sasan ibn Xezwan**⁵⁷ ê Kurd bû û ta roja îro jî ew di destê malbata wî de ye.

Remma **Lewalîcanê** (el-Lewalîcan) heyânî wextê fermanrewayiya **Muhemmed ibn** (kurrê) **Îbrahîm et-Tahirî**⁵⁸ jî di destê malbata **Seffar** (es-Seffar)⁵⁹ de bû, lê wî [Îbrahîm et-Tahirî] remm xiste destê zilamekî Kurd bi navê **Ehmedê kurrê Leys** (Ehmed ibn el-Leys)⁶⁰ û heya roja îro jî ew di destê malbata wî de ye. **Muhemmed ibn Îbrahîm** ew sultan e ku êrîşî ser Ezdamerdê kurrê Kûşhaz kiribû ta ku ew reviyabû ['Ummanê]. Bes remma **Kariyanê** ji berê ve û heyânî roja îro jî di destê malbata **Seffar** de ye û mezinê wan ê niha **'Hecerê**⁶¹ kurrê **Ehmedê kurrê Hesên** ('Hecer ibn Ehmed ibn el-Hesên) e.

Mezinê remma **Bazincanê** jî yekî Kurd e û navê wî **Şehriyar**⁶² e; remm bi xwe jî li ser navê wî ye û ew xezûrê Cîleweyh e. Piştî wî ew (remm) ketiye destê **Qasimê kurrê Şehriyar** û ji wî jî derbasî destê **Mûsayê kurrê Qasim**⁶³ bûye. Ew Bazincaniyên ku di nav sînorê Îsfahanê de ne ji vê remmê ne; wan ji nav Fars bar kirine wir, lê di nav Fars de mal û milkên wan hene. Mezinê wan **Mûsayê kurrê Ebdurrehman** bû, piştî mezinatî derbasî **Mûsayê kurrê Mehrab** bû û piştî wî jî kete destê kurrê wî **Ebû** (bavê) **Meslem**⁶⁴ **Muhemmed ibn** (kurrê) **Mûsa**. Di pey wî de mezinatî kete destê birayê wî **Farisê kurrê Mûsa**, piştî jî derbasî **Ehmedê kurrê Mûsa** bû û heya roja îro jî serokatî di destê wan de ye.⁶⁵

(.)



Ji **Berzêxê** bi qandî sêyeka fersexekê [Fersexek nêzî 12,5 km ye.] dûr,⁶⁶ çemê **el-Kurr** heye, û li wî çemê el-Kurr jî ew **Sermahiyên**⁶⁷ ku xwê ji wir bar dikin her diyarî, dimînin. Di çemê el-Kurr de hin masiyên ku ji wan re **"zeraqen"** (ez-zeraqen)⁶⁸ û **"uşûbe"** (el-'uşûbe)⁶⁹ tê gotin hene û ev herdu cureyên masiyan ji cisnên masiyên wê herêmê giş xweştir in. Li ber deriyê **Berzêxê** ku jê re **"Deriyê**

Kurdan⁷⁰ jî tê gotin bazareke bi navê **el-Kurkî** heye û firehiya wê nêzî fersexek di fesexekê de ye [ku dibe 12,5 km.12,5 km–157,5 km²]. Herrojê yekşema xelk lê dicive, ji her cihê heya ji Îraqê⁷¹ jî xelk jê haydar e û guhên wan li ser in. Ev bazar ji ya **Kulserê**⁷² mezintir e û ji ber ku di vê rojê de timê ew [bazar] heye, wê navê xwe daye roja yekşemê û pîrr kes gellek caran gava navê rojên hefteyê dijimêrin dibêjin: ”şemî û kurkî”.⁷³ (Li gor agahdariyên ku Malmîsanij dide dibe ku eleqa vê kelîmeyê bi ”kîryaki”ya Yûnanî û ”kirê”ya Kirdkî (zazakî) re jî ku bi maneya ”yekşem” e, hebe. - E. N.)

(.)



Şehrezor bajarekî piçûk ê nêzî Îraqê ye ku Kurdan dest daniye ser, li wir ne mîr û ne jî waliyekî bajêr heye; ew der bi tavahî di destê Kurdan de ye. Herweha bajarê **Suhrewerdê**⁷⁴ jî ku bajarekî piçûk⁷⁵ e di bin desthilatdariya Kurdan de ye. Lê **Qezwîn** bi xwe bajarekî xwedî kele ye û dora wî bi sûr e,⁷⁶ bajêr di nava sûrê de ye û tê de camiyek heye. Ew li sînorê **Deylemê** ye û di navbera wê û **Musteqerrê** de ku ji aqarê Deylemê ye du qonax [meda rojekê bi piya ye - E. N.] yanî dozdeh fersex hene.⁷⁷

(.)



Bajarê [navçeya] **Enxuzê**⁷⁸ **Uşturc** e, ew bajarekî piçûk e û di çolekê de ye ku heft heb gund û malên Kurdan lê dimînin. Ew xwedî pez û deve ne û hirî û muyên **Merweyê**⁷⁹ tev ji nav wan tî. Çerm⁸⁰ ji herêma **Cûzîcanê** (el-Cûzîcan) bi aliyên **Xorasanê** yên din ve tî şandin ku hatin û bereketeke giştî ye.⁸¹

(.)

Ji **Nîsabûrê** heta xilaseka sînorê wê ku digihîje tixûbê **Qûmis** û gundê Kurdan ê nêzî **Esdabazê** çend roj in. Ji gundê Kurdan heyani **Damxanê** (Ed-Damxan) jî çend qonax in û ji Nîsabûrê heyani **Serxesê** jî dîsa çend qonax in. Ji Serxesê heya Merwe jî çend qonax in û ji Merwe jî ta 'Amela ku dikeve qeraxê çemê **Ceyhûnê** çend qonax in.⁸²

(.)

Yê ku ji Erebi wergerandîye:
Emîn Narozi

¹ E. J. Birill, *First Encyclopediya of Islam 1913-1936*, Leiden, New York, 1993. cild III, r. 560/a.

The Encyclopediya of Islam, New Edition, Ed. E. Van Donzel, B. Lewis, Ch. Pillat, Leiden, 1990, cild IV, r. 222.

The Cambridge History of Arabic Literature, religion, learning, and science in the 'Abbasid period, ed. M. J. L. Young, J. D. Latham and R. B. Serjeant, Cambridge University Press, New York, 1990, r. 312.

² Li gor Yaqût [el-'Hemawî] ev der weha ye: Çima me got ku di wî goşeyê wê yê .. ." (Ebû Îs'haq Îbrahîm ibn Muhemmed el-Farisî el-Îstexrî, *Kîtab Mesalik el-Memalik*, Metbe' Birill, Leiden, 1967, rûpel 96, jêrenota i)

³ Li gor Yaqût el-'Hemawî [tu bajar nîne] "ku tu [çiyar] tê de nebîni" ye. (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, r. 97, jêrenota a)

⁴ Di çapa A., B., C., D., E de û li gor Îdrîsî di şûna "remm" de "zemm" e û piraneya wê jî "zumûm" e. (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, r. 97, nota c). Çawa ku di vê notê de jî bihûrî, di çapa A de ev peyv bi giştî "zemm" e û di wê çapê de jêrenoteke weha jî heye: "Di çapa M de ev peyv »remm« e lê ew xirabûyê ji »zemm« ê ye ku peyveke Kurdî ye û di zimanê Kurdî de di maneya qebîle de tê bikar anîn". (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, Dar el-Kalum, Kahîre, 1961, ed. Muhemmed Cabir Ebd el-'Al el-'Hîni, r. 68, not 1)

⁵ Di çapa C. û D. de di şûna "Xurre" de "Curre" ye û di ya E. de jî "Durre" ye. (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, r. 97, nota f)

⁶ Di çapa A. û B. de "Qubaz Kurre" ye, di ya C. de "Qubaz Curre" ye û li cem Yaqut [el-'Hemawî] jî "herêma Fexxurre" ye. (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, r. 97, nota g)

⁷ Li gor çapa C. "en-Nûbendcan" e. (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, r. 98, nota a)

⁸ Li gor Yaqût el-'Hemawî "remm" cih û warên Kurdan in (El-Îstexrî, *Mesalik el-Memalik*, r. 98, nota b) Ji ber hebûna hinek cudalî û çavkaniyên din li ser vê behsa "remm"ê di berhema Yaqût el-'Hemawî de, min ew giş wergerand:

"Rumûm [ku piraneya remm e] di zimanê Farisî de ji bo cih û warên Kurdan tê gotin; ew çend cih in li Fars: yek ji wan remma Hesên ibn (kurrê) Cîleweyh e ku jê re remma Bazincan jî tê gotin û bi qandî çardeh fersexan (1 fersex=12,5km ye. - E. N.) ji Şîrazê dûr e. Yek jî remma Erdamê kurrê Cîwanabe ye ku ji Şîrazê bi bîst û pênc fersexî dûr e. Yek jî remma Qasimê kurrê Şehriyar e ku jê re Kuriyan jî tê gotin û ji Şîrazê bi pêncî fersexî dûr e. Yek jî remma Hesênê kurrê Salih e ku jê re remma Sûran jî tê gotin û ji Şîrazê bi heft fersexan dûr e. Ibn el-Feqîh wusa gotiye, lê dibe ku bi çûyina [mirina] xwediye wan [remman] navê wan jî ji ser remman rabûbe" [yanî navê wan hatibe guhertin].

"Buşarî jî gotiye ku: Li Fars remmên Kurdan hene ew bi wîlayet (bajarên mezin ku gund li dora wan kombûne) û çem in, ew li navsera çiyayên bi bostan ên bi darên xurmeyan û xwedî darên bi fêkî û yên bi xêr û bêr dimînin. Û remma Ehmed ibn Salih ku jê re Ez-Zîzan jî tê gotin heye.

El-Îstexrî jî gotiye ku; remmên Fars pênc in, li dora heryek ji wan hinek bajar û gund kom bûbûn û her serokek ji yên Kurdan dayoxê (keflê) bac û xeraca herêmek ji wan bû. Wan ji bo parastina rê, ya qesleyên kerwanan û ji bo belayên ku ji Sultan yanî ji koleyên wî dihatin, pêwîstiya danîna zilaman li serê riyan dihibûn. Yek, remma Cîleweyh e ku bi Remma Zenîcanê - navê qebîleyeke Kurdan e- jî tê nasîn; ew dikeve navçeya piştî Îsfahanê û aliyek ji herêma Îstexrê yek jî ji ya Errecanê digire. Tixûbekî vê [remmê] digihîje El-

Beydaê, yek jî digihîje ber sînorê Îsfehanê, yek jî bi hudûdê Xûzîstanê kuta dibe û yek jî li ber navçeya Sabûrê diqede. Çi gund û bajarên ku dikevin nav vê derê [vî tixûbî] ji vê remmê ne û bi deverên Îsfehanê re hev tixûb in. Du, remma Şehriyar e - ew remma Bazincanê ye - remma bavikek ji Kurdên Bazincanê ye ku ji qebîleya Şehriyar in. Tu kes ji wan Bazincaniyên herêma Fars tine ku gund û milkên wan ên pîrr tunebin. Sê, remma Zîzanê ye ku ya Hesênê kurrê Salih e; ew di nav herêma Sabûrê [Şapûrê] de ye, tixûbekî wê digihîje Erdeşîr-Xurre û sînorên wê yên din jî di nav herêma Sabûrê [Şapûrê] de dimînin. Çi gund û bajarên ku di navbera tixûbên wê [herêmê] de ne, li ser wê ne. Çar, remma Reyhanê ya Ehmedê kurrê Leys [şêr] e û di nav herêma Erdeşîr-Xurre de dimîne. Sînorekî wê digihîje deryayê û her siyên din di nav herêma Erdeşîr-Xurre bi xwe de dimînin; çî gund û bajarên ku di nav tixûbên wê (remmê) de ne, li ser wê ne. Pênc, remma Kariyan e ku sînorekî wê digihîje benda tixûbê Seffaran (Benî es-Seffar), yek jî bi yê remma Reyhanê kuta dibe, yek jî digihîje sînorên Kermanê û ji wir jî davêje Erdeşîr-Xurre; ew [remm] bi temamî di nav aqarê Erdeşîr-Xurre de dimîne". (Şihabeddîn 'Ebû Ebdullah Yaqût ibn 'Ebdullah el-'Hemawî er-Rûmî el-Bexdadî, Mu'cem ul-Buldan, Daru Beyrûd û Daru Sadir, Beyrûd, 1957, cild: 3, r. 71)

⁹ Di çapa A û B de "Helewnê" û "Heloye" ye, di ya D. de "Xebleweyh" e. Li gor Yaqût [el-'Hemawî] jî "Cileweyh" e, lê li gor Îbn Xurdadabeh "el-'Huseyn ibn Cileweyh" e û li cem Îdrîsî jî "el-'Hesen ibn Xaleweyh" yan "el-'Hesen ibn Xaloye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota c)

¹⁰ Di çapa A. de "ed-Demîhan" û "er-Remîhan" tê, di ya B. de "er-Remcan" e, di ya C. de "er-Rembecan" e, di çapa D. de "ez-Zemcan", "ez-Zemîncan", "er-Remcan" û "ed-Demcan" tê. Di ya E. de "Remhan", "Meycan", "Bers'han", "Sencan" û "Mescan" tê, li cem Îdrîsî jî "er-Remîcan" e, li gor Yaqût [el-'Hemawî] "ez-Zenîcan" e û li ba Xurdadbeh jî "el-Meyancan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota d)

¹¹ Di çapa A., B., C. de "el-Lewanîcan" e û di çapa E. de "Lewabîcan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota e)

¹² Di çapa A., B., C., D., û E. de "Ehmed" e, lê li gor Yaqût [el-'Hemawî] û Îbn Xurdadbeh "el-'Hesen" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota f)

¹³ Li gor Îbn Xurdadbeh "er-Reyzan" e, li cem Yaqût [el-'Hemawî] "ez-Zeyzan" e, di çapa C. de "er-Reywan" e, di çapa E. û li cem Muqeddesî "ez-Zeyraz" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota g)

¹⁴ Di çapa A. de "Şehrizar" e, di ya B. de "Şehrîzar" û "Şehrî Raz" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota h)

¹⁵ Di çapa A., B., C., de "el-Mazîcan" e, di ya D., de "el-Mazîncan" e, di ya E. de "Badîncan", "Madîncan", "Barîncan" û "Badancan" tê, li gor el-Mes'ûdî "el-Madîncan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 98, nota i)

¹⁶ Di çapa C. û E. de û li cem Yaqût [el-'Hemawî] "el-'Huseyn" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 99, nota a)

¹⁷ Di çapa A. de "el-Kadiyan" e, di ya C. û D. de "el-Karîban" e, di ya E. de "Kadîman" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 99, nota b)

¹⁸ Ji kitêba Mesalik el-Memalik beşa Biladu Fars r. 96, 97, 98 û 99'an hatiyewergerandin

¹⁹ Di çapa C. de di şûna "vê remmê" de "remma Cileweyh" e, li cem Yaqût [el-'Hemawî] jî ev der weha ye: "remma Şehriyarê ye, ew ya Bazincanê ye û hev tixûbê Îsfehanê ye, ew

remma hinek Kurdên Bazincanê ye ku ji qebîleya Şehriyar in". (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 113, nota n)

²⁰ Di çapa C. de "ew ji qewmê Şehriyar in" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 113, nota o)

²¹ Li gor Yaqût [el-'Hemawî] "'Hesen" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota a)

²² Li gor Yaqût [el-'Hemawî] "er-Rey'han" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota c)

²³ Di çapa B. de "es-Sefaq" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota e)

²⁴ Li gor Yaqût [el-'Hemawî] "er-Reyhan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota f)

²⁵ Di çapa E. de "Ramaniyan" e, li cem Muqeddesî û Yaqût [el-'Hemawî] jî "Raman" e û di çapa B., C. û D. de "Zamanî" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota h)

²⁶ Di çapa E. de "zemma Mudîr" e, di ya C. de "Mudebbir" e, di ya D. de "Mudîn" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota i)

²⁷ Di çapa C. de "el-Beqliyye" ye, di ya D. de "el-Qebîle" ye, li gor Muqeddesî "es-Su'lebî" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota k)

²⁸ Di çapa B. de "en-Nebdadmehrî" ye, di ya E. de "Bendamehriyan" e û di ya D. de "Bendamehrî" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota l)

²⁹ Di çapa C. de "el-Erdekani" ye, di ya D. de "el-Edrekanî" ye, di ya E. de "Edrekaman" û "Edrekanîyan" e, li gor Yaqût [el-'Hemawî] jî "Ezrekan e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota m)

³⁰ Li gor çapa B., C., E. û li gor Muqeddesî "es-Sehrekî" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota n)

³¹ Di çapa B. û C. de "et-Tebadhiyye" ye, di ya D. de "et-Tarheniyye" ye, di ya E. de "Tehadiyan" û "Tehariyan" e, li cem Muqeddesî jî "et-Tehadehniyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota o)

³² Di çapa B., C. û D. de "ez-Zeyadiyye" ye, di ya E. de "Zeyadiyan" e, Li gor Muqeddesî "ez-Zeyadiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota p)

³³ Di çapa B. de "es-Sehrewiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114)

³⁴ Li gor çapa B. "Bendadlî" ye, di ya E. de "Bendadkan" e, di ya C. de "el-Bendadqiyye" ye, di ya D. de "el-Bendawefiyye" ye û li cem Muqeddesî "el-Bendafiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota q)

³⁵ Li cem Muqeddesî û di çapa B. de "el-'Heşrewiyye" ye, di ya C. û D. de "el-Cîsrewiyye" ye û di ya E. de "'Hesrewî" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114, nota r)

³⁶ Di çapa E. de "Zenkiyan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 114)

³⁷ Di çapa C. de û li cem Muqeddesî "es-Seqriyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota a)

³⁸ Di çapa C. de "eş-Şehanîwiyye" ye, di ya E. de "Şehmariyan" û "Şehmariyan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota b)

³⁹ Di çapa C. de "el-Îsamehriyye" ye, di ya D. de "el-Esamehriyye" ye û di ya E. de jî "Esamehrî" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota c)

⁴⁰ Di çapa B. de "es-Salûye" ye, di ya E. de "Sahûyan" e û li cem Muqeddesî "es-Sehawebiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota d)

⁴¹ Di çapa C. de "el-Meraniyye" ye, li cem Muqeddesî "el-Qerasiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota e)

- ⁴² Li gor çapekê "es-Selmemiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115)
- ⁴³ Di çapa C. de "es-Sebiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota f)
- ⁴⁴ Di çapa B. de "el-Erdaduhtîyye" ye, di ya C. de "el-Eradweçbiyye" ye, di çapa E. de "Ezaddurextîyan" e û li cem Muqeddesî "el-Eradzehiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota g)
- ⁴⁵ Li gor çapa C. "el-Berardexniyye" ye û li gor ya E. jî "Berandehîyan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota h)
- ⁴⁶ Di çapa C. û D. de "el-Metliyye" ye, di ya D. de "el-Meltiyye" ye û li gor Muqeddesî "el-Metbiyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115)
- ⁴⁷ Di çapa B. de "el-Hemaliyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota i)
- ⁴⁸ Di çapa B. de "es-Sahlekaniyye" ye, di ya C. de "Şhakaniyan" e, Ous "Samakaman" e, li cem Muqeddesî "es-Sakaniyye" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota k)
- ⁴⁹ Di çapa C. de "Xelîliyan" e û li nik Muqeddesî "el-'Hêliyye" ye. Li gor çapa C. û li gor Muqeddesî ku jî Îstexrî werdigre ev jî heye: "33 bavikên Kurdan li wir [Fars] hene". (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115). Li gor çapa di destê min de jî ev hejmar heye lê hinek li paştir tê.
- ⁵⁰ Di çapa C. de "qebîleyên Berberan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 115, nota n)
- ⁵¹ Ji kitêba Mesalik el-Memalik beşa Bîladu Fars, rûpelên 113, 114 û 115'an hatiye wergerandin.
- ⁵² Di çapa A., B., û E. de "zemm" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 144, nota e)
- ⁵³ Di çapa E. de "Meycan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 144, nota f)
- ⁵⁴ Di çapa A. û B. de "Zerûne" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 144, nota g)
- ⁵⁵ Li gor çapa A. û B. "er-Rezqan" e û li gor ya E. jî "Berzewan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 144, nota i)
- ⁵⁶ Di çapa E. de "Kohîstanî" û "Kohîstan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota a)
- ⁵⁷ Di çapa A. de "Ezwan" e, lê di ya B. de "Erwan" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota b)
- ⁵⁸ Li gor Ibn el-Esîr "Îbrahîm ibn Muhemmed ibn Mes'eb" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota d)
- ⁵⁹ Li gor çapa A. û B. "es-Sefaq" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota c)
- ⁶⁰ Di çapa Ibn el-Esîr de "Muhemmed ibn el-Leys" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota e)
- ⁶¹ Li gor çapa A. û B. "He'hûn" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota f)
- ⁶² Di çapa A. û B. de "Şehrî Raz" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota h)
- ⁶³ Li gor çapa D. "Îbrahîm" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota k)
- ⁶⁴ Di çapa B. de "Mesleme" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 145, nota l)
- ⁶⁵ Ji kitêba Mesalik el-Memalik beşa Bîladu Fars, r. 144 û 145'an hatiye wergerandin.
- ⁶⁶ Li gor çapa C. û D. "sê fersex" in, herweha li cem Ebûlfeda jî "sê fersex" in, lê li gor Qezwîni ev der weha ye: "diherike ber derê Berzexê û cihê eş-Şûrmahîc ji Berzexê sê fersex in". Li cem Muqeddesî ev jî heye: "çemê Kurrê du fersex jê dûr in". (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota e)
- ⁶⁷ Li gor Yaqût [el-'Hemawî] "eş-Şûrmahî" ye û li nik Qezwîni "eş-Şûrmahîc" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota f)
- ⁶⁸ Di çapa A. de "er-Reraqîn" e, li gor ya B. "ed-Deraqîd" e, di çapa C. de û li cem Qezwîni

jî "ed-Deraqin" e, di çapa D. de "ez-Zeraqî" ye, di ya E. de "Rafin" e. Ebûlfeda "er-Raziqî" dide û Yaqût [el-'Hemawî] jî "ed-Dewaqin" dinivîsîne. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota g)

⁶⁹ Di çapa A., B. û D. de "el-'Esûbet" e, di ya C. de "el-'Esb" e, di ya E. de "Eşûr" e û li cem Qezwînî "el-'Eşb" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota h)

⁷⁰ Di çapa A. û B. de weha ye: "Deriyekî ku bi navê Deriyê Kurdan tê bi nav kirin". (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota i)

⁷¹ Di çapa E. de "Xorasan" jî heye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota n)

⁷² Di çapa A. de "Lûksere" ye, di ya E. de "Lûresere" ye, di ya D. de "Kûrsere" ye, li gor Yaqût [el-'Hemawî] jî Kûrsere" ye, li cem Îdrîsî "Kewasir" e, li nik Muqeddesî "Kubsere" ye û di Cîhan-Numa de "Lûsere" ye. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 183, nota o)

⁷³ Ji kitêba Mesalik el-Memalik beşa Ermenistan û Azerbaycanê r. 183'yan hatiye wergerandin.

⁷⁴ Di çapa C. û D. de "Şuhrewerd" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 200, nota k)

⁷⁵ Di çapa C. de ev cumle jî heye: "Ji min re eseyî hate gotin ku bajarê piçûk Şuhrewerd . . .". (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 200, nota l)

⁷⁶ Di çapa C. de "Mezin e" jî heye û di çapa E. de jî weha ye: "Qezwîn bajarekî mezin î şaristanî û sûrkirî ye". (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 200, nota m)

⁷⁷ Ji kitêba Mesalik el-Memalik beşa el-Cîbal [Welatê Çiya] r. 200'î hatiye wergerandin.

⁷⁸ Li gor çapa A. û B. "Uncud" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 271, nota b)

⁷⁹ Di çapa A. û B. de "Es'er Meded" e. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 271 nota d)

⁸⁰ Di çapa D. de peyva "Medbûxe", debaxkirî û di ya E. de peyvên "Sextiyani Kurkanî" jî hene. (El-Îstexrî, Mesalik el-Memalik, r. 271, nota e)

⁸¹ Ji kitêba Mesalik el-Memalik, beşa Xorasanê, r. 271'ê hatiye wergerandin.

⁸² Ji kitêba Mesalik el-Memalik, beşa Xorasanê, r. 282'yan hatiye wergerandin.

AZADIYA GOTINÊ Û WEŞANÊN GIŞTÎ

Şahînê Bekirê Soreklî

Azadiya gotinê mafê bingehîn yê her merovî ye. Merov nikare civakekê wek yeke demokrat bi nav bike eger di wê civatê de gotin ne serbest be.

Di cîhana îroyîn de, heye ku xwebêja azadiya gotinê ji bo hemî civakan eynî xwebêjê nede. Di hindek civakan de azadiya axaftinê li gor baweriyên olî û toreyî dikeve pîvanê. Li milê din, azadiya axaftinê di hindek civakan de bi prosesa dîrokî ya wê civakê ve girêdayî ye. Merov dikare bibêje ku danîna sînoran li pêş azadiya gotinê herdem ji aliyê karbidestan de nayê holê. Ev sînor, dikarin bi encama baweriyên gelemper yên civakekê, baweriyên ji nifşên pêşîn derbasî nifşên dawîn bûyî, bên holê. Baweriyên gelemper yên civakekê dikarin bi demê re hêdî-hêdî, yan jî bi encama guhertinên dramatîk zû bên guhertin. Guhertineke wisa dikare mafê axaftina azad ber bi pêş bavêje, yan jî ber bi paş. Wek nîşe, baweriya gelemper di derheqê pirsên olî û yên homoseksuelan de li welatên rojava di nav bîst salên borîn de ta radeyeke bilind hat guhertin û axaftina di derheqê van pirsan de azad bû, lê di nav civakine din de axaftina li ser eynî pirsan veşartî ma. Di civakên ku karbidestî tê de ket destê aliyên xweperest û şêwehişk de, rewşa azadiya axaftinê bêtir ber bi paş çû. Derketina li hember baweriya gelemper ya civakên wisa, yan kesên ku xwe wek berpirsiyarên wan civakan bi nav dikin, dikare bi xwe re encamên xirab bîne. Kesê ku li hember baweriya gelemper ya vê civakê, yan jî karbidestên wê tişteki bibêje, dê wek "kafir" yan jî "xayîn..." bête binavkirin. Di vî warî de merov dikare Selman Ruşdî û Teslîme Nesrîn wek mînak bi nav bike.

Ji ber vê yekê ye ku gellek ji me şeweya axaftina xwe li gor rewş û civakan diguherin. Wek nîşe, şeweya ku hindek entelektuelên Rojhilata Navîn pê pirsên siyasî û olî munaqêşe dikin, pêkan e li gor şûna ku ew lê dimînin û kesên beşdar



Ji kongreya 62. a PEN'ê

bête guhertin. Bi gotineke din, tiştê ku li welatekî Ewropayî bête gotin, heye ku di nav civaka welatekî Rojhilata Navîn de neyê gotin, ji ber ku gotina serbest li cihê duyem dikare ne tenê bibe sedema girtina wî, lê heye ku herweha bibe sedema nefreta civakê jî.

Ji min hatibû xwastin ku ez di axaftina xwe de bêtir azadiya gotinê û weşanên giştî bidim ber çav. Wekî diyar e, weşanên giştî ne tenê di warê ragîhandina nûçeyên herêmî û navneteweyî de bi roleke mezin radibin, lê herweha di warê perwerdekirinê û propogandaya siyâsî de.

Hîn di cîhana me de gellek welat hene ku tê de weşanên giştî wek hacetekî propogandaya siyâsî tên bikaranîn, wek Îraqê, Koreya Bakur û gellek welatên cîhana sêyem ku tê de weşanên giştî bi tevahî di destê hukmatê de ne. Li welatên wisa tenê raman û daxwazên partiyekê, yan yên li ser karbidestiyê, di weşanên kaxizîn û yên elektronîk de cih digrin. Heta bi nûçeyan be, ew jî bi şêweyê wisa tên raberkirin û bihîstandin ku bibin neynika îdeolojiya wê partiyê yan jî hukmatê. Daniştvanên van welatan ne tenê ji mafê gotin û baweriya azad bêpar dimînin, lê herweha ji mafê bidestxistina nûçe û agahiyan bi şêweyê objektîf.

Welatine jî hene ku tê de weşanên giştî bi tevahî ne di destê dewletê de ne. Li wan welatan rojname, kovar, radyo, televîzyonên ehlî jî hene ku ji aliyê kesan yan koman de tên birêvebirin. Lê her tiştê ku bête nivîsandin, gotin û raberkirin divê li gor merc û qanûnên dewletê bin. Dewlet dikare dest bide ser gotarekê, rûpelekê, yan jî tevahiya hejmarekê kovarê/rojnameyê. Organên dewletê dikarin tew rojnameyêkê bi tevahî bidin rawestandî, xwedî, nivîskar û rojnamevanên wê bi

girtinê û bi pereyan bidin cezakirin. Di vî warî de Tirkiye nîşeyeke baş e. Di çend salên borîn de Dadgeha Emniyeta Dewletê bi dehan rojname û kovar, herweha bi sedan pirtûk qedexe kirin. Vê dadgehê, benda 8. a navxirab ji destûrê Tirkiyê, benda ku beşine wê ji aliyê parlemanê de van rojan hatin guhertin lê bi tevahî ji holê ranebû, jibo biryarên xwe kir bingeh. Bi sedan nivîskarên Kurd û Tirk îroj di girtîgehên Tirkiyê de ne. Yek ji wan nivîskarên Tirk, İsmail Beşikçi ye ku baştirîn salên jiyana xwe di girtîgehan de derbas kirin, ji ber nivîsandina di derheqê mafên Kurdan de. Yek ji navdartirîn nivîskarên Tirkiyê, Yaşar Kemal, ku bi koka xwe Kurd e û temenê xweli jor 70 salan e, tê mehkemekirinê ji ber ku wî di hevpeyvîneke li gel kovara Almanî, Der Spiegel de behsa sitemkariya ji aliyê hukmatên Tirkiyê de li gelê Kurd bûyî kiribû û çareserkirina pirsgerêka Kurdî bi rêyên demokrasî û aşî xwastibû. Kesên biyanî jî ji girra vê qanûnê nayên parastin. Alisa Marcus, rojnamevanê Reuter, tê mehkemekirin, ji ber ku wê di raporeke -ku di meha 11'em ya 1994'an de hatibû weşandin- de nivîsandibû ku hêzên Tirk di şerê xwe yê li dij gerillayên PKK de wêrankirina gundên Kurdan ji xwe re kirine armanc. Dadgeha Emniyeta Dewletê, wê bi tûjkirina hestên kerahiyet û nijadperestiyê tawanbar dike. Jê bêtir, bi sedan rojnamevan, nivîskar û ronakbîrên Kurd ji aliyê çekdarên nenas de hatine kuştin. Rêxistinên Kurdan û yên mafên merovan Li Tirkiyê, tiliyên xwe ber bi îsixbarat û hêzên taybetî dirêj dikin. Kujerên van kesan nehatine dîtin yan jî girtin.

Rewşa gotina azad û mafê weşandina bi Kurdî li beşên din ên Kurdistanê ne baştir e. Hewce nake ez ji we re bi firehî behsa Îraqê bikim. Haya we hemiyan ji sitemkariya wan heye. Ji bo Îranê têrê dike ku merov pirsra Selman Ruşdî wek mînak bîne ser zimên da ku xuya bike ka çiqas azadiya gotinê û weşandinê li wir heye. Li Sûriyê çî rojname û dezgehên radyo û televîzyonê bi zimanê Kurdî nînin.

Di dawîya axaftina xwe de ez dixwazim diyar bikim ku ji bo herkesê ji azadiyê bawer, xemgîniyeke mezin e ku di dawîya sedsala 20'em de bi sedan mîlyon merov di cîhana me de hîn ji wî mafê bingehîn bêpar in ku ji bo wan rojname, radyo û televîzyonên azad û objektîf hebin. Ji wî mafî bêpar in ku bikaribin bi azadî birûbaweriya xwe binin ser zimên û binivîsin. Di vê dem û dewrana pêşketina teknolojiyê de, di dem û dewrana *internet* û *superhighway* de, bi mîlyonan kes, bêtir ji sih mîlyon Kurd tê de, hîn di welatên xwe de ji wî mafî bêpar in ku bi zimanê xwe rojname û kovaran biweşînin, bernameyên di radyo û televîzyonan de pêşkêş bikin.

Erkekî pîroz e ji bo hemî nivîskaran ku deng û pênuşa xwe ji bo piştgiriya mafê gotin û weşanên azad li hemî welatan û di nav hemî civakan de bikarbînin*.

* Şahîne Bekirê Soreklî di Kongreya 62'em a Rêxistina Nivîskarên Cîhanê (PEN) de axaftibû. Nivîsa jorîn, metnê axaftina wî ye û ji Îngilîzî hatiye wergerandin.

Vê kongreya PEN'ê ji 26 10. 1995 ta 1. 11. 1995 li Perth (li Australya) dom kiribû.

DAYÊ, BAVO ÇIMA NAYÊ?

Dilbijan

Zivistan bû li Kurdistanê,
Sirrê zor bêdadî dikir.
Çiya wek pîrê sedsalî
Ridîn û pirç sipîçîl bû,
Wekî Dêwê Sipî, jêrdestê sermayê
Esîr û bendî û dîl bû.
Hewa zor sar û sexlet bû
Ji jaran ra kîn, nifrîn û le'net bû.
Li rojek wa sirr û sar da
Li bin bar da
Kîçek Kurda, tîhnî, birsî
Ji dê pirsî:
-Dayê, bavo çima nayê?
Çima nayîne ji bo min ew
Kirasê kesk û sor û zer,
Ji bo te xavik û mêzer?
Dayê, bavo çima nayê?

Dayê kûr keserek kêşa,
Veda bersiv bi van êşa:
-Kîçê, bavê te hê nayê,
Çûye bîne ji malê ra
Tirîşka Tav û germayê,
Çûye ret ke sirr û seqem û sermayê,
Çûye bîne heyva ronî,
Ji bo şevên reşejînê,
Çûye rizgar ke evînê,

Çûye bîne avêş, derman
Ji bo zaman û birînê,
Çûye rizgar bike canê,
Ruha dadê!
Kurdistanê li bin destan,
Çûye derbîne ew Tavê
Li zincîrê bo serbestan.
Ewê bêtin dilê dadê.
Ewê gel Kawê Asinger
Digel bihara sor û zer
Dema dîl kir Zuhakê pîs û pintî û gelek bedferr,
Ewê bêtin.
Ewê bîne ji bo me jîn û hermanê,
Ewê bîne birîna vî welatî ra
Avêş û dav û dermanê.



Zivistan têperrî,
Serma revî.
Mij û dûman li çiya ret bûn.
Vebûn cot çavên biharê.
Belê bavo nehat carê.
Hê jî ev pîrs û pisyare
Hezaran û hezar car e
Ku bê bersiv weha maye.
Hezaran kes dipîrsin hê...
Dayê, bavo çima nayê
Dayê, bavo çima nayê.

4. 3. 1994

STÊRKEK XURICÎ JÎ ASÎMANAN

Bedirxan Epözdemir

Zeman çawa zû derbaz dibe. Weka av dixuşe û diçe bêdeng... Îro fekirîme salnamê, va ye du sal e ku Şewket şehîd bûye. Di ser bûyera reş da du sal derbaz bûne. Lê Şewket weka guleke bor di nav me da ye. Ev gula bênxweş wê tucar neçilmise. Me ew gula nazenîn di kûrayiya dilê xwe da neqîş kiriye. Gula me wê tim geş be. Ev sond û peyman e ji me ra.

Bi rastî bêjim? Hêja jî nebawer im ku Şewket şehîd bûye. Herwek tim û tim li himberî min rûniştiye bi kêf, henek û laqirdî. Bi rûyê xwe yê geş û ken dibêje "Ez nemirime, dijîm, li nav we me." Ji nişka va bêhiş û mecal dibim gelek caran. Difikirim bi şev û rojan. Lê digerrim. Diçim nav tarî û zilomatan. Bang dikim bi hawar û gazî. Lê nabînim, nabihîzim. Bêmecal, bêtaqet dibim. Di xewn û xeyalan da ew di jiyana rojane da tim li ber çev. Berdîyan didime ber dilê xwe ku dilê min piçek hêsa be. Lê heyhat, nafîle... Divêm nefikirim. Lê sed mixabin, nikarim.

Di vê nivîsê da, ji ku dest pê bikim, çawa binivîsim nizamim. Însanekî pirralî, edebiyarzan, huqûqnas, humanîst, polîtîkzan, bîrewer, dostê aşîriyê û biratiyê, têkoşerê demokrasî û wekhevîyê. Neyarê tirs, tarî û niheqiyê. Evîndarê kulîlk, zarûk û bêkesan, hêviya belengazan. Weke stêrkek li asîmanan. Şerkerê azadî û mafê merivatiyê. Avûkatê bêtirs yê bijare. Moral û manewiyeta girtiyên zindanan. Car li Diyarbekir, car li Xarpêt, Bedlîs û Wanê û li metropolan. Serkêşê xwepêşandanan. Kelema nava çavên dijmin, neyarê tarî, keysperest û bêbextan.

Şewketê me, 'ezizê dilan, îro bûye sitran li ser lêvan. Careke din bi sond û peyman, em te dernaxin ji kûrayiya dilan.

Jiyaneke kurt lê birûmet

Şewket [Epözdemir] sala 1943'yan li bajarê Sêrtê, li qeza Bayqanê, li gundê Mînar ji diye xwe bûye. Navê babê wî Fethullah, yê diya wî Melîha ye. Di piçûkayî da diya wî wefat kiriye, pîrika wî ew mezin kiriye. Pîrika wî Dadê Gulê jê pir hez dikir. Herwuha wî jî ji Dadê Gulê.

Şewket yekemîn kes e ku ji Mînar piştî dibistana ewil çûye dibistanên din. Di jiyana wî da Mînar roleke pir giring leyistiye. Ev Mînar a ku Îbrahîm Heqqî Efendî gotiye:

”Eynik û Eyindar

Bêkend û Mînar

Xweştir e ji textê xwendegar.”

Şewket dibistana ewil li gundê xwe kûta dike. Piştî wê diçe dibistana mamostayan a li Erxeniyê (Dicle İlköğretmen Okulu). Temenê wî texmînen duwazde ye. Zarûkekî xweşik û delal e. Yekem car e ku ji gundê xwe derdikeve. Xurbet, hesret û evîn dest pê dikin.

Di wan salan da dor û tirafên wî jîr û zîrebûna wî fêhm dikin. Hêja di salên ewil ên dibistana mamostayan da fikrên welatparêzî bala wî dikşînin. Xwe bi wana dixemilîne. Ev wuha dom dike heya dawiya temenê wî. Bi dereceke baş dibistana mamostayan diqedîne. Piştî wê, zemanê kurt li Bayqanê mamostayîya dibistana ewil dike. Lê evîna xwendinê dev ji pêşîra wî bernade.

Di van salan da li Diyarbekirê, enstîtuya perwerdekariyê (eğitim enstitüsü) vedibe. Şewket dikeve îmtihanê û beşê edebiyatê qezenc dike. Li wir xwendevanekî pir jêhatî ye. Ew jêhatîbûn tenê di çarçova dibistanê da nayê hepiskirin. Herwuha li derveyê dibistanê jî xwe nîşan dide. Gelek çalakîyên bêhempa dike. Ku meriv bi dîtineke zelal wan salan bîne ber çavê xwe, xwendevanên welatparêz çengek in, Şewket yek ji wan e. Roj bi roj xwe nû dike û bi zanistî xwe dixemilîne. Di vê demê da gelek şexsiyetên Kurd nas dike. Weka Canîp Yıldırım, Se'îd Elçî, Edîp Altınakar û yê din.

Di sala 1964'an da enstîtuya perwerdekariyê diqedîne. Li Lîseyê Zîya Gökalp a Diyarbekir dibe mamostayê edebiyatê. Gelek şagirdên hêja digihîjîne. Têkoşîna demokratîk-akademîk û welatparêzî di mecrayêke din da dom dike. Ew demek di nav refên PDKT da cih digre. Di nav komeleyên mamostayan wek TÖDMF, TÖS da rola xwe dileyize. Piştî ku TÖS qedexe dibe, dikeve nav TÖB-DER'ê jî. Piştî operasyona PDKT ya 1968'an, surgûnê Sorgunê (Yozgat) dibe. Pêwîst e li vir bîranîneke xwe binivîsim:

Gava operasyona PDKT çêbû (1968), polîsan birayê me yê mezin kek Şakir bi hevalên xwe va hilanîbûn, biribûn. Ez wê demê şagirdê dibistana mamostayan bûm. Çend roj bû ku em jê bêxeber bûn. Rojek hêvarê, babê wî, apê min ê mezin Fethullah pir hêrs bû, go: ”Lawo hûn çima pîrsa Şakir nakin? Li ku ye, sax e yan

mirî ye?" Piştî gelek axaftinan me mêze kir ku apê min dev ji me bernade. Em wê şevê çûn buroyên avûkatan. Me dît ku bûroyên hemî avûkatên nas dadayî ne. Tenê ya yekî vekiribû, navê wî nayê bîra min, paşnavê wî "Yardımcı" bû. Em çûn hindir û rûniştin. Çend kesên din jî li cem avûkat bûn. Bixêrhatin da me. Piştî wê me dest bi axaftinê kir. Şewket bi kurtî behsa rewşa Şakir û hevalên wî kir. Piştî guhdariyê, avûkat li kitêbeke stûr nihêrt. Kitêba "Qanûna Tawanê ya Tirk" bû. Hin bend jê xwendin. Paşê li me zivirî û got cirmê wan dikeve nav madda 125'an, ew jî dardakirin e, û domand got: "Xemgîn û biheyecan mebin xortno. Qedera Rojhelat û Rojhelata Başûr ev e". Gotina avûkat piçek bi tirs piçek jî wek şîret bû, lê wek tinaziyê digot. Li himberî gotinên avûkat, Şewket bersîvek gelek baş da. Wusa bû ku avûkat şermezar bû. Şewket got: "Avûkatê hêja, em natirsin û biheyecan jî nabin. Me tirs û heyecan di kitêban da xwend û ji serê xwe avêt." Me ji avûkat ra got "şev baş" û em rabûn çûn. Me bihîst ku avûkat paşê ji gelek kesan ra behsa vê 'ecêbmayîna xwe kiriye. Em çûn me mesela xwe û avûkat ji Ap Fethullah ra got, wî guhdariya me kir, paşê got: "Eferim lawo. Wusa mêr bin. Dema gotinê hat, ji babê xwe jî meparêzin."

Piştî ku Şewket diçe Sorgûnê, dikeve îmtihana universîteyê û Fakulta Huqûqê ya Enqerê qezenc dike. Paşê li Kırıkkale û Enqerê wek mamosta dixebite, her di wê demê da di fakulta huqûqê da dixwîne. Mamostayiya wî ya dawî li Tarwanê bû. Wî ji sala 1964'an heta 1983'yan mamostatî kiriye.

Şewket bi ezim û cefakarî di sala 1975'an da dibe avûkat, tê Tarwanê. Liwir di nav gelê xwe da cî dibe. Esil têkoşîna giranbiha li wir dest pê dike. Bi rewş û xebata xwe di demeke kurt da tê naskirin. Bi nefspiçûkiya xwe, bi nermbûn û bênfirahiya xwe li mintiqê îhtirama xelk distîne.

Dengê postalan. Tofaneke mezin tê sertaserê welêt. Dîrok dîsa tekerrur dike. Dîroka gelên Tirkîyê careke din bi xwînê tê nivîsandin. 12 Îlon 1980. Wê rojê Şewket û bi sedan kes li Tarwanê tîn girtin. Şewket 33 roj di bin destê hêzên dewletê da dimîne, paşê tê berdan. Dema ku girtî ye, bi henek û laqirdiyên xwe moral dide heval û hogirên xwe. Vê rastiyê gelek kes baş dizanin. Dor û alî tarî û zilomat e lê ew guh nade tehdîtan. Ew, di nav tariyê da çirûskeke birûmet e ku êş û janê bi ostayî himbêz dike. Di dilê wî da ciyê bêhêvîtiyê tune. Hêvî bireweriya wî zexm dike. Di nav ewrên reş da weke hîvek e, tavek e. Li himberê xwîn û şerr, bêwestan aşîti û biratiyê diparêze. Galegal nake, bêdeng dimeşe di riya xwe da. Li himber girînê rûmeta kenê bilind dike. Wan rojên teng û tarî bi moraleke bilind derbaz dike. Koç nake, koçkirinê qebûl nake. Mala xwe bar nake û gel tenê nehêle. Bi mêrxasî singê xwe dike mertal. Heya dawiya jiyana wî ev wuha dom dike. De'wa siyasî li ku dibe bila bibe, ya kî dibe bila bibe, Şewket li wê ye. Weka çirayê jibo gel tevayî. Wek huqûqnasek li Îstenbolê, Enqerê, Xarpêtê, Bedlîsê, Wanê û li Diyarbekirê alaya huqûq û aşîtiyê bilind dike.

İnsanekî pirralî

Heke meriv rastî bibêje, meriv nikare di nivîseke wuha kurt da bi hêsanî xuxûsiyetên Şewket binivîse. Çunkî ew xwedanê jiyaneke pirralî bû. Rengên cihê-cihê demxa xwe li jiyana wî dabûn. Her aliyekî jiyana wî tenê bi serê xwe şayanê lêkolînê ye. Meriv dikare wek nimûne behsa wana bike.

Şewket, rewşenbîrekî Kurd ê hêja bû. Di gelek waran da rewşen bû. Gava ku ez piçek li ser jiyana rewşenbîrên dinê bûm xwedî agahî, min tim ji xwe pirs dikir, gelo li welatê me jî li gor van qistasan rewşenbîr hene? Bêguman gelek nav dihatin bîra min, ji wan navan yek navê Şewket bû. Bersiva gelek pirsan min dikaribû ji wî bigrim. Yekem car min bi me'na xweya bingehîn me'na evîndariyê ji wî bihist. Tim digot em ji insanên xwe, darên xwe, kulîlkên xwe, deşt û banîyên xwe, zozanên xwe, ji heywanên xwe berpirsiyar in; bi kurtî em ji xwe û ji dîroka xwe berpirsiyar in. Pêwîst e ku em xwe bi zanist û kulturê bixemilînin.

Narînbûn, kubarbûn û bênfirahiya Şewket ji vê berpirsiyariyê dihat.

Ew aşîrxwaz û huqûqnasek bêhempa bû. Wana ne weke hacet lê weke armanc qebûl dikir. Merc çî dibûn bila bibûyana jibo pêkanîna wan bi şev û roj xebat dikir. Digot insanên me layiqî vana ne. Li ku dibe bila bibe perçiqandina mafê merivan qebûl nedikir. Berpirsiyarê Komela Mafê Merivan bû li mintiqê. Li himberî neheqiyê, zorê, huqûq diparast. Endamê Baroya Wanê û nûnerê Yekîtiya Baroyan bû.

Demokrasi jê ra bûbû rengê jiyane û di kûrayiya dilê xwe da kolabû. Di nav mala xwe da li gel zarokên xwe, li derva di nav dost û hevalan da, di nav gel da ji qaîde û hîmên demokrasiyê ra rîayet dikir. Bawer bû ku demokrasi weka nan û av ji gelê me yê bindest ra pêwîst e.

Şewket endamê Meclisa Belediyeya Tatwanê bû. Li wê mafê gel diparast. Demek serokiya liqa Tatwanê ya SODEP û SHP kir. Paşê bû serokê DEP'ê li Tatwanê. Heya şehîdbûna wî jî serokê DEP'ê bû li Tatwanê.

Edebiyatzanekî hêja

Edebiyat li cem Şewket ne hobî bû, perçeyek ji jiyana wî bû. Gelek mesele û pirsên edebiyatê, hêja dema ku di dibistana mamostayan da xwendiyê bala wî kişandiye, li ser wan serê xwe westandiye. Dikariya bi se'etan li ser wana nîqaş bike.

Xwendevanekî pirr baş bû. Kutubxaneke wî yê dewlemend hebû. Ez dikarim bêjim piraniya klasîkên cihanê û Tirkiyê xwendibû. Di wan mercên bêmecal da li ser edebiyata Kurdan lêgerîn dikir. Li ku helbestek Kurdî didît, di bin dest da belav dikir. Ehmedê Xaniyê nemir, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Cîgerxwîn û nivîskar û helbestvanên din ên Kurd nas dikir. Bi dehan helbestên wana jiber dixwend. Te te'ma edebiyatê dikarî jê bistenda.

Şagirdê xwe tim teşwîqê xendinê dikir. Wî li ku salixê berhemeke hêja dibihîst mitleq bi dest dixist. Yanî bi kurtî evîndarê xwendinê bû.

Nivîskariya Şewket

Şewket ne tenê xwendevanekî hêja bû, herweha helbestvan û nivîskarekî hêja bû jî. Hêja di xortaniya xwe da dest bi nivîsandinê kiribû. Hem bi Kurdî hem jî bi Tirkî dinivîsand. Zimanek paqij û zelal diemiland. Berhemên xwe carna bi navê xwe yê 'eslî, carna jî bi navê Dilbirîn diweşand. Gelek nivîsar û helbestên wî di nav rûpelên Dîcle-Firat, Deng, Mücadele (li Diyarbekir), Mücadele (li Sêrtê), Varlık, Türk Dili, Uyanış (kovara Eğitim Enstitüsü ya Diyarbekir), Tarancı (kovara Halkevi ya Diyarbekir) da weşiyane. Di helbest û nivîsarên xwe da li ser êş û jana gel disekine. Ezê di dawiya vê nivîsarê da du numûne ji helbestên wî bidim.

Wî di xortaniya xwe da digot "Ez êşekê dikşînim, lê navê wê nizanîm". Lê paşê karî navê êşa xwe bêje. Wê êşê bi hezaran ra bi yek dil û bi yek deng anî ziman, li meydana, di xwe pêşandan da. Êdî bi milyonan insanên me îro agahdarên vê êşê ne. Vêga li saxbûna vê êşê digerin, bi her awayê têkoşinê. Hêsa be birayê hêja Şewket, hêsa be. Wê êşa me baş bibe. Heke em nebînin jî wê Şîlan û Bengîn bibînin û wê bên li ser gorra me mizgîniyê bidin me.

Şehîdbûna wî

Hêzên tarî, di 25'ê Mijdarê, hêvarê se'et heştan da bi keysperestî ew revandin. Roja 26'ê Mijdara 1993'yan termê wî li ser riya Norşîn-Bedlîsê hat dîtin. Keysperestan bi bêbextî dabûne ber gullan. Di wî halî da jî rûken bû. Bi hêvî û xurûr temaşa insanan dikir. Zordestan nikaribû pêşî li kena wî bigrin. Ew gula azadî û aşîtiyê bû.

Gorra wî li Tarwanê ye û li ser gorra wî -bi Tirkî- wisa hatiye nivîsîn: "O bir özgürlük gülüydü, hep öyle kalacak." Yanî "Ew gulek azadiyê bû, wê tim wusa bimîne."

Roja şehîdbûna wî rê û bend ji terefê zordaran va hatin girtin. Nehîştin ku gelê melayiqî wî merasimekê cenazê çêke. Çawa ji jiyana wî ditirsîyan, herwuha ji termê wî jî ditirsîyan. Lê bi awakî nedîtî, bi rojan bi hezaran û her celeb insan hatin şîna wî. Guh nedan tirs û tehdîdan. Ev jî nîşana hizkirina Şewket bû.

Vêga gava payîz tê, refek min digre. Dilerizim, dilê min zîz dibe. Navêmin êdî payizan rengê zer, pelên daran ên li erdê û melûlbûna kesan. Tirs û xof dikevin nava min ji vê rewşê. Gelo ezê xebereke reş a din jî bibihîzim? Ez zor didime xwe ku dilê min piçek hêsa be. Lê sed mixabin, hêsa nabe dilê min. Gelo hûn dikarin dilê min hêsa kin? Ez tenê tiştêkî dibêjim: "Mîrin, bila navê te bêbext be."

Ez du helbestên Şewket ji Tirkî werdigerînim Kurdî û pêşkêş dikim:

DİYARBEKİR-AMED*

bi axîn û zarîn dûxanek
bilind dibe ji Diyarbekir
bi hawar û qêrîn digrî yek.
ev Dîcla min e
xirbik, kûlube û sûr
demên borî û yên bên yad dike.
dayîk, xuşk û rûyên xemgîn,
xayînên kevn û derebeg
gav bi gav negerre li Amedê
tu yê werem bibî werem...
nêzîkî
nexweşxanê, ewlekariyê, dibistanê
nebe!
tu nikarî bijî
ku wîjdan û îman bi te ra
hebe.
guh nede ax û derdan
û zare-zaran
bikeve cîyekî bêpencere
bila pîyên te
tehemmula nalîna axê nekin
nexwe dê Diyarbekir bi agirê xwe
bipirtîne te,
tu dê bibî weka Kerem.

* Navê vê helbestê bi Tirkî "Diyarbekir-Amidî" bû. Cara ewil di hejmarê 5. a Dicle-Firatê (1. 2. 1963) da derketiye. Şewket wê demê helbest û nivîsên xwe bi nasnavê Dilbirîn diweşand.

ÇIYA**

hevqas axîn we neda daxistin
qirn û sal borîn
ne hûn heliyan,
ne jî yekbûn...
li ser serê we dûxan
we belav nekir mij û moran.
nalîna ku pêça we girt
yeman bû, pir yeman
we rê neda, kesî nebihîst.
ev çiyayên bi berf, hêrs û dûxan
xayîn, xedar û xemgîn
rê bidine tavê...

** Navê vê helbestê bi Tirkî "Dağlar" bû. Cara ewil di hejmara 8. a Dicle-Firatê (14. 5. 1963) da derketiye. Şewket wê demê helbest û nivîsên xwe bi nasnavê Dilbirîn diweşand.

Ez pîrr sipasî kek Hemreş Reşo dikim ku arşîva xwe ya dewlemend ji min re vekir û min ev helbest û hin tiştên din peyda kirin.

HÊNDÊ LAYENÎ KULTURÎ KOMARÎ KURDISTAN 1946 III

Kerîmî Husamî



Le gotarên berê da me basî pêkhanîni tiyatroy Daykî Niştiman kir. Ev tiyatroye le hoşyarkirdinewey heştî netewayetî da rolêke mezin yarî kir. Piştî rageyandinî komar rojî 2'y Rêbendan û pêkhênanî Hukûmetî Mîllîy Kurdistan herçend gelêk dijarî nawekî û derekî le ser rêya pêşdeçûna komar hebûn, lê jibo hênde îslahatî civatî û dananî yasa û qanûnî pêşkewtîxwazane gawê mezin hawîştin.

Berê awakirina Komarî Kurdistan, melayên Kurd weha bîr dekir ku eger xutba heynî be zimanî Kurdî bixwênê, vedegerê. Mela şukrê Xuda şî be zimanî Kurdî nedekir. Le ser emrî Pêşewa Serekkomarî Kurdistan, le layen Hîzbî Dêmokrat be cenabî Mamosta Mela Huseynî Meccî îmamcum'ey Mehabad û Seyîd Mehemedî Hemîdî emir kira ku xutbey heynî bem corey jêrî bête xwêndin:

Xebat dijî xurafat; rêzgirtin le qanûn û dîn, saxlemî, awakirina xestexane, tesîrî emnîyet le serketinî niştiman, temeddunî Kurdistanî kewnare, birwa be xo bûn, giringî serbazî û erkî wî, erkî jin le komelî Kurdewarî, awakirina kûdekistan, giringî şorişwanî, yekêtî mîllî, dwarojî xerape û duzimanî.

Xutbey gund îş gerek her wesa bêne xwêndin.¹

Komarî Kurdistan dijî dizî û bertîlxwardin xebatêkî tundî dest pê kir. Bo pêşgirtin le bertîlxwardin, le layen Hîzbî Dêmokratî Kurdistan-ewe em biryarey xwarewe derçû:

Le ser qerarî Komîtey Merkezî Hîzbî Dêmokratî Kurdistan, be tewawî memûranî Hukûmetî Kurdistan radegeyênrê, herkes le her rêgayek, be her nawêk, le tumenêk ta

*çend tumen bo hêlsûranî karêkî şera'î ya qanûnî bertîl, rişwet bidat û ya werbigrê, le paş me'lûmbûn be xayînî mîllet û memleket dête nasîn. Mucazatî ew kesane-ş le 10 sal zîndan ta kuştin biryar dirawe.*²

Jibo emnîyet û asayîşî xelk fermanêkî Wezîrî Bergîrî Komarî Kurdistan, le rojnamey Kurdistan (hejmar: 95, Hozêranî 1946) bem corey jêrewe bilaw kirawetewe:

Be tewawî birayanî Kurd û hawniştîmananî Kurdistan radegeyendrê ke her karêkî xîlafî ûsulî demokrasî û birayeti le layen memûranî hêzî Kurdistan, ber le pêşmerge yan efer beranber be efradî netewey Kurd rû bidat, ya daway rişwe û tiştê din bo pêkhanîna karûbarêk biken, pêwîst e be zûyî karbedestanî hêz û î dîke agadar bifermûn. Eger pêçewaney ev bexşnameye refîtar bikrê, mucazatî her du la wek yek debê.

Komarî Kurdistan herçend le barî malî gelek destteng û nedar bû, belam bo yarmetî be feqîr û belengazan dirêxî nedekir. Le rojnamey Kurdistan (hejmar: 68, Pûşperî 1946) av agadariye bilaw kirabotewe:

Le layen Wezîrî Bêhdarî Kurdistan rageyenrawe ke ewaney feqîr û hejar in, namey îdarey şardarî le mer hejarî û nedarî xo-yan wergirin, be belaş mu'alece dekrên û derman werdegrin.

Hukûmetî Mîllî Kurdistan çend yasa û biryarî şer'î û civatî derkir, pesind kird; le wê rojê ta êsta le wilatanî Rojhelatî Navîn da yasay awa pêşkewtûxwaz pesind nekirawe. Wek: şirbayî wergirtin, redukevtinî jinî bemêr, beşûdanî kiç be zorî, hemû karêkî dûr le şaristaniyet yasax kiran û sizay tûnd-yan bo diyarî kira. Yasay taybetî bo xeyanet be Komarî Kurdistan, casûsî, bertîlwegirtin, rêgirî, tiryakkêşan, destdirêjî bo namûsî xelk be mucazatî giran pesind kiran û le rojnamey Kurdistan da bilaw kiranewe.

Hengawêkî dîkey Komarî Kurdistan, hênanî jinên Kurd bû bo korrî têkoşanî siyasî û kulturî. Yekêtî Jinên Kurd damezra. Jinên Kurd hatne meydanî xebat û têkoşan.

Dananî radyoy Kurdistan, sînemay Kurdistan, awakirinî kutubxaney mîllî beşêkî dîkey kar û siyasetî Komarî Kurdistan bûn le mawey 11 mang destelatî mîllî le salî 1946 da.

Xwênerî hêja bila karekanî Komarî Kurdistan berî 50 sal legel kirdewe û siyasetî hukûmet û hêzên serekî Kurdistanî Başûr muqayese bika û bizanê Kurd paş 50 sal çende pêşkewtûwe!

¹ Rojnamey Kurdistan, hejmar: 10, 51, Rêbendanî 1946

² Rojnamey Kurdistan, hejmar: 12, Rêbendanî 1946

DÎKRAN, NAZAR, XAÇO Û YÊ BÎNÎ

Migirdîç MARGOSYAN



Xino, dayka mi bî. Namey ya yo rast Xanimi bi. Bawkê mi tira vatinê "Xino". Hîrêsserra bi, bawkê mi reydi zeweciyaybî; a gami ra pey Xanimeya dayka mi qediyaybî, dewrê Xinoyey dest pey kerd bi. 'Esas ma hetî, namey keynan zewacî ra pey, kesî vatinê qey xwi bi xwi vuriyêno; Haçeri bînî Hiçê, Arşaluys bînî Erşo, Yexisapet bînî Exso, Nîvart bînî Nîvo.

Demewo ki namey keynan bînî namey cenîyan, wezifey yînî zî vêşî bînî. Hema ki namey keynan bînî namey cenîyan, qaydeyo ki no vuriyayiş taqîb kerdinî, ebi gore bê qanunanê tib'etî vêşîbiyayiş bi. Wezifey cenîyan o binkeyin o ki en tayn di serrî di rayêk yew qeçekardiş bi, dewam kerdinî; la çîdo en raşt û maqul herunda keyna di lac ardiş bi.

Gama ki dayka mi bî Xino, ma way û biray rêz bî û ma merheba day dîna. Pepaz Arsen, di serrî di rayêk, semedo ki ma ra yewî vaftîz biko ameynî keydê ma. Înay ra teber, Pepaz Arsen serrê di di rayî, roşanan di ameynî keydê ma, ma rê de'ey kerdinî. Qedinayîşê guredê xwi ra pey, yanî qaydê keydê ma rê, Hûmay ra xeyr û bereket waştîş ra pey, sedirî ser o ronîştinî, ebi keyf qawey xwi şimitinî û duy cixaraya xwi ya Gelinciki vay daynî. Pepazê ma, cixaraya Gelinciki ra teber sewbî cixara nêantînî. Rayêk çîdo 'eksî, gama ki Pepaz Arsen ame, keye di cixaraya Gelinciki çînêbî. Raştayê keydê ma di tena bawkê mi cixara antînî; yê zî Büyük Kulüp ra vîşêr sewbî cixara nêantînî. Dayka mi kotî ra, senêwa dîy, çend cixarey Bahari kerdî qutiya Gelinciki ya vengi û Pepaz Efendî rê îkram kerdî. Yo yan bide nêaqiliya yan zî xwi nezaney na, cixara xwi ebi keyfanti; qawey xwi şimit û şî. Labelê dayka mi, 'eybê nê gunîyo ki ver a Hûmay û Pepaz Arsenî kerd bi caran xwi vîr nêkerd.

Ma semedê seremoniya vaftîzî nêşînî kilîse. Pepaz Efendî ameynî keyanê ma. Eke to çend tasî awa şîrgerm bikerdîni teştêkê sifrênî, to destmalêk heze pêşmalî kesoy ki beno kerwa, yê ver a bibestîni, tira pey gureasan bînî. Der Arsenî, yanî Pepaz Arsenî gurey xwi zanaynî. Taneka xwi ra Încîlê xwi yo werdikek vetinî û dest pey kerdinî wendinî û de'ey kerdinî. Vengê Der Arsenî û vengê pitikê baneyo ki teştî zerre di çengeziyaynî, bermaynî, waqaynî tê miyan qelebiyaynî û ode ro pêşiyaynî. Odîy zerre di, pêl bi pêl berzbiyayîşê duyê rojinî û buya rojini reydi na tablo yew hewawo mîtolojîk girewtinî, gama ki vengê bari yê ardimkerdoxê Pepazî, Estedurî, eşnawiyaynî, pitik teştî ra vetinî; melhemo mubarek dest, ling û çaredê yê sawitinî û seremonî qediyaynî.

Seremoniya vaftîzî di, çîdo tewr muhîm, panayîşê namey qeçekan bi. Ay cayanê ma di, ez nêzana çîrê, la namey lacan vîşane Dîkran bi. Na mesela biney zî pabesteya namedê Diyarbekirî yê Armenîkî ya. Armenîkî namey Diyarbekirî, Dîkranegerd o. Yew zeman Qiral Dîkran nê cayan di ciwiyayo, him qandê xatirdê Qiral Dîkranî rê û him zî beno ki dayk û bawkan waştîni lacanê xwi hezey qiralî biveynî. Qando ki Dîkranî zaf vêşî bî û qando ki kes bişîyo yîni cê ra vejo, ganî yew leqama hergû Dîkranî zî bibînî.

– Şîma eşnawito gelo, Dîkran merdo?

– Kam Dîkran?

– Dîkranî Delu, cîranê kerwayê ma.

– De feqîr xwi rê merd, xelesiya.

– Şîma eşnawito gelo, Dîkranê Nonoy teskere girewto?

– Dîkranê Vanîşîyîni nêweş o.

– Dîkranê Dîkroy dindanî vetî. Ma ewro hebikan wenî.

Dîkranan ra pey, rêza diyini di, reyna nîzdî yê û ebi yê qafiyeyin, Dîran ameynî.

– Kam Dîran?

– Dîranê Tumasîyîni, Dîranî Derg, Dîranî Bêyom, Dîranî Boça Gezîy, Hacî Dîran, Dîranî Lal, Dîranî Hêrsok...

Nê namanê qafiyeyian ra pey yê hîrinê zî bîy. Nê Xaçoy bî. 'Esas peyniya heme nameyan xwi ver o biriyaynî û kilmi biynî. Kesî derg nêkerdîni, nêvatinî Dîkran yan zî Dîran. Dîkranî bînî Dîkro, Dîranî bînî Dîro, Xaçadurî bînî Xaço.

Xaçoyan ra, şînasîyanê mi miyan di, verî verkan xalê mi estbi. Xaçoyo Kureçî, xalê mi kureçî bi. Mi gore, xalê mi mêrdîmo tewr qudretinî û hêzinê dîna bi. Nimacê dosere ra çakuçê xwi yê gird ê kureçîyey girewtinî xwi dest û dest bi gurîy kerdinî, hetanî mexrebî bê ki bibeteliyo, bê ki 'eciz bibo vatini "huh, huh" asinê surbiyayey orsî ser o kutinî, inheta-aheta tadaynî, tira sirsî, vaştîrî û qeydî viraştîni. (Qeydî, yew haceta rêzilîna a û keseka yay esta. Gama ki kesî herî û estorî berdîni çere, semedo ki durî nêşêrî, nê qeydî dekerdîni linganê yîni...) Nînan ra teber, çangalî, şîşî, mehtefî, toqmaqê beran û sewbî gelekî çiyê bînî... Yê hetanî şan, belay xwi asinanê surbiyayan sawitinî, hetana ki gore bê zerrba xwi yew şekil bido ci, ma

mumkun o ki kes bişiyoy nê mêrdimî ra qudretin û hêzin yewna mêrdimî bifikiriyoy?

Helbet gelekî mêrdimê qudretinî û qaremanî yê ki dîna di ciwiyay, estbî. Nînan ra yew zî -efsaneyaya ma Armenîyan di namey yê vêreno- Nazaro Kaç o. Nazaro Kaç yanî Nazaro Qareman. Yanî Nazaro ki ebi yew weşanayişê şimşêrî hinzar meyesî kiştî. La reyna zî mi sey îmanê xwi zanaynî ki xalê mi Xaçoy ra hêzinêr mêrdim hema dayka xwi ra nêbiyo. Hîris serrî ra ver, gama ki mi xalê xwi hetî nexaf antinî, mi na mesela ebi çimanê xwi dîyî. Nika, yanî çewres serrî ra pey zî hema na bawereya mi nêvuriyaya. Eke şima mi ra bawer nêkenî, ewro şêrî mehlaya Estembolî, Ferik¹ yê ki vîşaneyaya Armeniyanê ki Diyarbekir ra ameyî wica di manenî, Xaçoyê Kureçî yê Diyarbekirîjî persê û veynê, a gami şima zî heq danî mi. La eke şima reyna zî bawer nêkî, ay wext ferqê şima û Xaçoyê Kemaqilî û Serekuy çinîyo.

Xaçoyanê Diyarbekirîjan ra yew zî Xaçoyo Kemaqilî û Serekuy bi. Serey Xaçoy o xişn kuy mendinî yan kuy seredê Xaçoy mendinî kes nêzano, na yew meselaya asan niya; ma Armenîyanê Diyarbekirî bawer kerdinî ki kes nêşino na mesela hal biko. Labelê raştêya ki ma no be'dê musay, ez tiya nêvaja nêbeno. Aya zî na ya: hewawo ki yeno zanayiş, namey Xaçoyê Kemaqilî û Serekuy, kerwayê yê yê rastikênî û bawkê yê yê vafîzî, Kerwa Manoy, pa nê nawo. Xwira qeydanê Kilîsedê Surp Giragosî di, bawkê namedê yê (yanî keso ki namey yê pa nawo) nêamewo nuştîş yan zî ameyo virakerdiş. Ebi ay hewa, namey kerwayê yê yê rastikênî heze sîrrêk nimite mendo. Labelê qen'eto 'umûmî no yo û vajiyêno ki; bawkê namedê yê yan zî wazenî ma vajî dayka namedê yê, pîra ma, Kure Mama ya. Reyna sey yew raştêya tarîxî wina vajiyêno: rojê demewo ki birînî yenî dayka Xaçoyê Kemaqilî û Serekuy, Piruşî, şar vazdeno şono xeberî dano Kure Mama û vano:

– Eman hewar Kure Mama, lezi, lezi, Piruşî nika kura bibo ko bixelesiya!

Kure Mama, na pîra nêwenda ya ki hinda muyanê porê xwi yê henekerdî qeçeçanê Armenîyan rê dêkey kerda, ebi vazdayiş yena, ebi destanê xwi yê hunerinan û engîştanê xwi yê westayan dest bi wezîfedê xwi kena.

Labelê pitiko ki 'enê daykda xwi ra beno, ebi riki û ebi qerar xwi ver ro dano û nêwazeno bêro dîna. Herçiqas ki heme tecrube û xîretê Kure Mama çaredê yay di benî ereq û sey mircanan pîzedê Piruşî ser o ki bîyo heze ko, çip-çip dalpey kenî zî, weledî ra ne veng û ne zî hes vejîyêno... Mucadeleyê hîrê rojan û hîrê şewan ra pey, gama ki punê kergan di vengê dîkê qartî -seki henekanê xwi azanê meladê sibhay biko- û waqîya qeçekî tê miyan qelebiyênî; Kure Mamaya beteliyaya û halrakewta, ebi vengê xwi yê hersbiyayî dest pey kena û vana:

– Kutikzay kutikî, serekuy! To gan û îman mi ra girewt, to ez teqnaya! Raştayê ez endî serrî yo ki nê gurî kena, mi çîdo anasarên nêdiyo, fekê mi akerde mend, ez lal biya lawo! Lawo ti çi kemaqil î, serekuy î, lacê kutikî yî! Ti herunda ki sey mêrdiman serî ser o bêrî dîna, ti çi rê wazenî qini ser o bêrî?

Ebi inhewa leqama Xaçoy, Xaçoyê "serekuy" yan zî "kemaqilî" terefdê Kure Mama ra yena panayiş.

Xaçoyan ra yew zî Xaçoyo Solderz bi. Ay cayanê ma di, vêşaneyê Armeniyan sen'etkarî bî. Zafane kureçî, qelaçî, dêskar, nalbend, necar, subeviraşttox, qazikviraşttox yan zî solderz bîy. Cayîyanê Diyarbekirî, xortan, hina vêşî sewlî pay kerdinî. 'Esas nînanê ki solê boçikinî yan zî çaroxî pay kerdinî dewijî bî; paykerdişê solanê boçikinan yîni rê hina asan bi. Rengê nê solan siya yan zî sur bi.

Xaçoyê Solderzî, ebi westayeya xwi ya deştişê sewlan, dewanê Diyarbekir di vengani dabi. Sey hindîyanê xişnan ê weşan ê dendikgirdan ê Diyarbekirî, solê yê zî namedarî bîbî. Dewijî, dewanê nizdîyan ra semedê deştişê solan vazdaynî ameynî yê hetî. Îllehîm zî xortê ki newe bizeweciyaynî... Ebi Kurdkî vengayê daynî.

"Xaço Wista, solekî bide min!"

Şima fahm kerd nê? Yîni waştinî ki Westa ebi ziwane yîni solan biroşo. Xaço Westa qisekerdişê ziwane yîni di, hetta yewna lehçey Kurdkî, Kirdkî (Zazakî) di zî, yîni ra kemêr nêbi.

Xaçoyo Solderz yîni persaynî veynî çî reng solan wazenî. Meylê yîni vêşane solanê suran ser o bi, surî waştinî. Xaço Wistay serey xwi kendinî (wirnaynî), zimbêlê xwi tadaynî, tîkê çimê xwi yê çepî hina vêşî kerdinî, kulhaynî; tira pey ebi vatîşêk qer'î û qerarinî ver a xwi tadaynî dewijî û reyna ebi ziwane yê vatinî:

– Nêbeno!

Dewijan no xuy Xaço Westay, Xaçoyê Solderzî weş zanaynî. Demewo ki yê bivatinî "nêbeno", semedo ki bişînî nê "ney" bikî "e", peranê solan ra teber ganî gege yew dîko sur, gege yew kergi, gege yew tasa hingimênî, yan yew qîlika ruwenê kelî, yan çend hebî hakî yan zî yew sitlê mastî yo ki xwi reyra ardinî, heze xela bidaynî bide. Gama ki gege dewijan zî hezey Xaçoy fennî kerdinî û nêwaştinî peranê solan ra teber çend hakan, ruwenê kelî yan zî yew teşê penîrê tezî bidî ci, Xaço Westay 'eynaday kerdinî. Yîni rê derg û dila, bê ki 'eciz bibo behs kerdinî ki ay solê ki dikan di ronaye yê, roşiyayî; wayirê yîni kura bibî nika yenî benî, hetta vîst û çar mecîdan heqê solan ra teber yew sitilê penîrê lorî, yew heqbeyo muyin pirrê gozî yan zî yew sitilê helawî zî yîni ra bih girewto; peynî di vatinî:

– Nêbeno!

Kesî nêdiyo ki Xaçoyê Solderzî bê ruwen, bê hingimên bê hakan sewlî rotî, yew çiyoy anasarên yew westayê sey yê rê, yew solderzî rê kemane hesebiyaynî. Yû mêrdimo asarên nêbi ki şero yew dikandarî ra vajo "hela des hakan, yan zî yew kilo ruwenê kelî bide mi". Mêrdimo ki solê min ê boçikinî yê verîn û peyenî deştî zî Xaço Westa bi. Ez des serre biya, bawkê mi destê mi girewt û ez berda Xaço Westay hetî û Armenîkî tira va:

– Xaço Westa, Xaço Westa, dixusî yemenî mi gare!

Yê zî serey xwi têşanabi, seki vajo "beno, beno"; tira pey vatbi "Helbet ez virazeno, helbet ez lacê to rê solanê boçikinan virazeno". Lingê mi peymawitî. Ne hingimên, ne vamî û ne zî mast waştbi. Xwira nêşaynî biwazo zî. Bawkê min û Xaço

Westa 'eynî dewi ra, yanî Herîdan* ra bî, ameybî Diyarbekir û tiya di mendbî. Herdî zî wistay kayê damîy bî, tê reyra kay kerdinî. Gama ki ez vana dame, ez qalê ay kayo ki şiyês siyanê sipîyan û şiyês siyanê sîyayan reydi kay beno û kayê satrancî maneno, kena. Labelê siyê damedê yînî, a gami çi yînî dest bikewtinî ay çîy bînî. Gama ki dest bi kay bikerdinî, eke siyê yewî bezrey zeytunan bibînî ê yê bînî nehey bî; eke yê yewî dendikê hindîyan bibînî ê yê bînî dendikê beşîlan bî. Wirdinî zî Kirdkî (Zazakî), zîwanê xwi Armenîkî ra weşêr qîsey kerdinî. Înay ra teber bawkê mi, dindanê kerminê Westay pey gazi antbî; dindanê zerrênî yê ki fekê Westay ê xişnî di gama huwayîşî di asaynî, bawkê mi viraştîbî. Xaço Westay dindanê xwi yê zerrênî dewijan nawitinî; ebi inhewa biney reklamê bawkê mi kerdinî.

Xaçoyan ra yew zî Xaçoyo Zîvker bi. Di xususîyetê yê bî. Yê yewini, yew westayê baş ê zernî bi. Yanî tena rotox û erînayox nêbi, viraşttox û xeliqnayox bi. Xalê mi Xaçoyê Kureçî senê asin ganî kerdinî, Xaçoyê Solderzî senê heyat daynî çermî, yê zî abi hewa gan û şekil daynî zernî û sêmî. Destanê yê di zern gilangan bînî yew xaço zarîf û viyedê keynekanê resayan ra ver bi sînedê yînî şendeliyaynî, gilangan bînî yew bazino çimkewte û qevda destî di şingaynî. Zerno ki bînî goşare, goşanê keynekan ra leqaynî, dans kerdinî. Zerno ki bînî engîştiriyo têmiyankewte, engîştira xortan di bînî pers.

Ma bêrfî xususîyetê yê diyinî ser, Xaçoyo Zîvker di tepîştîşê maseyan di zî yew westayo baş bi.

Ez nêzana şima zanî, çemê Dîcle no çend seserrî yo 'ardî hezey herfa "S" seqneno, hezey marî hokan dano xwi û seya bedenê Diyarbekirê yê tarîxî û namedarî ra ebi neseliyayîş û ebi awdayîşê newalêka heray, bê ki 'eciz bibo herrikiyêno û şono.

Heme rojanê kirêyan di, demewo ki dosere ra Kilîsey -Ezîz- Surp Giragosî di Pepaz Arsenî û ardimkerdoxê yê Estedurî, dest bi de'eya Arawud Lusoy (Serêsibhayê Roşnî) kerdinî, gama ki vengê zengê kilîsî (No zeng tuncê somî ra viraziya bi.) Mehla Xaçepeci di yan zî ebi name bê xwi yê bînî Mehla Gawiran di -Armenî heme na mehla di mendinî- çiringaynî, Xaçoyê Zîvker -ebi Armenî Voskerîç Xaço- rewna torra xwi ya maseyan eştbî şeledê xwi û şibi çemê Dîcle ver. Xaçoyo Zîvker, şekildayîşê zern û sêmî di çendi westa bi, tepîştîşê maseyanê tewr lezetinan ra "şebbot"an, "sirînk"anê girdan û xassan di zî endî westa bi. Înay ra teber, te'm û keyfê ruwenê zeytunan ê surkerdî reyra maseyanê surbiyayan hetî akerdişê yew şuşaya reqî yan zî şerabê keyî yê lezzetinî, Xaço Voskerîçî vîşêr kemî mêrdiman zanaynî.

Mabênî Pepaz Arsenî û Xaçoyê Zîvkerî caran weş nêbi. Hetta yew roj gama ki Xaçoyo Zîvker nişka ve ra nêweşî ver dekweno cili miyan, dayka yê Tuma Lengî -ebi name bê xwi yê keynekey Tuma Rindî- vazdayîş reydi, de lengayey senê vazdenî ya zî abi hewa, ebi lenglengo û gindirbiyayîşî, yena key Pepaz Arsenî û ebi lebiyayîş vana:

– Pepaz Efendî, Pepaz Efendî, se beno xeyrê xwi bê Xaçoy ser o biney Încîl biwani! Biwani ki wa weş bo, zaf serd girewto belengazê mi, hezey tura meyvi recefiyêno, mêrdim vano qey ko nika satilcan bibo...

Pepaz Arsen ver a xwi ta dano Tuma Lengi, qali nêverdano bide keno û vano:

– Herê Tumê, Tumê, ez nîna ay lacê to ser o ki rojanê kirêyan nîno kilîse û we'zanê muqeddesan nêgoşdareno, Încîl nêwanena. Ez gunekarey nêkena. Ti şo ay lacê xwi yê gunekarî ra vaji, wa çemê Dîcley ver di venga maseyanê "şebbotan" bido û wa yê bêrî yê rê Încîl biwani!...

Xaçoyan ra yew zî cîranê ma, Xaçoyo Kor yan zî Keçel bi. Belê, kor û keçel... Xaço, verî ki keçel bibo, yanî verî ki gerr vejo, yanî verî ki porrê yê birişo, tena tira vatinî Xaçoyo Kor. Şima raşti persî, çimê Xaçoy endi korî nêbî ki bindi çîy nêveyno. Tena veynayîşê yê kemî bi. Qeçekêda xwi di çimê yê trahom bîyî. Na nêweşî, ay wext ma hetî zaf bî û heme cayan ra vila bibî. Çimê yê timi heway gonî surî bî. Se qeçekêk ki bîlla sebeb bermeno, sey qeçekanê bermokinan, rigirewtan, çimê yê timi hesrinî bîy. Demewo ki bala xwi bidaynî çî ser biewniyaynî, çimê xwi bineyna antinî pê ser; a gami to binê mujeyanê kilman ê yê di, çiman ra vîşêr qafê darêka kufikiyaya dîynî.

Demewo ki Xaçoy, Xaçoyê Korî leqama xwi ya diyini zî girewti û namey yê bi Xaçoyo Kor-Keçel, hemînî ra vîşêr dayka yê Wak Esteri ver kewti, helbet Wak Esteri ra zafêr zî Rozina Çilmini ya ki no name leyaqê mêrdedê xwi nêdînî, 'eteriyay. Yay no name caran qebul nêkerd. Wak Esteri hetî na leqama diyini lacê yay rê neheqeyêk bî û ya vatinî ki lacê yay caran ne kor û ne zî keçel biyo. Hetta vatinî keso rind û şabeweşo anasarên kem esto û serey Xaçoy o keçel çicanê xwi yê xişnan miyan şanaynî, destê xwi tiro kerdinî, lewî padaynî û deyîrî eştinî ser û vatinî:

"Caran keçel niyo no Keçel

"Esas berberî rê rîçal o no Keçel"

Yewna Xaço zî, "Xaço Xwazgînê Mi" bi. Xaçoyo Xwazgînê Mi terzî bi. Yê şalwarê en weşê ki binê yelegê çewresgocaginî di pay bînî û qumaşê qabardînî ra bîy, rengê yînî kesko neftin, şalêno tarî û pancêy yînî biney şeqatey bi, deştinî. Yû zî sey Armenîyanê bînan ê ki Diyarebekir di ciwiyaynî, ehlê guredê xwi bi. Gama ki Kurdanê dewijan reydi qisey kerdinî yînî ra vatinî "xwazgînê mi". Cuwera namey yê bi Xaço Xwazgînê Mi û no name yê ser o mend.

Ebi gore bê tanî tarîxzanayan, beyntarê Kurdan û Armenîyan di têkilîyê nîzdî yê tarîxî estî. Çendi rast a ez nêzana. Çendi rast a, çendi hêşkewta ya, ganî kes Xaço Xwazgînê Mi ra biperso; rasteya na mesela eke bizano tena yû zano.

Tirkî ra tadayox: J. ESPAR

* **Herîdan:** Yew dêwa qeza Pîranî ya. Dewleta Tirkan namey na dewi kerdo Kırkpinar. (J. Espar)

BÊBEXTIYA SEYÎD Û FENEKÊN XEMGÎN

Botan Amedî

Ji rojan îne bû. Hemû dikan û ciyên alvêre girtî bûn. Belam rojên îne li Îranê tetîla fermî bû. Xemgîn jî wê rojê nedixebitiya. Her çiqas li derve, di nav dost û nasan de wî jî li gor pêwistiyên herêmê pîr behsa dîn û îman, Xwedê û Pêxember, rojî û nîmêj, şertên îslamê û îmanê û hwd. dikir jî, wî nîmêj nedikir û rojî jî nedigirt. Bi awayeke din ew bi dizî, zilamekî rafizî bû. Wê roja îne jî ew neçûbû nîmêja îne. Piştî ku Xemgîn firavîna xwe xwar qedere seetek vezeliya, raza û paşî rabû, dest û rûyê xwe şûst; çaya ku xanima wî amade kiribû vexwar û ji mal derket. Wî li taxa xwe çend ger piyase kir û paşî çû li çayxaneyek li nik hevalekî xwe yê Azerî runişt.

Li ser daxwaza hevalê Xemgîn, wî kokakolayeke cemidî vexwar. Dema Xemgîn dest bi vexwarina kokakolayê kir, her du hevalan dest bi sohbetê kirin. Eha di wê demê de di deriyê çayxaneyê de bi navê Seyîd, kalemêrekî hecî û sofî yê rûspî hat hundûr û raste rast ber bi maseya wan ve hat. Seyîd dema gîha nik maseyê, silava Xwedê li wan da. Xemgîn û hevalê xwe rabûn ser piyan, kursiyêk ji Seyîd re nişan dan û bi giranî wî dan runiştandin. Piştî ku hal û wextê hev û du pirsîn, Xemgîn ji sofî Seyîd re çayek xwest. Dema çaya Seyîd hat, wî hem dest bi vexwarina çay kir û hem jî dest bi axaftinê kir.

Seyîd dizanibû ku Xemgîn westayê xaniya ye û wî jî dixwest ji xwe re xaniyeke du tebeq bide çêkirin. Bûbû neh-deh roj ku wî kolan u xiyabanên Tebrîzê serobino kiribû û bi çend westayên dîwaran re bazara çêkirina xanî kiribû. Lê ew hin negîhabû encameke heyînî da ku westayek xaniyê wî çêbikiraya. Belam wî dixwest xaniyê xwe erzantirîn bide çêkirin. Ji ber vê yekê bû ku bi rojan li westayê erzan geriyabû. Seyîd û Xemgîn bazara çêkirina xênî kirin. Lê di navbeyna wan de ferqiyata peran hebû. Bo vê yekê hevalê Xemgîn di navbeyna wan de navcîfî kir û wan li hev û du anî.

Xemgîn, pazdeh roj paşî xaniyê ku di destê wî de nivco bû tewa kir û dest bi çêkirina xaniyê Seyîd kir. Xemgîn digel emeleyên xwe ve qederê sê meh xebitîn û li gor daxwazên Seyîd xanî xilas kirin. Di navbeynawan sê mehan de, di her 15 rojan de carek Seyîd heqê Xemgîn dida. Lê her carek 5-6 hezar tumên kêr dida. Dema xênî tewa bû, cara dawiyê wan hesabên xwe dîsa kirin. Li gor hesabên wan ê dawiyê ku her çiqas hinik dirav Seyîd da Xemgîn jî, ew 30 hezar tumen ji Xemgîn re deyndar ma. Li gor sozê Seyîd ku dabû Xemgîn, dê deh roj şunde 30 hezarê ku mabû bidaya.

Roj li pey rojan hatin çûn. Deh rojên Seyîd û Xemgîn bi bayê bezê zû tewa bûn. Di vê navbeynê de qet deng ji Seyîd nehat. Malxirab gohên xwe kerr kiribûn, çavên xwe girtibûn û zimanê xwe jî biliandibû. Mirov digot qey ew ne deyndar e, yekê din deyndar e. Piştî ku deh roj xilas bûn, Xemgîn sê rojên din jî sebir kir û her gav û seet rêpanê Seyîd kir. Lê çî Seyîd, çî hal... Seyîd, dema li sukê rastê Xemgîn dihat, qet li ruçikê wî jî nedinêrîya. Te digot qey ew Xemgîn qet nasnake. Dema 13 rojê Xemgîn derbas bûn û tu hes ji Seyîd derneket; ew çû mala sofîyê xwe û deynê xwe jê xwest. Wexta Xemgîn behsa diravê xwe kir, Seyîd bi awirekî şermîzar destê xwe avêt ruyê xwe yê dirêj, tevda, mizda, firikand û ruyê xwe yê lihevketî bi tiliyên xwe çêkir û weha bersîva Xemgîn da:

– Bibexşîn axa. Welleh û bîlleh, bi navê Xwedê û bi serê Hezretî Îmam Xumeynî perê min li nik dostekî min e. Divê wî çar roj berî bianiyaya. Lê mixabin hin neaniye. Îşşallah di vê derengketinê de tişteki bêxêr tune. Ez dê du rojên din jî rêpanê wî bikim; ger ew di van du rojan de nehê, ez dê herim ba wî, perê xwe bînim û deynê te bidim. Xuda heq e, deynê te jî li min heq e. Bi sozê navê Xudayê Alemîn, ez dê ta sê-çar rojên din pereyên te bidim. Qusûrê min nenêre axa. Dîsa min bibexşîne.. Ez li hember te şermîzar im û pîrr pîrr mehcûb im...

Xemgîn, li hember bersîva sofî hustûxwar berepaş zivirî û çû mala xwe. Wî vê mezereta sofî tişteki tebîî dîtibû û dema çû malê, di rê de difikirî û ji xwe bi xwe re weha digot:

– Sofî Seyîd heq e. Tiştên weha têtin serê her cuwamêrî. Hewce ye ez jî çar-pênç rojên din sebir bikim. Ma qey qiyamet ranabe. Welleh sofî jî rast xeber dide. Deyndarê wî, diravê wî neaniye; îcar feqîro çî bike? Ew qey di vî emrê xwe yê kal de, bi ruyê xwe yê spî û bi wê dîndariya xwe min naxapîne. Bila bi xêr be, bila heftreyekî paşê be. Çawa bibe dê sofî sozê xwe bîne cîh û çar roj şûnda dê deynê min bide. Di rojên teng de hewce ye ku mirov alîkariya hev û du bike. Belam di jiyane de her mirov muhtacê miroveke din dibe. Ev jî qanûna jiyane ya tebîî ye...

Bi rastî Xemgîn mirovekî gelek saf, dilpak, temîz û bi hurmet bû. Wî qet nizanibû xapandin, fenek, bêbextî û tiştên nehênî û xirab bîne aqilê xwe. Wî, hemû mirovên din jî wek xwe dihesiband.

Di navbeynê de çar rojên din jî derbas bûn. Li gor qisedanê sofî, divê îcar deynê Xemgîn bidaya. Lê wexta roja çaran jî xilas bû, bû şev û sofî nehat mala Xemgîn;

êdî ew bê sebir bû û ket şupheyê. Heta nivê şevê jî wî rêpana hatina sofi kir. Lê hevî û rêpana Xemgîn badilhewa bû. Roja pênc û şeşan jî wî sebir û rehemulê kir û roja heftan sibehê zu rabû, taştêya xwe xwar û rast çû mala Seyîd.

Dema derîyê sofi Seyîd lêket; wî texmîn dikir ku dê Xemgîn bihêt mala wî û deynê xwe bixwaze. Bo vê yekê Seyîd dil nedikir ku derî veke. Lê dema cara duwemîn û sêyemîn zengila derî lêket, êdî ji neçarî ew hat derî vekir. Bi silav û beyanî bi xêr a Xemgîn ve sofi destê xwe dirêjê wî kir û xêrhatina wî kir û wî ber bi hundûrê hewşê ve bir.

Seyîd, cîh ji Xemgîn re nîşan da ku danîşe û hustûyê xwe li ber Xemgîn xwar kir û bi awayeke fedîkar weha dest bi axaftinê kir:

– Axa, min bibexşîne. Ez pirr pirr fedîkar im li hemberê te. Lê ez çi bikim? Ew segbavê dostê min hîn perê min neaniye. Îro-sibê dike. Bi navê Xwedê û Pêxember û bi serê Îmamê mezin Hezretî Îmam Xumeynî, ez dê perê te bidim. Lê divê tu piçek zêdetir sebir bikî. Ez pirr fedî dikim ku tu werî ber derê min pere bixwazî. De bibêje ez xulam, bila xanim ji te re çayek bîne. Ger te taştê nexwariye, taştê jî hazir e.

Xemgîn nehêst ku sofi axaftina xwe dirêj û tewa bike û hema ji nîşka ve rabû ser xwe û weha gore Seyîd:

– Binêr sofi! Tu di emrê bavê min de yî, rûyê te jî spî ye. Dêrê serê derdan tu hem hecî yî hem jî sofi û kalekî dîndar î. Ez bi xwe fedî dikim ku werim ber derê mala te û ji te deynê xwe bixwazim. Lê ez dibînîm ku tu qet fedî nakî nayî nik min rewşa xwe û tengasîya xwe ji min re qise nakî. Ger te fedî bikiraya, ji vî emrê xwe yê kal, tu dikaribûyî bihata mala min û mezereta xwe ji min re bigotaya. Lê ez li derve, li xîyaban û li kuçan, dema rastê te têm; tu çavên xwe ji min dizivirînî. Ma ev cuwamêrî ye, ma ev hecîrî û sofirî ye, ma dîndariya te weha ye? De bibêje, ez çawa bikim? Ma ez ji te re bi mehan nexebitîm? Min di bin germa havînê de hindik xweydana xwe rijand, ma ez neheq im ku deynê xwe bixwazim? Binêr sofi, tu dibêji îro-sibê ango sê-çar roj paşê û xûya ye ku paşîya van rojên te nahêt. Ez nûha diçim, ji te re deh rojên din wext didim. Lê deh roj paşê ez tu mezeret qebûl nakim û perên xwe ji te distînim. Erê, baş e?.. Divê îçar tu werî mala min û deynê min bidî. Temam, ez diçim û çaya te jî venaxwim. Yallah, Xuda hafîz..

Xemgîn, gelek hêrs bûbû û xwîna wî bilind bûbû, hatibû tîtaleka serê wî û hindik mabû ku bi rûyê hecî bigire; wî bavêje bin lingên xwe û di ser zikê wî de here û were. Hecî jî li hember wê hêrsbûyîna Xemgîn çil zer bûbû; bûbû wek şimayek û destêkê xwe avêtibû rûyê xwe û hustûyê xwe xwar kiribû. Dema gotinên Xemgîn xilas bûn û wî xwest dest bavêje derî veke û xwe bavêje derê hewşê, sofi bi awayeke fedîkar û sucdar serê xwe piçek bilind kir û weha bersîva Xemgîn da:

– Baş e axa, min bide xatirê Xwedê û Pêxember, min bide xatirê Hezretî Îmam Xumeynî yê mezin. Bi serê te û wan, bi şeref û namûs, deh roj şûnda ez dê werim mala te û deynê te bidim. Qusûrê min nenêre û min bibexşîne axa. Haydê Xuda hafîz.

Dema Seyîd Xuda hafîz got, bi gotina xwe re destê xwe dirêjê Xemgîn kir. Lê

Xemgîn destê xwe dirêjê Seyîd nekir û bi awireke tel û enîçiqirî, tûj tûj li nav çavên wî nêrî û bi gavên lez meşîya, ji nik wî dûr ket.

Piştî ku Xemgîn meşîya, Seyîd deriyê hewşê bi awayeke guzim (pît) girt û berepaş ber bi odê ve çû. Jina Seyîd, Eyšan Xanim jî di şibaka metbaxê de li wî dinêriya. Wê, li ser qisedanên Xemgîn şibakê vekiribû û guhdariya wan kiribû. Eyšan dizanibû ku mêrê wê 30 hezar tumenê Xemgîn nedaye û ji ber vê yekê bû ku Xemgîn bûbû du car dihat mala wan û heqê xwe xwestibû. Eyšan Xanim jî, ji ber vê rewşa mêrê xwe pîrr eciz bûbû û diqeheriya û ji mêrê xwe tişteki fêhm nedikir. Dema mêrê wê hat ber deriyê odê ku derbasî hundur bibe; eha di wê demê de Eyšan ji metbaxê derket û bi lez hat ba mêrê xwe rawesta û weha gote wî:

– Seyîdê min, ez tu tişteki ji vê rewşa te fêhm nakim. Min axaftinên zilam û te guhdarî kir. Ma çima tu deynê wî nadi? Hemd û sena ji xwedê û îmamê me yê mezin re be ku perên me jî hene û em muhtacê tu kesek jî nînin. Lê tu çima welê dikî? Heyran, hema sibehê rabe here mala zilam û perê cuwamêr bide; bila careke din ew nehêr mala me. Ez bi xwe pîrr şerm dikim, nerehet dibim. Çi bi serê te hatiye, de bibêje ez bi qurban, çi li te qewimiye?..

Gotina dawiyê hin ji devê Eyšan Xanimê derketibû ku hema mêrê wê bi hêrseke mezin qêriya ser jina xwe û weha gote wê:

– De biteqize ji pêşberê min. Tu bi çi heqî têkelê karê min dibî? Ji te re çi lazim e. Ma tu bi vê jinîtiya xwe ve aqil didî min? Ez deynê wî segbavî didim, nadim ji te re çi? Haydê lez biteqize ji vir. Here karên xwe yên malê bike û eleqedara tiştên min neke. Poza xwe jî nexe nav kar û barên min. Ez careke din tiştên weha rijî û beredayî ji devê te bibîhîsim, ez dê zimanê te jêkim wellah û billah, temaaamm!..

Eyšan, li hember heqareta mêrê xwe pîrr şeqiz bû, fedî kir, sor û sorçiko bû; serê xwe xist ber xwe û berepaş ber bi metbaxê ve çû. Wê wek navê xwe dizanibû ku tişteki din ji devê xwe derxe, an îtiraza mêrê xwe bike dê çend şimaqên kafîstanî bixwe. Bo vê yekê bû ku ew bi lez û bez ber bi mitbaxê ve çû.

Xemgîn, dema gîha ber deriyê hewşa xwe, ji kerban û qehran dikir biteqiyaya. Serê wî di ber de bû û bi fikir û ramanên hur û kûr derbasî hundûr bû û li pêşiya eywanê tinuj da, paşê runişt. Dumaxa cixarê di her du kunikên pozê wî de derdiket, bilind dibû û di nav porê wî de belawela dibû. Mêşek ji difna wî bikeraya, dibû hezar perçe...

Jina Xemgîn Amîne, tu carî mêrê xwe hewqas bi keder û keser nedîtibû. Yekemîn car bû ku wê didît Xemgîn cixare dikêşand. Helbet ev, elameta xêrê nebû. Wexta Xemgîn deriyê hewşê vekir û kete hundur, wê firaqan dişûst. Amîne, ji ber vê rewşa mêrê xwe, firaqên ku di destê wê de nivco mabûn, danîn erdê û hema bi lez û bez ber bi wî ve çû, li nik wî runişt û dest bi axaftinê kir.

– Xêr e Xemgîn, çi qewimiye? Îşallah tişteke bêxêr nehatiye serê te. De zû bibêje, min di meraqan de nehêle. Çi bûye? Nebe xebereke xirab ji aliyê Tirkan, ji aliyê malbata te hatibe?..

Xemgîn, nefeseke mezin li cixara xwe xist, paşê ji devê xwe derxist, girt desteke xwe û axîneke kûr kişand û weha bersîva jina xwe da:

– Xêr mêr maye ma xanim, xanim? Ma tu nizanî ku ew bêşerefê soft çî tîne serê min? Ev bû çend car e ku min dixapîne. Ez êdî bawer dikim ku ev rûreş naxwaze deynê min bide. Îro-sibê dibêje, lê paşîya rojan nahêr û nîyeta wî ya dayîne xûya nake. Xanim, welleh ez ditirisim ev segbav paşî paşî serê min têxe belayek, destên min bixe xwînê. Welleh û bîlleh min îro gelek bi zehmet xwe ragirt. Hindik mabû qezayek ji destê min derketaya. Dîsa min jibo xatirê te û keça xwe, xwe zept kir. Ma ez neqherim dê kî biqehere? Ma êdî çî biqewime? Ma ez na, tu bibêje; 30 hezar Tumen jibo me pereyeke hindik e? Min bi mehan xwîn û xweydana xwe rijand, hewqas zehmetiyan kêşand û nûha ev bênamûsê sextekar dixwaze li min bade, bêbextiyê bike. Welleh xanim, êdî tu baweriya min bi van softiyan, heciyan, seyîdan, melayan û dîndaran nema ye. Ma yekê gawir jî tiştêkî weha tîne serê mirov? Axx, axxx.. Ez çawa hatim ketim ber deriyê van rûreşan...

Amîne, hema destên xwe avêtin destên Xemgîn, wî hembêz kir, piçek wî amoš kir û weha lê zivirand:

– Devê xwe bi xêr veke û tiştên weha neyne aqilê xwe. Dibe ku perê cuwamêr hezîr tunebe, ango destê wî di tengasiyê de be. Ma însanetî miriye? Helbet ew di vî emrê xwe yê kal de dê te nexapîne û bêbextiyê li te neke. Piçek jî sebir bike. Bi sebrê mirov digîhîşe miradê xwe. Ez bi qurban, behsa xwîn mînê, kuştin û miştinê jî qet qet neke. Ma tu xwe ji bîr dikî, tu li welateke çawa dijî? Tu li Îranê dijî, li Îranê. Tu dizanî ku li vir qanûna şerîetê heye. Piyên soft êdî li ber gorê ye û xwîna wî nake pênc tumen. Ger tu tiştêk pê bikî, welleh ewê nîzama melan jî te bikuje. Mirin jibo soft êdî îd e. Tu çawa tiştên weha difikirî û tînî ber çavên xwe? Sebir bike, îşellah paşîya sebrê selamet e. De rabe ser xwe, em herin metbaxê. Ez ji te re çayeke giran çêkim. Tu jî piçek ji xwe re vezele da ku kerbên te belawela bibin. De rabe canê min, evîndarê ber dilê min!..

Amîne destên Xemgîn girtin û wî rakir ser piyan. Paşî wî hembêz kir, bi hemû qeweta xwe wî şidand û wî ramûsa, ramûsa û her du bi hev re ber bi metbaxê ve çûn. Ji ber ku Amîne jî Faris bû, ji van kirinên softî pîrr diqeheriya. Lê wê, vê qehrandina xwe zêde nedidan nîşandanê û xîret dikir da ku piçek kerb û kelemên mêrê wê birevin, belav bibin, hêrsa wî dakeve. Bo vê yekê wê pîrr moral dida Xemgîn û çî ji destê wê dihat, teksîr nedikir. Bêguman, tişteke din jî ji destê pepûka reben nedihat. Wê di dilê xwe de çêri softî dikir û hezar nifir jê re digotin.

Herçiqas jibo Xemgîn deh roj hindik nebûn jî, dîsa roj bi bayê bezê li pey hev û du diçûn. Domandina deh rojan jî pîrr neajot û tewa bû. Lê tu hes ji Seyîd derneket. Di wan deh rojan de Xemgîn, hindik be jî xwedî hêvîyeke qels bû. Wî car carna di dilê xwe de rêpanê hatina Seyîd dikir. Lê piştî ku deh roj tewa bûn û tu hesek ji Seyîd derneket, êdî Xemgîn bi tevayî hêviya xwe ji Seyîd birî. Wî dusê rojên din jî sebir kir, lê çî Seyîd û çî hal.. Dêrdê serê derdan, li bazarê, li sukê an

li xîyabanan, li tu derî Seyîd xûya nedikir. Mirov digot qey erd qelişîye û Seyîd tê de xerîqîye. Piştî ku pênc roj jî li ser qewlê wan ket, Xemgîn vê rewşê bi xanima xwe re qise kir. Li ser pêşneyara Amîne, heft roj piştî qewlê wan, Xemgîn careke din çû mala sofî.

Dema Xemgîn sê car li zengila deriyê Seyîd xist, li pişt derî dengê xanima Seyîd hat û pirsî da ku kiye li derî dixê. Li ser bersîvdana Xemgîn, Eşşan Xanim derî vekir. Xemgîn pirsra Seyîd û rewşa deynê xwe kir. Lê Eşşan xanim got ku Seyîd çûye gund û hê ji gund neziviriye. Wê soz da ku dema Seyîd bizivire, ewê wî bişîne mala Xemgîn. Xemgînê bêçare careke din destvala û hustûxwar zivirî mala xwe.

Xemgîn ji kerban dikir ku biteqiyaya. Di navbeynê de deh rojên din jî derbas bûn; lê li tu derî sofî xûya nedikir. Xemgîn li her derî li sofîyê xwe digeriya. Ew ji ber ku di wan rojan de bêkar mabû, perên wî jî êdî li ser qedandinê bûn. Piştî pazdeh rojên din Xemgîn salixê sofî girt ku hatiye û li mala xwe ye û ji tirsan newêre bigere. Xemgîn çend rojên din jî sebir kir û dema ku bîst roj derbas bûn; ew êvarek çû ber derê mala sofî û li zengila deriyê wî xist. Wî dema cara pêncan li zengilê xist, sofî ji neçarîyê derî vekir. Beriya ku Xemgîn dest bi axaftinê bike, sofî weha gote wî:

– Malavayo, di vê seetê de dijminê mirov jî navêje ber deriyê mirov. Ma tu nikaribûyî sibehê wexta biyanî bihataya?

Sofî, hin dixwest axaftina xwe bidomîne. Lê Xemgîn ji hêrsan, zêdetir tehemul nekîr û weha gotinên sofî birî:

– Helal be ji te re sofî. Tu bi çî rûyî dikarî weha li hemberê min biaxivî? Ma tu qet fedî û heya nakî? Tu ji rûyê xwe ye spî qet şerm nakî? Tu çiqas sextekar û bêbext î! Û derdê serê derdan, ji hatina min a vir re aciz dibî. Ma qey ez ji kêfa xwe tîm vir? Deynê min bide û ez qet naxwazim zêde rûçikê te bibînim. Bi rastî, di bedêla te de êdî ez şerm û heya dikim. De bibêje, tu çima ji sozê xwe re sadiq nînî? Tu çima nehatî mala min? Te got deh rojên din, ev deh roj bûn mehekî. Ma paşîya rojên te wê kengê bihêt?

Seyîd jî zêdetir hêrs bû û weha gotinên Xemgîn birî:

– Min pere peyda nekîr û bo vê yekê ez nehatim mala te. Eha canê min ji te re. Tu dikarî çî bi min bikî? Ma tu dê jîbo peran min bikujî, ruhê min ji min bistîni? Hela hêrsbûn û heqareta wî binêre... Tu ji newalê hatî, bûyî xwedîyê malê. Derdê serê derdan tu zilot û pêxwas hatî vir, bi keçîkek Ecem re jî zewicî û bûyî xwedîyê mal û kar jî. Wek macîrekî tu çawa dikarî di ser min de biqîrî û heqaretan li min bikî? Ma tu xwe li çiyayê xwe azad dihesibîni? Careke din jî ez te li ber derê xwe nebînim. Ger tu careke din bêyî û min aciz bikî, ez dê gaziye polêsan bikişm û te wer bidim kutandin ku tu şîrê diya xwe ji bir bikî. Dema perê min hebe ez dê bînim bidim te. Tu têgihîştî? Haydê zêde min aciz neke, yallah!..

Seyîd, bi gotinên xwe yê dawiyê ve derî li ser Xemgîn girt û ew li dervayê derî ma.

Li hember van qisekirinên sofî, hindik mabû ku Xemgîn ji qehran dewxêlo bibe. Hemû laşê wî dileriziya. Wî qet nikaribû li piyan raweste. Hema li ber derî

wî tinuj da, paşê rûnişt. Bi her du destên xwe serê xwe girt. Qederê pênc deqîqe wehaserî di ber de rûniştî ma û bêhemdê xwe bi dengeke gelek nizim giriya, giriya... Ew bûbû wek dîkekî serjêkirî û li erdê dipirpitiya. Mîrov xencerek lêxistaya, dilopek xwîn jê nedihat. Piştî der-dora deh deqîqe derbas bû, wî piçek hiş û aqilê xwe top kir, cixarek derxist vêxist. Du-sê nefes lêxist û hêdî hêdî rabû ser xwe û bi gavên sisto misto ber bi mala xwe ve meşiya.

Wî wek mirovekî serxweş ku nikaribe li piyan bisekine, bi gelek zehmetiyan xwe gîhand hewşa mala xwe. Wî bi zehmetî deriyê hewşê li pey xwe girt û hema xwe avête erdê û bi dengê bilind dest bi girînê kir.

Bi dengê girîna Xemgîn ve Amîne ji nav livînan rabû û bi bayê bezê hat hewşê nik mêrê xwe rawesta. Revena pepûk heyîr û matmayî mabû. Xemgîn li erdê dirêjbûyî dipirpitiya. Amîne xwe avête ser wî, wî hembêz kir û weha dest bi axaftinê kir:

– Oyy.. oyyy... Ez bi heyran û qurban. Ez texmîn dikim ku wî bêşerefê sextekar dîsa tu destvala şandiyê. Piçek were ser xwe ez bi qurban. Xwedayê Alemê mezin e û îşallah dê bela serê wî bide. De rabe, rabee... Wek zarokan xwe li erdê negevîzîne. Ma tu ne mêr î? Piçek li xwe veeqile. Tîşt tên serê cuwamêran. De rabe ser xwe, dê dengê te here cînan. Di vê seerê de dê cînar şiyar bibin. Rabe em herin hundûr, ger tu bixwazî dîsa bigirî, ew êdî qîma te ye.

Xemgîn, qet nedixwest ku rabe. Wî teseliya xwe tenê di girînê de dîbû û herweha derd û kulê xwe ji hundûrê xwe derdixist derve.

Amîne li nik Xemgîn rûnişt; serê wî piçek bilind kir, linga xwe ya çepê dirêj kir, xist bin serê wî, jê re kire balgiyek û bi her du milan wî hembêz kir. Bi destêkê xwe porê Xemgîn miz da; bi destê din du qumçeyên îşlikê wî yên jorîn vekirin. Ji singê wî ta hustû û ser û çavên wî tev da, miz da, xweydana wî paqij kir. Paşê ji porê serî ta navokê maç kir, maç kir û devê xwe xist guhêkê wî, bi dengeke pîr hêdî lavelav kir, xwe qurban û heyran kir da ku Xemgîn girîna xwe bisekinîne, rabe ser xwe û digel hev herin hundûr. Amîne, wek dayikeke kezêşewitî ku çawa mindalê xwe amoş dîke, jê his dîke û dil pê dişewitîne; ji mêrê xwe re welê kir. Ew rewş û kirinên Amîne li ser Xemgîn tesîreke gelek mezin hişt û wî hêdî hêdî girîna xwe birî û bersîva hembêzkirina wê da. Hêdî hêdî ew digel hev rabûn ser xwe; milên xwe di bin çengan de li hev û du pêçan û ber bi odeya xwe ve bi gavên piçûk meşiyên.

Dema ew di deriyê eywanê de hatin hundûr, Amîne bi lez xwar bû, destên xwe avêtin piyên mêrê xwe da ku bi awakî hêsatirîn solên wî derxîne. Piştî ku sol ji piyên mêrê xwe derxistin; ket bin çengê wî û ber bi livînê ve çûn. Dema ku Xemgîn li ser doşekê vezeliya, careke din dilopên hêstiran wek barana buharê hurik hurik ji çavên wî hatin xwarê; xwe di her du aliyên hestîya difnê de berjêr niqutandin. Xemgîn ji kûrahiya cegeran ve axîneke kûr kişand û bi dengeke nizm dest bi axaftinê kir.

– Axx, axxx!... Xanim tu dizanî îro çi bi serê min hatiye? Xwezî ez kerekî aşvanek bama; bila ez mirovekî ji neteweyêke dîl nebûyama. Dê aşvan her roj barê min li min bikiraya; li min suwar bûbûyaya. Lê dê aşvan qedr û qîmeta min jî bizanibîya.

Xweziya ez seyekî şivanê ber pezan bûbûyama; lê ez endamê miletekî bindest, kole û kolonî nebûyama. Belam qedr û qîmeta lawirek ji ya mirovekî kole pirrtir e. Jibo mirovên kole tu qîmet tune. Berî her tiştî tu maf û heq û huqûqê koleyan tune. Tenê û tenê mafekî wan heye ku divê ji koledaran re koletiyê bikin. Binêre xanim, nûha ez û tu zewicandî ne, me keçikek jî heye û em malbatek in. Lê ez û tu ne wek hev in. Tu xudan dewlet î, xudan al î, xudan erd î, xudan dîrok î, xudan qedr û qîmet î û welhasil tu xudan her tişt î. Lê ez?.. Ez ne weha me!.. Ez xudan tu tiştekan nînim. Nûha pasdar bêtin vir û te ji min bistînin û çî bixwazin bi min bikin, ez dê çî karibim bikim?.. Bi kurtî ez nikarim tu tiştekan bikim, belam ez hem kole me û hem jî li vir mihacir im..

Li wir Xemgîn gotinên xwe hîn tewa nekiribûn ku Amîne gotinên wî birîn û weha gote wî:

– Hellah hellah, heyran tu çî dibêji, welleh ez tu tiştekan ji van gotinên te fêhm nakim. Ma çawa ez û tu ne wek hev in. Ger polês bêt, dikare min jî bibe. Herçiqas tu li vir mihacir bî jî, tu jî li vir azad î. Ma qey dewleta Îranê jî xêra xwe re te û bi hezaran mihacirên din qebûl kiriye? Ez têngahîjim tu çîma weha diaxivî? Çîma tu hewqas li xwe heqaretan dikî? Jibo wî segbavî ku li te badaye û deynê te nedaye, dibe ku tu van tiştan bifikirî?

Dema Amîne gotinên xwe xilas kirin û sekinî, Xemgîn du-sê nefesên din jî li cixara xwe xist, piçek sekinî û carek din weha gote jina xwe:

– Xanim, xanim, ez şaş nafikirim. Li vir welatê te ye û ez mihacirek im; loma tu kes qedrê mirovan nade min û yên wek min. Tu dizanî, segbavê hecî îro ji min re çî got? Hecî hem deynê min neda, ez xapandim û li min bada. Wî segbavî, bi vana jî qîma xwe neanî û ji min re got ku carek din divê ez neherim ber derê wî û wî eciz nekim. Ger ez careke din herim wî eciz bikim, dê gaziyê polêsan bike û min bide kutandinê. Li gor sofiyê sextekar, ez xwe wek li çîyayên xwe azad hîs dikim ku ev şaş e û ez ji newalê hatime bûme xwediyê malê. Dîsa li gor wî segbavî, ez wek mihacirek zilut hatime vir û bi keçeke Ecem re zewicîme û bûme xwediyê mal û hwd.. Xanim, divê tu jî baş bizanibî ku ger ez ne Kurd bûma û wek mihacirek nehatama vir, ev bênamûsê nijadperest nikaribû van gotin û heqaretan li min bikiraya, ev yek. A duduyan, polês dema bixwazê dikare te jî bibe, ev rastiyeke. Lê divê tu ferqiyeta min û xwe baş bibînî. Ez hem mihacir im û hem jî Kurd. Tu jî dizanî ku Kurdên li vir jî ne xwediyê mafên xwe yên neteweyî ne. Wek min Kurdên li vir jî kole ne û ji hemû mafên xwe yên neteweyî, mirovatî û demokratîk bêpar in. Erê, sazumana melan li ser we jî teda û zilmê dike; lê ferqiyeta vê teda û zilmê di navbeynawe û Kurdan de ne piçûk e, ferqiyeteke pirr pirr mezin e. Belam dewlet, dewleta we ye. Her tiştên we yên neteweyî heye; lê yên me, tu tiştekan nîne. Loma ez dibêjim ku qedr û qîmeta lawiran ji ya koleyan zêdetir e. Ger ez jî li ser axa xwe bi awayeke azad bijiyama, gelo vî bêşereftî dikaribû perê min bixwaraya. Na, na! Tu jî dizanî ku dê ev tişt çênebaya. Jibo ku tu baş têbigihîjî ez dixwazim numûneyeke

din bînim bîra te. Tu jî dizanî ku piştî tûfana ku li Kurdistanê Başûr hat serê me; em bi dehhezaran Kurd ji neçariyê hatin xwe li sînoran xistin û derbasî Kurdistanê Rojhilatê bûn. Lê li ser xaka vê perçeya welatê xwe bûn mihacir. Vê rewşa hanê, mirov nikare li tu welateke cîhanê nişan bide. Yanê rewşa Kurdan, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku li seranserê cîhanê, ya herî xirabtir e. Mirov li ser axa welatê xwe bibe mihacir û ev mihacirî jî li gor peymanên navnetewî bi resmî nehêt qebûlkin. Ma di dinyayê de ji vê rewşê xirabtir tiştek heye? Ez ne bawer im ku wek rewşeke weha xirab hebe. Çima rewşa me hewqas xirab e? Ji ber ku welatê min Kurdistan, di Rojhilata Navîn de di navbeyna Tirk, Ecem û Ereban de bûye çar perçe û ji aliyê wan ve hatiye vegirtin û Kurdistan bûye kolonî. Min çend car jî te re jî gotibû, neteweyê Kurd, ji 10 hezar salan kevintir e ku li ser van erdan dijî û tu car nexwestiye ji vir here dereke din. Yanê, esil xwediyê vî welatî ew in; kolonyalîst ji derve hatine û van deran xistine destê xwe. Wek segbavê hecî dibêje, ez ji newalê nehatime û nebûme xwediyê malê; lê kolonyalîst ji newalê hatine û bûne xwediyê malê. Eha, ev rewşa me Kurdan û îro jî bi taybetî wek mirovekî Kurd a min, ji ber van sedeman pîr xirab e û loma em li her derê heqaretên nedîtî dibînin. Nûha hecî qerara xwe daye ku perê min nede. Ka ez dê çi bikim. Ez baş dizanim ku ger wî bidim mehkemeyê jî ez dê nikaribim tiştek li ser bêjîngê bixim. Belam qanûna wan a îslamî jî li gor wan e û heqê koleyên wek min naporêze. Ka tu bibêje, aqilê te çi dibîre?

Xemgîn, hîn axaftina xwe didomand ku Amîne rabû ser xwe û jê re got ku ew dê here metbaxê çayeke çêke.

Dema Amîne çû metbaxê, Xemgîn jî digel kêşandina nefesên cixarê, dirêjbûyî ket nav xeyalan û jiyana xwe ya berî wek şerîda sînemayê di ber çavên xwe de derbas kir. Şerîdê sînemayê ya jiyana Xemgîn bi kurtahî weha dihat ber çavên wî.

Xemgîn dema ku ji Kurdistanê Başûr koçber bû û derbasê axa Kurdistanê Rojhilatê bû, ew hîn xortekî 19 salî bû. Di jiyana wî de qonaxeke nû dest pêdikir. Ew jî wek bi hezaran penaberên Kurdên din, di destpêka jiyana macirtiyê de rastê gelşên teze dihat. Wî di xewna xwe de jî wan gelş û astengan tucar nikaribû bibîne. Feqîro neheq jî nebû. Ma di wê emrê cuwaniyê de dê çawa bizanîbiya ku koçber bibe û here welateke din û rastê hewqas gelşan bibe.

Jibo Xemgîn jiyana nû gelek ecêb dihat. Kambaxa zeman jî qet nedisekîniya. Seet li pey rojan, roj li pey hefteyan, hefte li pey mehan, meh li pey demsalan û demsal li pey salan bi bayê bezê pêşda diçû. Herwek bi dehan, bi sedan, bi hezaran, heta bi deh hezaran penaberên din, Xemgîn jî dixwest bi hemû hêz û qeweta xwe ve li pêşîya zeman bisekine, bi benê wî bigire û bide rawestandî. Wî qet nedixwest ku zeman hewqas bi lez pêşda here. Lê çi fêde bû ku ev fikir û daxwazên wî badilhewa bûn û tu kesek nikaribû çerxa pêşdaçûna zeman bide rawestandî ango zivirandin.

Di navbeyna sê-çar mehan de Xemgîn li gelek gund û bajaran, li tax û kolanan

geriya û geriya.. Ji Sêro ta Zêwe, ji Zêwe ta Rajan, ji Rajan ta Nexede, ji Nexede ta Ûrmiye û ji Ûrmiye ta Tebrîz gelek geriya; tax û kolan serobino kiran, rê û xîyaban li hev pêçan... Westandin çibû, wî qet nizanibû û digeriya. Mirov digot qey wî aqilê xwe wenda kiriye û wek dînekî eware li pey tiştan digere, digere û qet wan nabîne...

Xemgîn, du zaravayên Kurdî dizanibû. Zaravayên Kurmancî û Soranî. Ji ber ku ew li Kurdistanê Bakûr, li herêma Gewerê ji dayik bûbû; di zaroktiya xwe de ji dê û bavê xwe zaravayê Kurmancî hîn bûbû. Piştî ku derbasê Kurdistanê Başûr bûbû, li nik Kurdên Soran jî zaravayê Soranî hînbûbû. Bo vê yekê Xemgîn, li Kurdistanê Rojhilat, bi awayeke hêsa ji xwe re dost û hevalên Kurdên li wê herêmê di demeke kurt de peyda kirin. Lê peydakirina dostên Ecem û Azerî, jibo wî ne hewqas hêsan bû. Belam wî ne Farisî dizanibû û ne jî Tirkîya Azerîyan. Jibo fêrbûna wan zimanan, ji Xemgîn re wexteke dirêj hewce bû. Ji ber gelşên zimanan, li hinik deran wî zehmetiyan dikêşandin û diqeheriya.

Ji bilî zimanan jibo Xemgîn gelşa herî mezin, bêguman domandina jiyana nû bû û hemû gelşên wî bi hev û du ve girêdayî bûn. Herçiqas wî du-sê sal li Kurdistanê Başûr xizmeta şoreşa netewî kiribû û wek pêşmerge jî demeke kurt xebitibû, lê dîsa wî nedixwest ku demeke dirêj bêkar û bêemel li xerîbîyê, li ser piştê rêxistinê an dewletê jiyana xwe bide domandinê. Vê rewşê wî gelek diqehrand û jibo çaredîtîna ew di runê xwe de diqijiriya. Di dawiyê de ji neçariyê be jî wî heliyek dît û biryara xwe da. Ew çû, li bajarê Tebrîzê, li nik hevalekî xwe cîwar bû û li ser çêkirina xaniyan wek emele dest bi xebatê kir.

Xemgîn, qederê salek u nîv wek emele xebitî û di wê demê de westatiya xaniçêkirinê hîn bû. Dema wî wek westayê xaniçêkirinê dest bi xebatê kir, êdî rewşa wî ya aboriyê jî ber bi başiyê diçû. Li bajarê Tebrîzê karê xaniçêkirinê hebû û pîr dirav diket destê westayan. Êdî minera Xemgîn ji tu kesekî tunebû. Ew bi hêz û qewet bû û keda xwe difiroto û bi saya serê keda xwe jiyana xwe didomand.

Bi dengkirina Amîne ve Xemgîn jî xeyalkirina bîranînên xwe yê berê vecinîqî û rabû, rûnişt. Jina wî jê re çay anîbû. Her du digel hev rûniştin û dest bi vexwarina çayê kirin.

Roja din Xemgîn gelek dereng, der-dora azana nîvrojê şîyar bû. Belam wî şeva berî ta şefeqa sibê ji kerban nikaribû raze. Dema ku ew rabû û çû hewşê dest û rûyê xwe şûst, firavîna wî jî hazir li benda wî bû. Piştî xwarina firavînê, Amîne pîr jê tika kir ku êdî zêde li ser segbavê hecî nefikire û di jiyana nû de rojên xwe bidomîne û li derve jî qet bi hecî re şer-mer tişteke neke. Li ser şîret û ricayê Amîne Xemgîn jî soz da ku dê vê gelşa xwe û hecî ta karibe ji bîr bike.

Wek hemû mirovan, jibo Xemgîn jî jiyana berdewam bû û bi bayê bezê pêşda diçû. Her ku wext zêde diçû, Xemgîn jî perê xwe yê li hecî jibîr dikir. Lê bêbextiya hecî, li ser dilê wî bûbû wek kulekî. Xapandina hecî, jibo Xemgîn bûbû derseke girîng jî. Ji ber vê yekê bû ku Xemgîn dema ku karê xaniçêkirinê digirt bazara xwe

bi xwediyê xaniyan re qethî û vekirî dikir da ku beriya karê xwe tewa bike perê xwe hemû bistîne. Êdî baweriya wî bi wan sextekaran nedihat.

Di navbeynê de salek û niv derbas bû. Rojek hewariya kurê hecî, Hesên hat. Hesênê kurê Seyîd, di cengê Îraqê de digel gelek hevalên xwe hatibû kuştin. Dema cenazê wî anîn, Xemgîn jî li gor urf û edetan çû ser mezel û di şîna wan de jî sê roj beşdar bû. Lê hecî dîsa perê Xemgîn nedianiya ser xwe.

Herweha jiyana nedisekîniya. Dema bîranîna 40 rojîya kurê hecî hat, nas û dost û cînarên hecî qasî hefteyek li mala hecî dîsa şîn kirin. Di nav wan mirovan de Xemgîn jî hebû. Xemgîn jî, dema ku roja ewil a 40 rojîyê hat, digel cimetê çû ser mezel û paşî hemû çûn mala hecî. Qederê niv seet derbas bûbû ku Xemgîn dixwest destûra xwedî malê bixwaze û rabe here. Lê wî, du-sê hefte berî ji dostekî xwe yê Ecem meselokekî dînî bihîstibû û wê meseloka manewî di mejiyê wî de hinik pîrs hiştibûn. Roja ku Xemgîn hat 40 rojîya kurê hecî, wî di serê xwe de wêneyek jî çêkiribû û loma dixwest ku beriya rabe xatir ji cimetê bixwaze, wê wêneya xwe ya nexşîn pêşberê cimetê bike û paşê here. Xemgîn, jibo ku nekeve heyecanê xwe baş şidand û di demeke misaît de ji cimetê re bi awayeke pîr ciddî û bi uslûba dîndarekî weha got:

–Rehma xwedê li Hesênê me yê şehîd be. Min şeva çuyî rehmêtî di xewna xwe de dît. Hal û wextê wî gelek baş bû û kêfa wî jî di şûnê de bû. Dema ku em rastê hev hatin, me hev hambêz kir, maç kir û rûniştin dûr u dirêj sohbet kir. Min jê re behsa vê dinyayê kir û wî jî ji min re behsa bexçeyên bihiştê kir. Piştî sohbeta me ya xweş û dirêj wî xatir ji min xwest û bi rê ket. Lê dema ew ji min dûr ket, linga wî ya rastê dikuliya. Dema ku min fêhm kir ku kulek e; min deng lê kir da çî bi serê linga wî hatiye. Wî ji min re got ku ew jî nizane ka sedem çiyê û dema ku bixwaze lez bimeşe ango bazde, linga wî ya rastê pê re naçe û dikule.

Piştî ku Xemgîn xewa xwe xilas kir, cimet hemû bi yek dengê gotin:

– Na, loo! Înşallah bi xêr be axa! Allah û ekber, Xumeynî rêber!..

Paşê di nav cimetê de kalekî herî bi emir weha ji Xemgîn pîrsî:

– Ma kurê min, nebe ku di navbeyna te û rehmêtî de tiştek hebe? Ev elameta xêrê nîne. Miheqqeq derdekî wî heye loma kulek bûye. Heger tiştekî wî tunebe, em hemû dizanin ku şehîd e û ciyê wî jî li bihiştê, ciyê herî bi qedr û qîmet e. De ji me re rast bibêje kurê min, di navbeyna te û şehîd de qet gels hebûn?

Xemgîn, qet nesekîni û hema bersîva kalo da:

– Na welleh û billeh, bi serê şehîd û îmamê me yê mezin Xumeynî, di navbeyna me de tu tiştek çênebûye û li taxa me hemû jî dizanin ku min û şehîd ji hev pîr hez dikir. Em her du wek bira bûn û ji ber min de xweş helal be û ciyê wî jî bihişt be.

Piştî bersîvdana Xemgîn, îcar kalo berê xwe bi Seyîd ve kir û eynê pîrsê ji wî kir: Seyîdê bêbext piçek rûyê xwe tev da, enirî û weha got:

– Heyran welleh, bi navê xwedê û bi serê Îmam Xumeyniyê mezin, di neqeba min û rehmêtî de tu car gels çênebûye û ew ji ber min ve xweş helal e. Lê ez nizanîm

elameta xewa vî zilamî çiyê. Ez jî meraq dikim. Îşellah Xwedê lê bê rehmê û linga wî jî rehet bibe.

Piştî bersîva hecî, di navbeyna kalemêrên cimê de gelek mînaqêşe çêbûn. Xemgîn qedere nîv seetî tenî guhdariya wan kir û weha ji cimê xatir xwest:

– Bi destûra we be ez dê herim mal, karê min heye. Destên min ji sohbeta we ya xweş nabin, lê ez divê mecbûr herim. Jibo şehîd jî xeman mexwin, ciyê wî bihişt e.

Piştî ku Xemgîn ji wir qetiya, cimeta kalemêrên sofîyan hîn rûniştî bûn. Xemgîn jî di rê de bi xwe re di bin lêvan de dikeniya û bawer dikir ku dê şanoya wî ciyê xwe bigre. Ji ber vê bîr û baweriyê jî Xemgîn dema gîha malê dev bi ken bû û ev rewşa wî bala jina wî jî kêşandibû. Loma jina wî ji meraqan sedemê kêfxweşiya mêrê xwe pirsîbû û Xemgîn jî bi kurtahî bersîva jina xwe dabû û gotibû ku berdewamiya vê şanoyê jî dê rojek paşê li eynê malê û di eynê cimê de dubare bike.

Xemgîn, wê şevê gelek bi kêfraza û şanoya ku di cimê de nîşan dabû, divê rojek paşê jî dema cimê di şînê de kom bibe dubare bikiraya. Li ser vê heziriyê Xemgîn roja din, piştî nimêja nîvro berê xwe da mala Seyîd.

Dema ku Xemgîn ket hundurê odeya ku cimê lê rûniştibû, hemû ji ber wî rabûn û xêrhatina wî kirin. Piştî ku Xemgîn runişt, jibo şehîd fatîheyek xwend û cimê jî wek edet digel wî fatîhe xwendin. Piştî ku fatîhe û duaya Xemgîn tewa bû, kalemêrêk dest b axaftinê kir û weha ji Xemgîn pirsî:

– Kurê min, tu bi xêr hatî. Çavên me hemû cimê li hatina te bû. Îşellah te xebereke xêrê ji me re aniye. De bibêje lawê min, te dîsa şehîdê me dît an na?

Li ser vê pirsîyarê Xemgîn req li nava çavên kalemêr nêrî û weha bersîv da:

– Erê welleh, min şeva din jî rehetî dît û qasî nîv seet me bi hev re qise kir. Lê wek min duh jî got, dema ew meşiya, dîsa linga wî kulek bû. Ew ji ber vê rewşa xwe pirr eciz dibû.

Xemgîn hîn dixwest ku gotinên xwe dirêj bike, lê cimê nehişt û hemû bi dengê kirin hellah hellah. Paşî Kalemêrê duyîn eynî pirsê careke din ji Xemgîn û hecî kir. Lê her duyan jî eynî bersîva duyîn dan. Piştî van pirs û bersîvan, kalemêrêkî din dest b axaftinê kir û weha gote cimê:

– Heyran welleh ewha nabe. Madem di navbeyna xort û şehîd de tiştêk tune ye û di navbeyna Seyîd û şehîd de jî tune ye. Divê em vê meselê îro hel bikin da ku şehîd li bihiştê zêdetir ezab nekîşîne û rehet raze. Tiştêkî din hate bîra min. Ma nebe ku di navbeyna vî xortî û Seyîd de tiştêk biqewime? De bibêje Xemgîn, kurê min, rast bibêje û fedî neke. Ma di neqeba te û Seyîd de qet gelşek çêbûye? Erê kurê min, tu çî dibêjî?

Xemgîn jî li benda pirsêkî weha bû û bi lez û bi bêsebrî dest bi bersîvdanê kir:

– Erê, welleh di navbeyna min û hecî efendî de gelşek heye. Hun jî dizanin ku min xaniyê wî salek û nîv berî çêkir û hecî ji min re 30 hezar tûmen deyndar ma. Lê hecî deynê xwe neda û hin jî deynê min nayne ser eynê xwe. Wî bi qesdî perê min neda.

Kalemêrê ku pirs kiribû, berê xwe da nav çavên hecî û weha bi lez jê pirsî:

– Erê, hecî, dengê zîlam hat te, tu çi dibêjî? Guhê xwe kerr neke û serê xwe jî neke ber xwe, li me binêre û bersîva me bide wek cuwamêran. Ma tu qet ji xwedê natirsî, ji kîjan sebebên te vî cuwamêrê cuwan xapand? Ma perê te tunebû?

Heciye sextekar, bi şermîzarî serê xwe bilind kir û bi îşareta hejandina serê xwe ve gotinên Xemgîn tesdîq kir. Mirov digot qey hecî li ser diziyê girtine. Li ser erê ya hecî, ji cimetê nerehetiyêke mezin û dengên hellah hellah a têkilhev derket û hemû bi aciziyêke mezin qêriyan ser hecî û gotine wî:

– Hecî, lez rabe ser xwe û perê cuwamêr anka bîne da ku şehîd li cinetê rehet raze. Ma tu ji vî emrê xwe û dîndariya xwe jî fedî nakî?

Lê hecî hustûyê xwe di ber xwe de xwar kir û weha bi şermîzarî bersîva cimetê da:

– Welleh ez nikarim hemû îro bidim û 30 hezarê min tune ye. Lê ez nûha dikarim 10 hezar bidim û bila ew jî min helal bike.

Xemgîn qet benda bersîva cimetê nesekinî û hema qehrê xwe nîşan da û weha got:

– Welleh ez tu car deh hezar qebûl nakim. Ma ez sedeqe ango fitre ji hecî naxwazim, ez heqê ked û xweydana xwe dixwazim. Û ez bi dehhezarî tu car wî helal nakim.

Li ser wê bersîva Xemgîn, cimetê, di nav wan de navcîtiyê kirin û ew li ser 20 hezarî li hev û dû anîn û hecî rabû 20 hezarê Xemgîn da pê. Qasî nîv seet paşê Xemgîn destûr stand û ber bi mala xwe ve meşiya. Di rê da bûbû biqê biqa wî û xwe bi xwe re digot:

– Kero hecî, segbavê segbav!... Ez di rûwê te de mîz kim segbaavv!.. Min ji xwe tasek ava cemidî li ser van peran vexwaribû! Dîsa ev bîst hezar jî ji tunebûnê çêtire.

Gulan 1990
Ûrmiye

GOZÊRE

Serdar Roşan

- 2 -

Bro û "Dibistane"

Roco yene bi. Ena serra ewilîne bî ku banêke di mehelaya corîne de bi namey "Dibistane" hamebi nawitiş. Banêkew di odeyin bi. Wahîrê banî kê xu berdbi şaristan. Bi yardimê dewican necarêke tanî kursî û masey viraştî; ban hame sîwaxkerdiş û weş nîno vîrê min labelê ez vana qey rocêkew dişeme bi, heme dewicî piya bi tûtanê xu, di verê banê dibistane de kom bî. Yewê serqotî ku tera vatêne "Xoca" qisey kerd, dimacû tûtî şî zerre û bay îne zî ageyray serê kar û xebata xu.

Wexto ku "memûrî" şaristan ra hamey û va "ma go di dewe de dibistanêke akerê", dewicî biney tersay; xu ra îne hete 'edet bi, çiyoy ku teber a, şaristan ra bihameyne tersêke vistêne zerra îne; vayê tersî xu îne ro piştêne; û heya ku îne ra hameyne xu ay "xerîban" ra dûrî girotêne. Dewican ziwan û qisekerdişê nê xerîban ra çike fam nêkerdêne. Neheq zî nêbî, hema bi enî halê xu ez zî ay "xerîban" ra aciz bîne. Seyîn nêbî? Min bi xu zî ziwanê îne ra fam nêkerdêne. E verûcû zî çend rey hameybî dewe, la hameyîş û şiyayîşê îne zehf balê min nêantbi; xu ra di dewe de zehf nêmendêne; hakerûna xu werdêne û şîne. Semedo ku min zanayne etya nêmanenê ez ne ziwanê îne musawa û ne zî ez çikew anayîn fikiriyawa. Cilê îne zî zey dewican nêbî. Tî raşte vacê heya enka dewican çî xêrêke ay "xerîban" ra nêdîbi. Gege ê-îne ra vatêne esker- bi sîleh hameyne dewe û tanî xortê dewe pêser kerdêne berdêne; gege tanê bînî zî hameyne dewican ra zerd û perey waştêne; yew yew rey zî kewtêne kê dewican, genim(xele), cew, nîske çî dest bikewtêne berdêne, vatêne semedê eskeran benê.

Brahîm tûtêkew hewtserre bi. Ê zî zey amveranê xu dest bi dibistane kerd bi. Kê bay Brahîmî di mehelaya cêrîne de bi. Wexto ku Brahîm şîne dibistane hameyne

hergû hewe di verê min ra viyartine. Xura verê ku dest bi dibistane bikero ez û we ma bîbî embazê yewbînan. Enka şima go vacê seyîn ti bi enî 'emrê xu yê vêşî yê dir bî embaz? Baş o, ez zî şima ra persena, gelo kal û pîrî seyîn torinanê xu dir benê embaz? Şikir Homay rê ku Brahîm zey şima nêfikiriya. Ê bêfikirkerdêşêkew derg embaziya min qebûl kerde û hergû hewe hameyne min hete. We biyayîşê xu ra heya eyro bi çimanê xu yê şîrînan hanyayne min ra. Çi rocêke xirabî an nebaşiyêke min ra nêdî. Wexto ku qic bi, di miyanê qumateke de bi; amnanan daya yê we di binê verestiya min de kerdêne hewn a. Tîrêjanê rocî ra pawitişê yê min rê kêfweşî bî; bi pelanê xu yê xişnan, bi berzbiyayîş û gurriya xu min bi se'eran we pawitêne. Hanyayne min ra û min zî ci rê xeberoşkê weşî vatêne. Pê kêfê yê hameyne û hewayne. Eger yewî bidîyne ku heweno, vatêne: "Melaketan dir kay keno û heweno." Çî nêbeno melaketî zî min rê xerîbî niyê, biney heqê min îne ser ro eşto, la...

Eyro Bro, bay xu û melay dewe şî li xizînan bigeyrê. Melay nuştayêke nuşt û di miyanê gîrrêşê de pişt. Waştişê bay xu ser ra Bro bêzerra xu şî dîkê îne wo sipe bi destan tepîşt; lingê dîkî girêday û we kerd zerrey tewreyêke hîray, la serey dîkî teber ra bi. Îne huwe û kulingêke zî xu dir berdî. Piya ver bi koyê pey dewe şî. Nîmse'etê ra pey di cayêke de ku şikê xizînan kerdêne dîk tewre ra vet; bi layêke sist nuşte milê dîkî wa girêda û semedo ku dîk nêremo layêkew derg zî lingê dîkî wa girêda û dîk vere da. Melay vatêne "dîk ça weng do û nikulê xu bido 'erd ro lazim o ûca bêro kendîş." Labelê dîkî çî cayêke de veng nêda. Broy dîkê xu kerd verika xu û yê ko ro kewtî diyar. Reya ewilê ra di qatî vîşêr şî. Enka di serê koy de cawo en berz de bî. Vatêne ku verûcû di serê enî koy de qesrêka mîrêke biya; a qesre di zelzeyêke de biya xirabe. Merdimê ku di qesre de bî pêro merdê û xizînay Mîrî zî binê xirba qesre de menda.

Broy rayêka bîne dîkê xu vere da; badê biney geyrayîşî, dîkî di cayan de veng da û nikulê xu da 'erd ro. Cayê ku dîkî nikulê xu dabi piro Broy bi qûçan nişan kerdî. Wexto ku enî çî bî, Mela û bay Broy nimacê nîmerocî ser o bî. Nimacî ra pey ê hamey û dest bi kendîş kerd û hinda di metran 'erd kend bê ku raştê çîke bêrê. Îne cay diyîne zî kend la ew zî veng veciya, bê xirba siyan çîke nêeysayne.

Çend cayanê binan de zî îne dîk vere da la dîkî nêwend. Ver bi şan ê bi awayêkew rîncan û destveng ver bi dewe kewtî rehîr.

Di miyanê dewe de Melay bay Broy ra xatir waşt û şî kê xu; Bro û bay xu zî ver bi kê xu hamey. Wexto ku Broy hame nîzdî min zerweş bi û nimitikî hewayne; ê dîkê xu tewre ra vet û vere da; dîk lezkanî ver bi keye vazda. Semedo ku çîke nêhame bi serey dîkê yê Bro di kişte bay xu de bi kêf û bi gamanê xu yê qican şî keye.

A enî hevalê min ê qicî dest bi dibistane kerd bi. Bi ters û heyecan şîne. Riyê yê ra kifş bi ku şiyayîşê dibistane ra zêde kêfweş nêbi. Rocêke min meraq kerd û min tera persa:

- Bro ti seyîn ê?

Bê zerra xu va: - Ez baş a, spas.

- Ti wazenê ma xu rê biney qise bikerê?

- Nê, eyro nê.

Min zî we zehf aciz nêkerd. Bro şî keye. Labelê we bêkêf û mirûzê yê tirş bi.

Ba'dê çend rocan Bro hame min hete la tenî nêbi. Çend hevalê yê yê dibistane zî tedir bî. Hamey ku xu rê bi kap û gozan kay bikerê. Ew roc kêfweş bi; qîrrayne, we û hevalê xu hewayne û vazdayne...

Min waşt ku ez te ra persî ka we wazeno ma qisey bikerê, la min xu bi xu va "Fek te ra verra de, nanik o embezanê xu dir kay keno, ez go semedê çî kêfê îne biheremnî". Ba'dê kaykerdişî embazê yê şî keye, we tenî mend. Hanya min ra û hewa. Zeke vaco "eger ti biwazê ma şikenê qisey bikerê". Min va "de ka bê". Hame min hete nişt ro û dest bi ci kerd: "Hevalê min o erciyaye, ti zanê ku ez to ra zehf hes kena; cuwe ra zî ez to ra çîke nênimnena. Ti zanê ku min zî emsarr dest bi dibistane kerd, eno middetêke wo ez şîna û yena; eke ez raşte vacî kêfê min dibistane rê nîno. Xocay ma bi ziwaneke qisey keno ku ez te ra çîke fam nêkena. Qeyboke ziwane yê û ziwano ku ma qisey kenê zey jobînan niyo, wexto ku ez wazena çîke vacî zî ez nêşkena. Ma eynanê ku emsarr dest bi dibistane kerdo heme bi ters û matmende -zey kerr û lalan- hanênê fekê Xocay ra. Min reyêke day xu ra pers kerd, ka çirê Xocay ma zey ma qise nêkeno, ya va "Xoca bi ziwane mektebe qisey keno. Biney sebir bike ti zî go bimûsê."

"Ti zanê ew roc wexto ku ti min persay ez çirê bêkêf û acizbiyaye biya? Ez vacî, ew embazê min o kelawisipî yo ku gama bine etya bi, ma piya kaykerdene, embazêke min o jêhati yo. Çend rocî verûcû Xocî te ra çîke va, labelê yê nêzana vaco çî, cuwe ra bêveng mend. Ay ser ra Xocî zehf da piro; qehr û dicayîş ver qasê nîmse'etêke berma. Yew embazê min ê bînî zî ay rocî, wexto ku ma bi nehan û fesûlyan çiyêke Xocî textî ser ro nûştîbî viraştêne, nêzana Xocî ra vaco "mîza min yena", nêşka xu tepîşo û di ortey sinife de binê xu de mîze kerde. Gelo ti bê ti go bêkêf nêbê?"

Gelo ez eşkayne vacî çî? Bi ziwaneke w bîn di dibistane de qisey kerdiş min rê maqûl nêameyne û zey neheqî eysayne. La min zî nêzanayne çirê ana wo. Coka zî min nêzanayne ka ez Broy ra vacî çî. Broy min ra bawer kerdêne û xu bi xu vatêne "Hevalê min o verîn heme çî zano;" çîmkî heta enka min hergû hewe cewabê persanê yê dabi. Labelê ez enka kewtebiya miyanê tenganî. Min hîs kerdêne ku nêzanayîş cîfê merdimî peysneno; lazim bi ku ez xu bi awayêke bifeletnî. Min 'efû bikerê min zî xu bi metodê kanî giro; yanî min va "Bro biney sebir bike, wexto ku ti bibê pîl ti go cewabê persanê xu bimûsê." Bi hanyayîşêkew xerîb hanya min ra; zeke vaco "Ti çirê min ra nêvanê, ka çirê ana wo?"

...



Wesar û Eskero Siya

Di binê tîrêjanê rocî de, hilmo ku 'erd ra wirzeno bi boy û mizgîniya wesarî dekerde wo. Vewre di qeracané koy de nêmanda, heliyawa. Di serê koy, cayanê berzan û çalan de, cawo ku zimistanî va û gijoleke vewre daybî pêser hema zî sipî kena. Hefteyêke ra pey go ya zî biheliya. Bi varte, wesarî, dereyê ku ko ra ver bi cêr yenê bi awa sûre û lişine benê pirrî; 'erdê qeracané koy û kiştanê dereyan her serra ku şîna hîna sist beno; ko bi xu zî bi 'emrê xu yê dergî şahidê enî awayî yo. Laserê wesarî ver, gege ana beno ku pes nêşkeno dere ra bivêro; dewicî bi zehmetî pesî viyarnenê; la hewna zî rey-reyan bizêke yan mêşinêke aw de şîna.

Di peyniya aşma Edare û aşme Nîsane de hindî wesar bi heme weşiya xu sere hewa dano û tebi'etî bedilneno. Tîrêjê rocî hergû roc hîna germ benê. Aw koyo bi vewre pişte 'ewilî cay xu pîneyanê siyayan, fistananê gewran û qehweyiyan rê verdeno; dimacû hêdî hêdî fistanêkew zergûn dano xu ra û roc bi roc hîna zergûn beno. Di qeracané koy de pirpizêk, pîvok, nêrgiz û gelêke çiçekê bînfî mizgîniya wesarî îlan kenê. Di destê îne de gulçanî tûtî di qeracê koy û miyanê 'erdan de pîvokan vecenê û aynan ra tacanê giloveran virazenê; ay tacan bi vilanê rengînan xemelnenê. Vaş roc bi roc beno derg û bi vilanê rengînan xemelêno. Di binê dewe de, dehlî ver bi asîman berzbiyaye, xu wesarî rê kenê hadre. Di miyanê dewe de, darê tuyan, tuyî şamî, romî û sipey vişkoyênê. Darê sayan, biyok, incas, mişmiş û xoxan bi vilanê xu yê rengînan di miyanê beçeyan de, darê vaman û miroyan di dormarê dewe û gege miyanê rezan de, dimacû darê hinaran bi vilanê xu yê sûran kêfweşî û boyweşî peyda kenê, rengêkew ciya ku merdimî mat verdeno, danê wesarî. Ena rey enî vilî di wextê wesarê de menzerayêka zey cennetî xuliqnenê. Ti vanê qey tebi'etî di musabeqey estaran de semedê xudestvistişê xelata yewine, renganê sût, zerd, sipî, binevşî, xemrî û pembeyan ra sentezêke nêdiyaye xuliqnawo û bi firçeyê xu yê tebi'î ena menzera viraşta.

Mêse engemîni han ê zimistan ra şiyarbiyaye, semedê xebatêka pîle kariyan ra vecênê; ver bi deryayê vilan perrenê û vilan ser o kay kenê, doş benê, nişenê ro, cewherê vilan gêne û ver bi kariyanê xu perrenê. Di zerey kariyan de qesranê sipîyan virazenê; ay qesrê ku mîmaran ro ca teng kenê û cîf piro peysnenê, bi sebrêkew zaf hîra sî bi sî yenê viraştiş. Paley keyî di binê emrê kebanî de zerre ra xebetênê û 'embaranê banî bi cewherê vilan kenê pirr.

Dewicî di miyanê bostanan, rezan û 'erdan de, di kar û xebata xu de yê. Hergû yew bi karêke mijûl o. Tanî rezan şelênenê, dormarê mêwanê engure kenênê, tanîna mêwan pêşenê, tanî zî di miyanê bostanan de cite kenê yan zî dormarê bostanan sinc kenê û birinanê beçeyan ku zimistan ra mendê derman kenê.

Mirîçikî, koterî û kekûy daran ser o, zerecî di miyanê leman û binê tehtan de, şalûlî di binê kendalan de, bilbilî di cawo berz de miyanê zinaran de hêlînanê xu virazenê. Şefeqê sibay ra heya şan vengê çûçikan û wendişê bilbilan ra hewa bi melodiyane debeno. Ver bi şan, wexto ku di pey dewe de zinaran ser o zerecî wanenê merdim heyran û heşmetkar beno. Rez û newalî di binê vengê îne de milûl benê. Ez nêzana şima qe goştariya wendişê zerecan kerdo yan nê? Eger şima nêkerdo lazim o şima wesarêke rehîrê xu etya ro bifînê û goştariya îne bikerê; ay çaxan şima go fam bikerê ka di miyanê tebî'etî de ciwiyayîş çî yo.

Di wesarêke anayîn de, şefeqêke, ma çimê xu bi qîrrayîş, hewar û bi lawayîşê kutikan akerdî; ma bî hêşyarî; la vengê kutikan û çekan têkilê yewbînan bibi; ba'dê wextêke kilmî veng kutikan ra biriya. Dewicanê ku fersend dî bi tersêkew zehf keyanê xu ra veciyay û ver bi newalan û zinaran remay; îne di pey zinaran û siyan de xu nimnayne û hanyayne dewe ra. Ay ku bi çekan hamey Eskerê Siyay bî. Di dewa ma de camêrdî kiştî; rehma yîne bi tûtan û ciniyan zî nêamî. Çiyê nêdiyayey ardî serey ciniyan û keynanê ma. Ez şerm kena behsê ay çiyay bikerî. Gelêke cinî û keyney semedo ku nêkewî destê ay bêînsafan xu zinaran ra eşt û merdî...

Ay bêînsafan banê dewe weşnay, pes û dewarî berdî. Merdimê ku destê Eskerê Siyay ra feletiyay bi koyan kewtî. Veyşan, perîşan bi hefteyan koyan ra mendî. Bextê îne rê wesar hamebi, hindî dinya germ bî û tarr zehf bi; xêrê ay tarrî(pincarrî) ra ê merg ra feletiyay; di xûrîneye newalan û zerrey şikeftan de mendî. Ba'dê ku eskerî mintîqa ra şî, yê ageyray dewa xu. La dewe nêmendebî. Dewicê ku weş mendîbî newe ra dewa xu awan kerde. Şikir Homay rê, ma nanik ê piya yê û 'erdê xu ser o yê.

Raştiko min nêwaştêne bi meselayêka anayîne menzarayê wesarê mintîqey ma xira bikerî. La destê min ra çî yeno? Ez behs nêkerî nêbeno. Herçiqas meselayêka nêweş û tehl a û merdim nêwazeno biyaro xu vîr zî, la eno çî qewmîyawo; loma zî lazimo bêro vatiş. Eskeranê Siyayan çirê ena dewe û gelêke dewê bînî weşnay û sebeb çî bi, Eskerê Siyay kam ê? Bi raştî ena mesela zehf derga! Xura zeke min verûcû zî vatbi, min cay xu ena dewe de giroto; qaso ku ez di serê 'erdî de cysena ez hende zî di binê erdî dewa. Ez nêşkêna şîrî bigeyrî, heme çî bimûsî. Ez tenê dormarê dewa xu û mintîqey xu ra weş haydar a. Ax ax, xêrê Homay rê di hergû ca de, di her dewe û mintîqa de heyatê verûcû û enkay bihameyne vatiş û nuştîş ku pê hemderdê min bivirazyayne û barê min pê şenik bibiyayne.

KONGRES

Zinar MÏSTEFA

↳ êva salonên torevanî li Awropa -yên ku nivîskaran û helbestvanan karên xwe yê edebî tê de dixwendin-, li rarekê ji tarên Qamişlo civatek hate danîn. Lê welatperwerên Kurd tê de behsa pirsên miletê xwe dikirin û çî bêtor û tomet hatin serê wî li ser destên wan hovên Tirkên, nemaze piştî şikestina şoreşa Şêx Se'îd -cihê wî buhuşt be- a sala 1925'an li Kurdistana Bakur.

Ev salon, di destpêka şêstan de li tara Qidûr Beg hate damezrandin. Pêşî mêhvanên wê ji mirov û cîranan bûn. Dûv re salon hino hino fereh bû. Nexasim piştî zeximbûna rola tevgera netewî ya Kurdî li Sûrî, di pey hilbijartinên parlemanî re (sala 1961), yê ku Kurdan di wan de bi hev re yekdestî beşdarî kirin. Herwisa jî serketinên mezin ên ku gelê Kurd li Kurdistana Başûr, di bin serokîya Mele Mîstefa Barzanî yê hêja de qizinc kirin ji salonê re bûne hemeteke nû, pê rol û kelîja xurtir bûn.

Û niha, piştî mirina wan kesan, ji bilî mamê me Mihemedê Zaza pê ve -Xwedê emrê wî dirêj bike-, em dixwazin wan pêşdaran û wê salonê bi xwendevanan bidin naskirin. Nexasim ku ez demeke dûvdirêj di xaniyê 'Eliyê Zaza de kirêdar mam û təkiliyên min bi pêşdaranê salonê re hebûn.

Ev salon bi xwe odeke piçûk bû di xanîkî Kurmancî de. Navê wê kirin "Kongrês" [Kongre], li ser navê kongrêsa Amerîka ya navdar. Vêca civat her şev di wextekî bellî de digerreha. Carna şevêrk zû germ dibû û pêşdar diketin qirika hev de. Lê paşiyê bêhna wan fereh dibû û li hev dihatin, çikû wan ti caran nikarûbûn dev ji hev bigerin.

Gelek mêhvan dihatin salonê. Lê yê ku her şev hazir dibûn ev bûn:

'Eliyê Zaza: Xwediyê salonê bû. Ewî roleke mezin leyîst di civandina van kesan de.

Mihemedê Zaza: Mêrxasê zemanê xwe bû li Kurdistana Bakur.

'Ezîzê Zaza: Hosta 'Ezîz mêrekî nestêleh bû. Ew ti caran ji soza xwe nedihate xwar. Mamê me 'Ezîz destbirakê xebatkarê Kurd, Osman Sebrî bû.

Mihemedê Silo: Berpirsiyarê nûçeyan û dengê Kongrêsê li Qamişlo bû.

Mele Hesenê Kurd (Hişyar): Nivîskar¹.

Mele Tahir Hamid: Dîndarekî pêşverû bû. Nivîsên wî yên neçapkirî hene. Ewî roleke giring di nav Kurdên aliyê Dêrikê de leyîst. Heta roja îro şîret û gotinên wî tene bîra cotkaran.

Mele Silêman (Bavê Derwêş): Wî bi dil û can di ber mafên milletê xwe de xebat dikir. Hêviya wî pir xurt bû bi pêşeroja Kurdistanê.

'Evdê Têlo: Hez ji xwehriyê nedikir. Zilamekî rast û dirist bû, lewma baweriya xelkê pê dihat.

Mistefa Mihemed (Reşad): Komunîst bû. Ew gelek caran di ber baweriyên xwe yên siyasî de hate girtin. Merema wî ew bû ku zarokan bide xwendin. Li gundê Robariya (li mintiqa Dêrikê), di Pênçyan de wî li ser hesabê xwe ji zarokan re dibistanek ava kir. Mistefa her û her ji xelkê re behsa hevdîtina bi Barzanîyê nemir re (sala 1957 li Mosko) dikir.

Mela Ehmedê Namî: Helbestvan². Ew gelek xebitî di ber belavkirina zanîn û çandiyê di nav Kurdan de. Dostaniyek mezin a Seydayê Namî bi bijîşkê Kurd ê bi nav û deng û welatperwerê gewre Dr. Ehmed Nafiz re hebû.

Mele Ehmedê Sûzî: Şexsekî giran û bêhnfereh bû. Ew yek ji peyayên Şêx 'Evdirehmanê Garisî bû.

Îsmayîlê Sorê: Civat bê vî camêrî xweş nedibû. Ya ku di dilê wî de bû her li ser zimanê wî bû, lewma wî ti tişt ji hevalên xwe venediştart.

Mele Mihemed Hamid (Bavê Behcet): Melayek û ji wan kesên ku xizmeta Civata Xoybûnê dikirin bû. Biraziyê wî Dr. Lezgîn Hamid li ser devê wî dibêje: "Carekê Dr. Ehmed Nafiz bi Misteşarê Frensawî re bi rêya xwe re hate gundê Gir Ziyaret (li mintiqa Dêrikê). Dr. Nafiz rabû li wir bi hênceta dîtina nexweşekî dohmekê peya bû. Lê ya rastî, wî hin dokumentên Xoybûnê teslîmî Mele Tahir kirin, qene ewê wan paşê bigihêne sînorê Kurdistana Îraqê."

Her êvar se'et şeş pêşdar dighane salonê. Pêşî Mihemedê Silo xurcika xwe ji nûçeyên Kurdan û xelkê vala dikir. Behra mayî dibû ya Mele Tahir û 'Ezîzê Zaza. Carekê civatê behsa danîna dîrokê dikir, Mele Hesenê Kurd (Hişyar) rabû got: "Dîrok ne her car rast tê nivîsandin, çikû ew li gor daxwaza serekên siyasî tê danîn."

Li derveyê salonê, pêşdaran jibona şiyarkirin û pêşveçûna Kurdan xebateke mezin dikirin. Di rojên zor de wan cejna Newrozê dijiyandin. Sala 1970, civatê bi derçûna Beyannama 11'yê Adarê (li Kurdistana Başûr), şahiyê mezin çêkirin û li ser zarokan şekirok bela kirin.

Van pêşdaran gelek zehmetî kişandin û çendek ji wan bi emrên hukûmetê mintiqê hatin girtin. Mistefa Mihemed carekê digot ku polîsê Tirkan ew sala

1939'an li Nisêbînê girt, piştî ku trê nîşka ve ji Qamişlo derket. Ew hatibû stasyonê qene 'Elî Axayê Zilfo bi rê bixe. Roja dîtir ew avêtin Hepsa Diyarbekirê. Li wir wî gelek ezab xwar, sipîh û kêçan girtinê de. Çend heyvan girtî ma (Mistefa bi xwe berê ji ber hukûmeta Tirkan firar bû). Lewra mirov û dostên wî destên xwe ji vegerra wî şuştin. Lê paşiyê şansê wî rabû, hingê pîreeskerekî Kurd jê re behsa hatina Walî soraxê li ser hepsê kir. Wextê ku ewî mesela xwe ji Walî re got ku ew çawa bi şaşîti hatiye girtin, Walî emrê berdan û şiyandina wî Sûrî da.

Baweriya xelkê bi Salonê zêde bû û dengê wê li Qamişlo bela bûbû. Lewma mêhvanên wê jî pir bûn. Vêca di şeveke sar a zivistana sala 1972'yan berpirsiyarekî ji Partiya Komunîst a Sûrî hat li bavê nivîskarê vê gotarê yê nexweş pirsî. Lê bavo wê rojê çûbû gund. Yê berpirsiyar rabû berê xwe da salonê. Li wir pêşdaran gelek qedr û sîyanet jê re girtin. Dûv re camêran dest bi pirsan kirin û xwestin bizanin ka komunîstên Sûrî li ser pirsên welêt û Rojhilata Navîn çi dibêjin. Piştî şitexalî germ bû û civatê gazin li komunîstan kir -nexasim yên Kurd-, ku çima guh nadin pirsê gelê xwe. Paşiyê her du aliyan li hev din nekirin, lewma Îsmayîlê Sorê, 'Evdê Têlo û Mele Silêman nerazîbûna xwe dan xuyakirin û dev ji civatê geran. Hevalên din jî dan ser şopa wan.

Pêwendî di navbera pêşdaran de xweş û hêsan bû. Di rojên xweş de û di rojên reş de destên wan ji hev nedibûn. Roja ku kevirekî kor li Caedê li serê mamê me Mele Hesenê Kurd ket, havalan serî jê nebirîn, heta sax nebû. Û saloxa mirina Mihemedê Silo weke topekê li ser salonê ket. Bi çûna wî, civatê dengêkî xurt û aza winda kir. Mihemedê Silo camêrekî nestêleh bû. Bi ser feqîrî û perîşaniya xwe de, ewî sê sêwî ji mirovên pîreka xwe panzdeh salan xwedî kirin.

Ev bûn hin bîrhatinên me li ser Salonê -ya ku nêzîka bîst salan dom kir- û li ser wan niştimanperwerên dilsoz û têgihiştî. Heke ew sax bimana heta roja îro, qene dê bi çavên xwe bidîna ka Kurdan çi pêk aniye di warê xwendin û zanînê de. Herwisa jî qizincên mezin ên ku birayên me li Kurdîstana Başûr, piştî Cenga Xelîcê, sala 1991'ê bi dest xwe xistin; nemaze azadkirina behreke giring ji erdên Kurdistanê û hîlbijartina Parlemana Kurdistanê bi awakî demokrat.



¹ Sala 1993'yan, pirtûkeke wî bi zimanê Kurdî li ser dîroka Kurdan, bi navê "Dîtin û Bîrhatinên Min" derket.

² Sala 1994'an, dîwana wî "Daxwazname", cara diwemîn çap bû.

KRONIKA 1995

Yê ku hazir kiriye:
Nedim Dağdeviren

LÎSTEYA GIŞTÎ YA KÎTÊBÊN BI KURDÎ Û ZÎMANÊN DÎN YÊN LÎ SER KURDAN
KU DÎ SALA 1995'AN DE LÎ SWÊDÊ ÇAP BÛNE Û HÎN KÎTÊBÊN DÎN KU LÎ
TÎRKIYÊ HATÎNE ÇAPKIRÎN

Li Kurdistanê Hêzeke Nûh: Jinên Kurd

Alakom, Rohat, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Lêkolîn, Spånga, 1995, 145 + LXXX
r., ISBN 91-87730-76-6

Şerîf Paşa

Alakom, Rohat, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Lêkolîn, Spånga, 1995, 164 r.,
ISBN 91-88730-89-8

Kerr und Kulik - Ein kurdisches epos aus der Mythologie

Aras, Ahmet, Weşanên Ararat, Almanî, Folklor, Winterthur, 1995, 87 r., Werger:
Yusuf Yeşilöz & Elisa Lun, ISBN 3-9520545-5-0

Gome

Astare, Kemal, Piya Kitaplığı, Kurdî, Helbest, İstanbul, 1995, 79 r.

Osmanlı - Rus ve İran Savaşlarında Kürtler 1801-1900

Avyarov, Weşanên Sipan, Tirkî, Dokuman, Ankara, 1995, 227 + 55 r., Werger:
Muhammed (Hoko) Varlı (Xanî)

Kurdistana Bi Fiftî-Fiftî

Aytar, Osman, Weşanên Jîna Nû, Kurdî, Hevpeyivîn, Stockholm, 1995, 318 r.,
ISBN 91-88054-42-X

Pojken från Garzan-slätten

Baksi, Mahmut, Förlaget Natur och Kultur, Swêdî, Çîrokên otobîyografîk,
Stockholm, 1995, 67 + VIII r., ISBN 91-27-05593-0

Videobruden

Baksi, Mahmut, Svartvitts Förlag, Swêdî, Roman, Stockholm, 1995, 135 r., ISBN 91-97-22 04-0-1

Milkê Evînê

Barnas, Rojen, Weşanên Nûdem, Kurdî, Helbest, Järfälla, 1995, 81 r., ISBN 91-88592-14-6

Li Benda Godot

Beckett, Samuel, Weşanên Nûdem, Kurdî, Drama, Järfälla, 1995, 112 r., Werger: Firat Cewerî, ISBN 91-88592-11 1

Günlük Notlar 1922-1925

Bedirhan, Celadet Âli, Weşana serbixwe, Tirkî, Bîranîn, Spânga, 1995, 76 r., Edîtor: Malmîsanij, ISBN 91-630-4003-4

Çivanoka Evînê

Behrengî, Samed, Weşanên Çanda Nûjen, Kurdî, Kitêba zarokan, Spânga, 1995, 48 r., ISBN 91-972247-8-2

Türkler ve Kürtler: Nerden Nereye?

Belge, Murat, Birikim Yayınları, Tirkî, İstanbul, 1995, 415 r., ISBN 975-516-010-8

Dîwanî Şêrko Bêkes, Beş: 3

Bêkes, Şêrko, Apec Tryck & Förlag, Kurdî (Sorani), Helbest, Spânga, 1995, 551 r., ISBN 91-87730-74-X

Ji Nav Şîrên Min

Bêkes, Şêrko, Weşanên Avesta, Kurdî, Helbest, İstanbul, 1995, 60 r.

Înanç, Aşk ve Düş...

Biçer, Ali, Weşanên Nûjen, Tirkî, Helbest, İstanbul, 1995, 110 r.

Zarathustra (Zerdüşt) - Hayatı ve Mazdaizm

Bilgin, Siraç, Ji bo Swêdê: Weşanên Pencînar, Ji bo Tirkîyê: BerfinYayınları, Kurdî, Lêkolîn, Stockholm-İstanbul, 1995, 238 r., ISBN 91-972090-8-2

Folklorları Işığında Kürtlerin Ruhu

Bois, Thomas, Weşanên Mezopotamya, Tirkî, Lêkolîn, Huddinge, 1995, 82 r., Werger: Aytekin Karaçoban, ISBN 91-971307-6-1

Heyranok - Gilî û Gazindên Evînê... Muzîk û Mork...

Botanî, Beşîr, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Musîk, Spânga, 1995, 108 + XII r., ISBN 91-87730-84-7

Mem ile Zin

Boynukara, Cuma, Berfin Yayınları, Tirkî, Drama, İstanbul, 1995, 111 r., ISBN 975-7354-35-X

Berf Fedî Dike

Burkay, Kemal, Weşanên Deng, Kurdî, Helbest, İstanbul, 1995, 120 r.

Seçme Yazılar 1

Burkay, Kemal, Weşanên Deng, Tirkî, İstanbul, 1995

Biyani

Camus, Albert, Weşanên Nûdem, Kurdî, Roman, Järfälla, 1995, 108 r., Werger: Fawaz Husên, ISBN 91-88592-13-8

Gula Çile

Can, Ferhad, Weşanên Deng, Kurdî, İstanbul, 1995

Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî

Cemil Paşa, Ekrem, Enstituya Kurdî ya Brukselê, Kurdî, Tarîx, Bruksel, 1995, 344 r.

Girtî

Cewerî, Firat, Weşanên Nûdem, Kurdî, Kurteçîrok, Järfälla, 1995, 174 r., ISBN 91-88592-12-X

Gotinên Navdaran

Cewerî, Firat (Amedakar), Weşanên Nûdem, Kurdî, Järfälla, 1995, 105 r., Werger: Firat Cewerî, ISBN 91-88592-09 X

Kevoka Spî

Cewerî, Firat, Weşanên Nûdem, Kurdî, Kurteçîrok, Järfälla, 1995, 81 r., ISBN 91-88592-15-4

Jînenîgariya min

Cigerxwîn, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Bîranîn, Spånga, 1995, 414 r., ISBN 91-88730-88-X

Cembelî (Kurê Mîrê Hekaryan)

Cûlemêrgî, Îhsan, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Roman, Spånga, 1995, 197 r., ISBN 91-87730-82-0

Costumes et tapis Kurdes

Criel, Jean-Marie & Jamil, Pervine, Enstituya Kurdî ya Brukselê, Frensî, Bruksel, 1995, 91 r.

Ferheng - Kurdî (Zazakî) - Tırkî

Çem, Munzur, Kurdî/Tırkî, Weşana serbixwe, Kurdî (Dimilî/Zazakî), Ferheng, Stockholm, [1995], 589 r., ISBN 91-630-1947-7

Tayê Kilamê Dersimî

Çem, Munzur, Weşana serbixwe, Kurdî (Dimilî/Zazakî), Folklor, Stockholm, [1995], 322 r., ISBN 91-630-1947-7

Bexçeyê Vişne

Çexov, A., Weşanên Nûdem, Kurdî, Drama, Järfälla, 1995, 92 r., Werger: Firat Cewerî, ISBN 91-88592-073

Bîrova Çavan

Çiyan, Gabar, Weşanên Jîndan, Kurdî, Drama, Hägersten, 1995, 92 r., ISBN 91-972436-1-2

Mîrzayê Biçûk

de Saint-Exupéry, Antoine, Weşanên Nûdem, Kurdî, Kitêba zarokan, Järfälla, 1995, 99 r., Werger: Fawaz Husên, ISBN 91-88592-19-7

Antolojiya Çîrokên Nû ya Kurmancên Başûr

Duhokî, Xelîl (Amedakar), Weşanên Nûdem, Kurdî, Kurteçîrok-Antolojî, Järfälla, 1995, 104 r., ISBN 91-88592-17-0

Tarîxa Felsefeyê ya Rojava (Qirna Antîq)

Düzgün, Mustafa, Weşanên Berhemê, Kurdî, Felsefe, Spånga, 1995, 189 r., ISBN 91-88522-00-8

Mîrza Meheme

Ferho, Medenî, Weşanên Nûdem, Kurdî, Roman, Järfälla, 1995, 107 r., ISBN 91-88592-08-1

Helbijarde la Çîrokî Kurtî Bêgane

Franke, Anatole & Sakî û.y.d., Kulturföreningen Sverige-Kurdistan, Kurdî (Sorani), Kurteçîrok, Stockholm, 1995, 76 r., Werger: Goran, ISBN 91-972384-5-7

Etno-demografiyê Başûrî Kurdistan

Ghafor, Abdulla, Weşana serbixwe, Kurdî (Sorani), Coxrafya, Stockholm, 1995, 96 r., ISBN 91-630-3190-6

Antolojiyê Hozanvanê Swêdî I

Îremet, Faruk, Îremet Förlag, Kurdî, Helbest-Antolojî, Stockholm, 1995, 80 r., ISBN 91-722069-1-1

Ve Öteki

İzğören, Hicri, Piya Kitaplığı, Tirkî, Helbest, İstanbul, 1995, 95 r.

Pablo Neruda'yla Söyleşi

Karaçoban, Aytekin, Mezopotamya Publishing, Tirkî, Helbest, Huddinge, 1995, 99 r., ISBN 91-971307-5-3

Gotin

Kaya, Yaşar, Weşanên Nûdem, Kurdî, Järfälla, 1995, 115 r., ISBN 91-88592-18-9

Zaroka Şevê

London, Jack, Weşanên Nûdem, Kurdî, Kurteçîrok, Järfälla, 1995, 81 r., Werger: Mustafa Aydoğan, ISBN 91-88592-16-2

Rindo û Mişko

Löfgren, Ulf, Apec Tryck & Förlag, Kurdî (kurmançî û Soranî), Kitêba zarokan, Spånga, 1995, 20 r., Werger: M. Lewendî & A. Cantekîn (kurmançî) û Xebat Arif (sorani), ISBN 91-87730-79-0

Rindo û Telefon

Löfgren, Ulf, Apec Tryck & Förlag, Kurdî (kurmançî û Soranî), Kitêba zarokan, Spånga, 1995, 20 r., Werger: M. Lewendî & A. Cantekîn (kurmançî) û Xebat Arif (sorani), ISBN 91-87730-80-4

Gâvur Mahallesi

Margosyan, Mıgırdiç, Aras Yayıncılık, Tirkî, Kurteçîrok, İstanbul, 1995, 100 + IV r., Werger: Mıgırdiç Margosyan, ISBN 975-7265-00-4

Söyle Margos Nerelisen?

Margosyan, Mıgırdiç, Aras Yayıncılık, Tirkî, Kurteçîrok, İstanbul, 1995, 110 r., Werger: Mıgırdiç Margosyan, ISBN 975-7265-03-9

Dewletî Cumhûrî Kurdistan - Name û dokument

Mola Ezat, Mahmod, Apec Tryck & Förlag, Kurdî (Soranî), Belge, Spånga, 1995, 314 r., ISBN 91-87730-85-5

Nêçîra Rovî

Nordqvist, Sven, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Kitêba zarokan, Spånga, 1995, 24 r., Werger: Mustafa Cizîrî, ISBN 91-87730-82-2

Pasteya Kiloran

Nordqvist, Sven, Apec Tryck & Förlag, Kurdî, Kitêba zarokan, Spånga, 1995, 24 r., Werger: Ahmet Cantekin, ISBN 91-87730-78-2

Tawnî Quman

Qeredaxî, Abdullah, Weşanên Newroz, Kurdî (Sorani), Helbest, Stockholm, 1995, 95 r., ISBN 91-972491-0-9

Midalya

Qeredaxî, Mehabad, Weşanên Newroz, Kurdî (Sorani), Helbest, Stockholm, 1995, 101 r., ISBN 91-972491-2-2

Borîs Pasternak

Pasternak, Evgenî, Kulturföreningen Sverige-Kurdistan, Kurdî (Sorani), Biyografi, Stockholm, 1995, 56 r., Werger: Ferhad Shakely, ISBN 91-972384-6-5

Başegmeyen Bir Kürt Devrimcisi

Polat, Lokman, Weşanên Çanda Nûjen, Tirkî, Biyografi, Spânga, 1995, 102 r., ISBN 91-972247-2-3

Jin û Zîndan

Polat, Lokman, Weşanên Çanda Nûjen, Kurdî, Kurteçîrok, Spânga, 1995, 118 r., ISBN 91-972247-5-8

Xwîn û Hêstirê Çavan

Polat, Lokman, Weşanên Çanda Nûjen, Kurdî, Kurteçîrok, Spânga, 1995, 118 r., ISBN 91-972247-5-8

Geştêk Bo Erzerom

Puşkîn, Alexander, Kulturföreningen Sverige-Kurdistan, Kurdî (Sorani), 1995, 112 r., Werger: Marouf Khaznadar, ISBN 91-972384-4-9

Destê Mîn Lî Destê Te Dîgere

Tanrikulu, Mehmet, Mezopotamya Publishing, Kurdî, Helbest, Huddinge, 1995, 82 r., ISBN 91-971307-8-8

Pîyawê Spîyeke - Papalangî

Tuiavii, Weşana serbixwe, Kurdî (Sorani), Stockholm, 1995, 131 r., Werger: Khabat Marouf, ISBN 91-972549-0-8

Antolojiya Edebîyata Kurdî

Uzun, Mehmet, Tûmzamanlar Yayıncılık, Kurdî, Antoloji, İstanbul, 2 cîld, Cîld 1: 503 r., Cîld 2: 476 r., Cîld 1: ISBN 975-7350-39-7, Cîld 2: ISBN 975-7350-41-9

Bîra Qederê

Uzun, Mehmet, Weşanên Avesta, Kurdî, Roman, İstanbul, 1995, 260 r.

Yitik Bir Aşkın Gölgesinde

Uzun, Mehmet, Belge Uluslararası Yayıncılık, Tirkî, Roman, İstanbul, Werger: Muhsin Kızılkaya, 1995, 192 r., ISBN 975-344-100-2

Şazadey Bextyar

Wilde, Oscar, Kulturföreningen Sverige-Kurdistan, Kurdî (Sorani), Kitêba zarokan, Stockholm, 1995, 42 r., Werger: Goran, ISBN 91-972384-3-0

Dê û Dêmarî

Xudo, Egîdê, Weşanên Nûdem, Kurdî, Roman, Järfälla, 1995, 112 r., Transkrîpsiyon: Naci Kutlay, ISBN: 91-88592-05-7

Vision or reality? The Kurds in the Policy of the Great Powers 1941-1947

Yassin, Buraneddin A., Lund University Press, İngilizî, Doctoral dissertation, Lund, 1995, ISBN 91-7966-315-X

Bir Kürt Olarak Yaşamım

Zaza, Nureddin, Mezopotamya Publishing, Tirkî, Bîranîn, Huddinge, 1995, 361+X r., Werger: Aytekin Karaçoban, ISBN 91-971307-4-5

Keskesor

Zaza, Nûredîn, Weşanên Nûdem, Kurteçîrok, Järfälla, 1995, 58 r., ISBN 91-88592-06-5

Mîrate

Zinar, Zeynelabidîn, Weşanên Pencînar, Kurdî, Kitêba zarokan, Stockholm, 1995, 120 r., ISBN 91-972090-5-8


Xwençe VIII-Kilam, meselok, serpêhatî û çîrok

Zinar, Zeynelabidîn, Weşanên Pencînar, Kurdî, Folklor, Stockholm, 1995, 288 r., ISBN 91-972090-7-4

WERGERA MEM Û ZÎNÊ BI ZIMANÊ EREBÎ

Emîn Narozî

Bêguman cihê şanaziya her neteweyî ye ku di nav edebiyata wî de berhemên hêja û payebilind hebin û bi sed salan piştî nivîsandina wan jî bîn xwendin. Ji vê bi rûmettir ew e ku ew berhem bo zimanên biyanî bêne wergerandin û di nav berhemên cihanê de cihên xwe yênlayi qbigrin. Evyek jibo neteweyekî zimanqedexekirî ye wek



Kurd pirr hêja û teşwîqkar e. Nemaze ku ew berhem wek dastana neteweyî hatibe qebûl kirin, hingê ew bêhtir şayanê dilşadî ye. Ew dilşadî, bi tenê ne jibo wergerandina Mem û Zîn a Ehmedê Xanî bo zimanê Erebî ye, lê herweha jibo hêviya wergerandina berhemên hêja yênl Kurdî yênl din e jî.

Piştî Dîwanaşa'irê mezin Melayê Cizîrî, Mem û Zîn a pêşrewê Kurdan Ehmedê Xanî jî ji alî niştîmanperwerekî Kurd, Jan Dost (Can Dost) ve bo zimanê Erebî hat wergerandin. Tê zanîn ku Mem û Zîn berê hatibû wergerandin ser zimanê Rûsî û Tirkî jî. Wergera Jan Dost, di Kanûnapêşîna 1995'an de, li Beyrûdê, li Çapxaneya Asû hatîye çapkirin û gihaye ber destê xwendevanên Erebî. Ev werger 444 rûpel e.

Li gor pêşgotina Jan Dost, wî pêşî hewl daye ku Mem û Zînê bi Kurdî şîrove bike, hetta hinek jê kiriye û di hin kovarên herêmî de weşandiye jî; lê jiber bipêşveneçûna zimanê Kur-dî di warên felsefî û tesew-wufî de û zoriya peydakirina gelek terîm û peyvên Kurdî di van waran de, ev jê

re karekî giran hatiye û wî fikrêxweguhertiye. Piştî xebat û lêkolîneke dûr û dirêj li ser Mem û Zînê, li ser werger, lêkolîn û şîroveyên li ser wê, wî di çileyê sala 1992'yan de dest bi wergerandina wê ya bo zimanê Erebî kiriye. Di dema wergerandinê de wî pêwîst dîtiye ku dastan û berhemên biyanî yênl mîna Mem û Zînê

bixwîne û ji wan agahdar bibe.

Jan Dost wergera xwe weha kiriye: Wî, pêşî çend rêzên Mem û Zînê bi herfên Erebî li serê rûpel nivîsandine û li binê wan jî li gor reqemên beytan pêşî yan giş yan jî hin peyvên wan -bi pirranî yênl ku ne Erebî bin-me'ne kirine û dûvre jî beytên wê bi tevayî wergerandine. Di hin cihan de wî fikrên xwe û hin agahdarî jî li dawîya beşên wergerê zêde kirine.

Ji xwe pêwîstî bi pesindana karekî welê binirx û hêja tune, lê ez hêvidar im ku Jan Dost li ser şîrovekirina bi zimanê Kurdî ya Mem û Zînê ku nivco hiştiye jî raweste û bidomîne. Lewra çendî ku M. E. Bozarşan ew bi awakî menzûm wergerandiye bo Kurdiya xwerû jî li nik min pêwîstî bi şîroveke pexşan (nesr) jî heye. Ji xwe qet xem nake ku hin peyv û terîmên ku di zimanê Kurdî de kêml in îro jî zimanên biyanî bêne girtin û bikaranîn. Evyek jibo zimanên din jî weha bûye.

**SEMÎNER:
"EHMEDÊ XANÎ Û RONESANSA KURDÎ"**



İzzeddîn Mistefa Resûl (foto: Armanc)

Di 8.10.1995'an de bi navê "Ehmed Xanî û Ronesansa Kurdî" semînerê ji alî Prof. İzzeddîn Mistefa Resul hat dayin. Prof. Resul ku teza doktoraya xwe li ser Mem û Zînê çêkiriye, bi awakî fireh û pîrralî li ser Mem û Zîn û fikrên Ehmedê Xanî sekinî.

Semîner ji alî Komela Nivîskarên Kurd Li Swêdê ve hatibû amadekirin. Nêzî du sed kesî guhdariya semînerê kir.

PANEL:

"REWŞA KURMANCIYA NIVÎSKÎ YA ÎRO"

Di 7.10.1995'an de Komela Kurd Li Spångayê bi navê "Rewşa Kurmanciya Nivîskî ya Îro" panelek amade kir. Li ser navê kovara Çirayê, serokê Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê M. Malmîsanij beşdarî panelê bû.

Kesên din ên ku wek panelîst beşdarî panelê bûbûn ev in: Ehmed Huseynî (li ser navê kovara Dugir), Remzî Kerîm (li ser navê Armancê), Robîn Rewşen (li ser navê rojnama Welatê Me), Reşo Zîlan, Dr. Celadet Çeliker.

Panelîst bi giştî li ser Kurmanciya nivîskî ya îro peyivîn. Li hember gotinên çêkirî, li ser zimanê weşanên Kurdî û Med TV'yê hat sekinîn û hin rexne û pêşniyar hatin munaqêşe kirin.

ÇEND KARTPOSTALÊN KEVN

M. Pîran



Carna fotografek yan jî rismek dikare derheqê ciyekî, tişteki yan jî rewşekê de agahdariyen baş bide. Bi taybetî heke rism yan jî fotograf kevn be ev agahdarî hîn jî balkêş dibin. Fotografên jêrîn çend fotografên wisa ne. Ev fotograf wek kartpostal çap û belav bûne. 'Eslên çend hebên wan bi reng in. Jibo peydakirina wan T. Dêreyij alîkarî kir, ez sipasî wî dikim.

Bi qasî ku tê fêmkirin ev fotograf (kartpostal) di destpêka sedsala me de hatine kişandin. Li ser piştê çend heban bi Frensî yan jî bi Îngilizî nivîs hene û bi saya wan nivîsan em dibin xwediyê hin agahdariyên din:

I

Diyarbakir-Panorama

Ev kartpostal di 6'ê Îlona 1920'î de hatiye şandin. Ji nivîsa paş wê tê fêmkirin ku eskerekî Frensî şandiye. Yê ku şandiye -bi Frensî- xîtabî dostên xwe dîke û dibêje ku wî berî heşt rojan Sûriye terk kiriye. Wî nivîsiye "ez hêvî dikim ku ev kart bigihîje destê we", lê wisa tê fêmkirin ku kart negihîştiye ciyê xwe.

II

Entab-Bajar û Xestexana Amerîkanî

Ev kartpostal li Helebê çap bûye û di 19. 12. 1921'ê de ji Paul Maillot re hatiye şandin. Ji adresê tê fêmkirin ku Paul Maillot li Roanne (bajarekî Frensayê) dimîne. Adresa wî weha ye:

Paul Maillot

88, rue du commerce

Roanne

III

Entab, bajar, kilîse û kela

Di vî fotografi de bi taybetî kilîseyeke mezin bala merivî dikşîne.

IV

Ruha (Ûrfa)-Xestexana Mezin a Belediyeyê ya Biyaniyan

Ev kartpostal li Helebê çap bûye û di 15. I. 1922'yan de ji Helebê hatiye şandin.

V

Ruha (Ûrfa)-Ji kelayê

Li ser vê kartpostalê tu tarîx tune. Li ser piştta wê bi Îngilizî hin agahdarî hene. Li gor vê, nufûsa Ruhayê (Ûrfayê) 50. 000 e, kela wê 7 mîl e. Pênc ciyên ku li ser kartpostalê hatine îşaretkirin ev in:

1-Camiya Hz. Îbrahîm

2-Bermayiya kilîseye Xirîstiyanan ji sedsala çaran

3-Qûleya naqosa kilîseye Xirîstiyanan a demekê, niha minara mizgefta herî mezin a bajêr

4-Kilîseye Gregoryan a ku di 1895'an de bi hezaran kes têde hatine kuştin

5-Kilîseye Protestan a Amerîkanî

VI

Kurdê pîr

Berggren ev fotograf kişandiyê û wek kartpostal li Îstenbolê çap bûye.

VII

Qizilbaş piştî vegera ji nêçîrê


Ev kartpostal li bajarê Lyonê (li Frensayê) çap bûye.

VIII

Qeydkirina Suwariyên Sivik ên Hemîdiye, li Diyarbekir, 1895

Fotografê heştan -fotografê qapaxa dawî ya vê hejmara Çirayê- ne kartpostal e lê berî sed salî hatiye kişandin. Di binê vî fotografi de bi Îngilizî wisa hatiye nivîsîn: Enrolling Hamidieh Light Cavalry at Diarbekr, 1895. Yani "Qeydkirina Suwariyên Sivik ên Hemîdiye, li Diyarbekir, 1895".

Dierbékir (Turquie) -- Panorama



I
Diyarbakir-Panorama


Aıntab (Turquie) — Ville et Hôpital Américain



II

Entab-Bajar û Xestexana Amerîkanî

Aintab (Turquie)
Ville, Eglise et Citadelle



III

Entab, bajar, kilîse û kela

Ourfa (Turqme) — Grand Hôpital Municipal des Etrangers



IV

Ruha (Ûrfa) Xestexana Mezin a Belediyeyê ya Biyanîyan

No 164 Urfa, from the castle



∨
Ruha (Ûrfa)-Ji kelayê



VI
Kurdê pîr




VII
Qizilbaş piştî vegera ji nêçîrê



VIII

Qeydkirina Suwariyên Sivik ên Hemîdiye, li Diyarbekir, 1895



Weşanên APEC

Heta nuha bi Kurdî (Kurmançî, Soranî, Dimilî), Tirkî, Erebi û Swêdî nêzî 90 kitêbên weşanxaneya me derketine. Di nav wan de kitêbên zarokan û yê dibistanê jî hene. Her kes û dezgehên ku bixwazin van kitêban bi dest xî, dikarin broşura kitêbên me bixwazin. Ji deh kitêban zêdetir were siparişkirin, ji % 20 erzanî tê kirin.

Adresa xwestinê:

Box: 3318, S-163 03 Spånga/Sweden
Telefon: 08-761 81 18 * Telefaks: 08-761 24 90



Reklam

HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

- * Kovara Helwest kovara fêrbûna edebî ye....
- * Kovara Helwest pêngava munaqêşe û rexneyên edebî ye
- * Kovara Helwest dengê zanîna edebî ye
- * Kovara Helwest helwesta fîlmî-zanîstî ya çandî û edebî ye
- * Kovara Helwest pêngavek e ji pêşvaçûna çand û edebiyata Kurdî re
- * Kovara Helwest zanîna, aso ye, fêrbûn e
- * Kovara Helwestê bixwînîn, bibin abone
- * Kovara Helwest **hejmara duyem derket! Bixwînin**
- * Navnîşana Xwestinê: Tensta Alle 43 - 2tr. 16364 Spanga / Sweden

HELWEST

JI WEŞANÊN ÇANDA NÛJEN

PIRTÛKÊN KURDÎ

Lokman POLAT

EVÎNDAR

*

MËRXAS

Serpêhatiyên Kurdî

*

TORINA ŞÊX SEÎD

EVÎN Û JIYAN

JIN Û ZÎNDAN

XWÎN Û HÊSTIRÊ ÇAVAN

Derketin / Bixwînîn

